



Kovara zimane kurdî

KANÎZAR

Hejmar 7, 8-9/2016

www.dressiv.com

NAVEROKA HEJMAR 7

Sernivîsar

Bi hemû rengên zimanê me, r. 3

Husein Muhammed

Cînavên kurdî (beşa 2) r. 4 – 59

Nasandin

"Ferhenga Hiqûqî" ya Hüseyin Özdemir, r. 60 – 62

Peter Trudgill (w: Hesên Qazî)

Ziman û çînî komelayetî 63 – 78

Nirxandinek li ser rewşa zimanê kurdî

"Kurdistan dibe erebîziman", r. 79 – 81

Rêzimanek kurdî ya 90-salî

"Kurmanciya Behdînan" ya R. F. Jardine, r. 82 – 84

Özlem Kılıç

Zazakî de negatîfiye, r. 85 (hemû teza masterê wek pêvek)

Mesûd Serfiraz

Kovara Hetawî Kurd, r. 86 – 99

Peyvnasî

Pere/pare yan dirav, meydan an qad, zengîn an dewlemend...?, r. 100 – 101

Hevpeyvîn

Li gel Dr. Amr Tahir Ehmed li ser "zimanên kurdan", r. 102 – 116

Rêziman

Paşgirên kesî yên lêkeran û dîroka wan, r. 117 – 135

Ednan Ehmed

Tewawkerî yarîde yaxud berkarî narastewxî? r. 136 – 143

Songül Gündoğdu

Noun-Verb Complex Predicates In Kurmanji Kurdish, p. 144 – 173

Joyce Blau

History of Kurdish Studies, p. 174 – 184

Zarname

Ferhengoka zimannasîyê kurdî-înglîzî r. 185 – 204

Kanîzar çawa dinivîse?

Kurterêbera rastnivîsînê, r. 205

Sernivîsar

Bi hemû rengên zimanê me

Kanîzar kovara zimanê kurdî ye. Gava ku em dibêjin "zimanê kurdî", mebesta me hemû rengên kurdî ne: kurmançî, soranî, zazakî, hewramî...

Wek hejmarên berê, ev hejmar jî bi vekolînên bi çend zarên kurdî dagirtî ye. Vê carê nivîsar bi kurmançî, soranî û zazakî hene. Ev sinordariya bi sê lehceyan jî ne merema me ye lê vê carê tenê bi van zaravayan berhem bo weşanê ghiştine me.

Di vê hejmarê de **Husein Muhammed** vekolîna xwe ya li ser *cînavan* bi 55 rûpelên din jî bi kurmançî didomîne. Ew di nivîsara xwe ya din ya vê hejmarê de bi berfirehî li ser *paşgirên kesî yê lêkeran* û *dîroka wan dinivîse*.

Ev hejmar du nivîsarên bi soranî pêşkêş dike. **Hesen Qazî** vê carê jî nivîsareke profesor **Peter Trudgill** li soranî wergerandiye û li ser *têkiliyên navbera zimanî û çînên cuda-cuda yê civakî* de ye. Kanîzar nivîsarê bi alfabeya kurdî-latînî belav dike. Nivîsara din ya bi soranî ji Ednan Ehmed e û derbarê *temamker û berkara neyekser* e. Em wê bi alfabeya kurdî-erebî diweşînin.

Vekolîna berfireh ya vê carê ya bi zazakî teza masterê ya **Özlem Kılıç** ya li ser neyînîti (negatîvî) di zazakî de ye ku em bi tamamî wek pêvek bi vê hejmarê ve belav dikin.

Mesûd Serfiraz vekolînek li ser yek ji kovarên pêşîn ên kurdî, *Hetawî Kurd* kiriye û naveroka wê bi berfirehî dide nasîn. Dr. **Amr Taher Ahmed** di hevpeyivîneke xwe de li gel **Mem Wêranî** li ser wê qenaetê ku divê mirov li şûna zimanê kurdî behsa *zimanên kurdî* bike.

Wek di hejmarên berê de jî, vê carê jî em du kitêbên li ser zimanê kurdî didin nasîn. Kitêba nû *ferhenga hiqûqî* ya **Hüseyin Özdemir** e. Kitêba kevn jî *rêzimanname û ferhengoka Kurmanciya Behdînan* ya **R. F. Jardine** e.

Di vê hejmarê de jî em cih didin ku vekolînên bi inglîzî yê li ser zimanê kurdî. **Songül Gündoğdu**

li ser *lêkerên pêkhatî yê navdêr-lêker* dinivîse. Nivîsara din jî ji **Joyce Blau** ye û derbarê *dîroka vekolînên li ser zimanê kurdî* ye.

Li dawiya vê hejmarê Zarname anku ferhengoka zimannasî dîsa hinekî berfirehkirîtir tê belavkirin. Herwiha kurterêbera rastnivîsînê jî di vê hejmarê de jî cihê xwe digire.

Kerem bikin Kanîzara xwe bixwînin û bo binivîsin!

CÎNAVÊN KURDÎ (2)¹

Husein Muhammed

1. CÎNAVÊN PIRSYARKÎ

Mebest ji cînavên pirsyarkî ew peyv in ku mirov pê hevokên pirsyarkî çêdike û pê bikerê (fail) yan jî berkarê (me'ûl) hevokê dipirse.

Di kurdî de du cînavên pirsyarkî yên bingehîn û xwerû hene. Di kurmancî de ew wiha ne:

- **çi** (li gel varyanta çî)
- **kî** (bi forma xwe ya çemandî kê)

1.1. Cînavê “çi”

Ji bilî pirsîna mirovan, her tiştê din bi cînavê “çi” tê pirsî:

- Çi ye?
- Çi tişt hatiye kirin?
- Tu çi dibêjî?

Cînavê “çi” neçembar e anku nayê çemandin û tewandin. Forma wê ya xwerû, ya mê, ya nêr û ya pirhejmar hemû “çi” ne:

- çi kitêbê
- çi karî
- çi malan

Lê di rewşa ravekirinê de cins û hejmara rêzimanî diyar dibin:

- çiya te? – kitêba min

¹ Beşa yekem di hejmara 6 ya Kanîzarê de hatiye weşandin: <https://zimannas.wordpress.com/2016/05/31/kovara-kanizar-hejmar-6/>

- çiyê te? – karê min
- çiyên te? – qelemên min

Forma “çî” jî heye ku li gel forma “çi” di hemû devokan de li kar e. Ew ne formeke çemandî ji cînavê “çi” ye lê hevwaterê hev-erka wê ye. Lê forma “çî” zêdetir bi armanca şidandin û xurtkirinê li cihê “çi” tê bikaranîn.

Di kurmanciya nivîskî ya bi alfabeya latînî de forma “çî” serdest e lê forma “çî” jî yê dîtî. Di soranî de û herwiha di kurmanciya bi alfabeya erebî de jî forma serdesttir “çî” ye lê forma “çi” jî carinan di nivîsan de tê dîtî.

1.2. Cînavê “kî”

Bo wergirtina navên kesan yan peyveke ravekera mirovan, di kurmancî de pirs bi cînavê “kî” tê kirin:

- Kî ye?
- Kî hatibûn?
- Te kî dît?

Cînavê “kî” bêcins û bêhejmar e:

- Kî mêr hat?
- Kî jin hat?
- Kî zarok hatin?

Lê di kurmancî de herwiha formeke din jî ya vî cînavî li kar e: “kê”.

Berevajî ku hin caran bi şaşî tê texmînkirin, “kê” ne forma mê ya cînavê “kî” ye. Anku “kî” ne bo nêran (mêran) û “kê” jî ne bo mêyan (jinan) tenê tê bikaranîn.

“Kî” pirsek e ku dikare bi “Ez, tu, ew, em hûn, Jiyan, Hesen” were bersivdan:

- Kî mamoste ye? – Ew mamoste ye.
- Kî dibêje? – Ez dibêjim.
- Kî hatin? – Em hatin
- Kî keça Hesenî ye? – Jiyan keça Hesenî ye.

“Kê” forma çemandî ya cînavê “kî” ye, wek çawa ku “min” forma tewandî ya cînavê “ez” e:

- Kê got? – Min got.
- Kê Hesên dîtiye? – Jiyanê Hesên dîtiye.
- Jiyan keça kê ye? – Jiyan keça Hesênê ye.

Di ravekirinê de “kî” jî dikare bibe mê, nêr yan pirhejmar:

- kiyê te? – kurê min
- kiya te? – keça min
- kiyên te? – keç û kurên min

Di soranî de tenê “kê” heye ji ber ku di soranî de tenê formeke cînavan heye: “min” heye lê “ez” nîne, “to” (hevbera “tu” ya kurmancî) heye lê “te” nîne. Di hin devokên soranî de “kê” wek [çê] tê gotin lê di zimanê nivîskî de herdem wek “kê” (کێ) tê nivîsîn.

Di zazakî de forma serdest bi maneya “kî” ya kurmancî “kam” e. Ew li gor cins û hejmarê diçeme. “Kam” di soranî de jî li kar e lê maneya “kîjan” ya kurmancî dide (*li jêtir binêrin*).

1.3. “Ku” wek cînavêkî pirsyarkî

Peyva “ku” di kurmancî de bi çendîn erk û wezîfeyên ji hev cuda li kar e. Bi piranî ew wek *girêdera* (konjunksiyon, bi inglîzî *conjunction*) du hevokan tê bikaranîn wek:

- “ez dizanim” + “tu kesekî qenc î” → ez dizanim *ku* tu kesekî qenc î.

Carinan hin kes wê bi awayê “ko” dinivîsin. Di soranî û zazakî de ew bi awayê “ke” serdest e, di farisî de wek “kê” tê bikaranîn. Ew jî zimanên îranî wek “ki” ketiye tirkî jî. Di kurdî de jî carinan forma “kî” jî tê xebitandin, bo nimûne di peyvên “bel-kî, we-kî” de.

“Ku” herwiha carinan wek *hoker* (adverb) li şûna “kû, kî der, kîjan cih” jî hem di hin devokan de û hem jî di nivîsîna hin kesan de tê xebitandin. Lê forma serdest ya bi vê maneyê di zimanê nivîskî de “kû” ye, bi soranî “kwê”.

Lê peyva “ku” hem di kurmancî û hem jî di soranî de herwiha wek cînav jî tê bikaranîn. Di kurmancî de bi taybetî li Behdînan û Botan û di soranî de jî xaseten li Hewlêrê, ew dikare carinan cihê “ku” bigire, carinan jî şûna “çawa”:

- kurmancî (Behdînan / Botan): Tu ku dibêjî? (Tu çi dibêjî)
- soranî (Hewlêr): To ku yî? (Tu çawa yî?)

Ev bikaranîn hem di kurmancî û hem jî di soranî de ber bi kêmbûnê ve ye û di ti ji herdu zaran de bi nivîskî hema-hema êdî qet nayê bikaranîn. Lê ev bikaranîn gelek kevnar e û bo nimûne Ehmedê Xanî ew bi berfirehî bi kar aniye. Ew di Mem û Zînê de wiha dinivîse (me ku-yên bi maneya “çi” yan “çawa” **qelew** kirine lê ku-yên girêder *xwehr* kirine):

We zû şemirand ji bo çi sersal
Hûn rast bibên **ku** bûye ehwal?

Hûn bêjine min **ku** bû qediyê?
Kengê li me xef dibit xebiyê

Mecnûn *ku* nebit ‘edîlê Leylê
Leylê **ku** dikit bi Leyl meylê?

Go ez **ku** bibêm bike tu bawer
Dawer bi mi ra ku bûye yawer

Em dê **ku** heqîqetê ‘eyan kin?
Serrîştêyê tuhmetê beyan kin

Ger fewt bikim cemî‘ê ferzan
Tacdîn **ku** didim ji dest xwe erzan?

1.4. Etîmolojîya cînavên pirsyarkî yên xwerû

Ji aliyê tarîxî ve “çi, kî, ku” cînavên pir kevn in, her sê jî ji eynî rehî ne û hema-hema di hemû zimanên hindûewropî de hevrehên wan hene:²

kurdî	çi, çî, kî, kê, ku, kam
farisî	çê, çî
pehlewî	çê
avestayî	çiş, ko
rûsî	что (şto), чë (ço), чо (ço), шо (şo)
polonî, çekî	co (bixwîne: ço)
îrlandî	cè, cad
latînî	quis, qui, que
fransî	qui, que
îtalî	cui, chi, che
spanî	que, quien, cuyo
inglîzî	what, who (kî)

1.5. Cînavên “kîjan, kîşk”

Di kurmanciya navendî û ya rojavayî de cînavê “kîjan” de bi wateya “çi ji filan tiştan” yan “kî ji filan kesan” tê bikaranîn. Di zimanê devkî de ew carinan wek “kîja” tê bihîstin.

Di kurmanciya rojhilatî de li cihê wê, forma “kîşk” ya hevwater li kar e. Gava ku ew wek pêşdiyarker were bikaranîn anku li pey wê navdêrek hebe, hingê ew bi forma “kîş” yan “kîj” e anku K pê ve nîne.

Bo nimûne:

² Bo lîsteyeke dirêj ya hevrehan, binêrin: <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/k%CA%B7is>

- kîşk + rojê → kîş rojê, kîj rojê

“Kîjan, kîşk” hevwaterên soranî “kam”, zazakî “kamcîn, farisî “kodam”, inglîzî “which”, tirkî “hangi”, erebî “eyy” û fransî “quel” in.

Ji aliyê etîmolojî ve adeten tê bawerkirin ku “kîjan” kurtkirina “kî ji wan” be. Hingê “kîj, kîş, kîşk” yê kurmanciya rojhilatî jî dikarin kurtkirinên gotinên “kî jê” bin. Forma “kîşk” dikare bi zêdekirina K ya biçûkker be.

Ji aliyê watenasî ve, ev texmîn beraqil in. Li aliyekî din, gava ku mirov li hevwaterên wan yê bi zar û zimanên lêzim dinêre, mimkin e ku “kîjan, kîj, kîşk” ne ji “kî ji wan, kî jê” bin lê hevrehên “kamjîn” ya zazakî, “kam” ya soranî û “kodam” (berê “kudam”, bi devkî “kodûm, kûdûm”) ya farisî bin. Bêguman e ku “kam, kamcîn, kodam” her sê hevreh in û formên bi “kam-“ kurtkirinên forma “kudam” in. Rehên van digihin heta makezimanê proto-hindûewropî jî. Bidin ber:

- sanskrîtî: katara
- rûsî: kotoriy
- yûnaniya kevn: kotêro → potêro

Bi demê re di zimanên îranî de T bûye D û dawiyê di kurdî D (soranî û zazakî) de bi temamî ketiye (bidin ber kurdî “ba, bûn” û farisî “bad, bûden”).

“Kîjan” û “kîşk” hem wek cînavên serbixwe û hem jî wek pêşdiyarker (predeterminer) tîk bikaranîn:

- Te kîjan dît? (cînav)
- Te kîjan kitêb dît? (pêşdiyarker)

“Kîjan” bêhejmar, bêncins û neçembar e. Bo nimûne:

- Tu *kîjan* mêrî dibînî? (bidin ber: Tu *wî* mêrî dibînî.)
- Tu *kîjan* jinê dibînî? (bidin ber: Tu *wê* jinê dibînî.)
- Tu *kîjan* mirovan dibînî? (bidin ber: Tu *wan* mirovan dibînî.)

“Kîşk” jî wek pêşdiyarker (dema ku berî navdêrekî be) be, bêhejmar, bêncins û neçembar e:

- kîşk mêrî, kîşk jinê, kîşk mirovan

Lê wek cînavê serbixwe, “kîşk” – berevajî “kîjan” – bihejmar, bicins û çembar e:

- kîşkê (kî jinê, çi tiştê mê)
- kîşkî (kî mêrî, çi tiştê nêr)
- kîşka[n] (kî mirovan, çi tiştan)

Di bin tesîra kurmanciya rojhilatî de – yan jî ji aliyê qisekerên kurmanciya rojhilatî ve – forma neçembar ya “kîjan” ya kurmanciya navendî jî tê çemandin: “kîjanê, kîjanî”. Bo nimûne:

- “Kurd dê kîjanê hilbijêrin: federalî, konfederalî yan serxwebûn”³
- “Kîjanî civak talan nekirine? Kîjanî welat wêran nekirine? Kîjanî nirxên herî pîroz ên mirovahiyê nexistine binê piyê xwe? Kîjanî serî li rêbazên herî qirêj û derveyî exlaq nedaye?”⁴
- “Wexta kîjanan li qedandinê bû, ji kîjanan re hîn pîrr mabû? Di kîjan dosyayan de pêwîstiya lêgerînê tune, di kîjanan de lêgerîn an lêkolînên bi rêk û pêk divêt? Min her carê, li gor lînûska xwe ya danişînê dinirxand.”⁵

Carinan jî ev çemandin dikare ji ber sebebên hîperkorektiyê be.⁶

1.6. Cînavê “çend”

Bi cînavê “çend” di kurdî de bi armanca pirsîna hejmara tiştêkî tê bikaranîn:

- Hûn çend kes in?
- Tu çend salî yî?
- Ew çend bûn?

³ <http://krd.sputniknews.com/kurdistan/20160508/2756338/Kurd-de-kijane-hilbijerin-federali-konfederali-yan-serxwebun.html>

⁴ <http://azadiyawelat.site/?p=13243>

⁵ <http://www.pen-kurd.org/kurdi/sedat-yurtdas/malava.html>

⁶ Bo hîperkorektiyê binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/07/06/hiperkorekti-anku-zede-rasti/>

Wek cînav, di kurmanciya navendî de ew tenê bi vê meremê li kar e, li cihê “how many” ya inglîzî. Lê di kurmanciya rojhilatî û herwiha di soranî de jî ew herwiha li cihê “çiqas” (çiqas) ya kurmanciya navendî jî li kar e (bi inglîzî “how much”):

- Ew bi çendê ye? (Ew bi çi qasî ye?)
- Te heta çendê hejmart? – Heta sedê.

“Çend” herwiha wek hoker jî bi maneya “hinek, hindek, hin” tê bikaranîn:

- Çend kes li wê derê bûn. (Hin kes li wê derê bûn.)

“Çend” di kurmancî, soranî, zazakî û farisî de bi heman şiklê “çend” li kar e. Ew di van hemû zar û zimanan bi forma xwe ya kurtkirî “çen” jî peyda dibe. Di kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) de forma serdest “çen” yan “çenn” e, di hewramî “çinne”. Rehên peyva “çend” digihin makezimanê proto-hindûewropî jî:

- pehlewî “çend”
- hexamenişî “çiyent-“
- avestayî “çvent-“
- sanskrîtî “kivent-“
- latînî “quantus”
- îtalî û portugalî “quanto”
- spanî “cuando”
- fransî “quant”

Hemû ji proto-hindûewropî *^hkui^hent-“ (çend) ji *k^wis (çi, kî). K-ya proto-hindûewropî bi piranî di zimanên îranî de dibe Ç yan S.

Wek pêşdiyarker (berî navdêran), peyva “çend” bêhejmar, bêcins û neçembar e:

- çend jin?
- çend mêr?
- çend kesan?

Wek cînavekî serbixwe, “çend” li gor hejmarê diçeme:

- Tu ê çendan bixwî? (bo nimûne “çend sêvan?”)

Di kurmanciya rojhilatî de “çend” dikare bi yekhejmarî jî wek mê biçeme:

- kurmanciya rojhilatî: Te ew bi çendê kirrî?
- kurmanciya navendî: Te ew bi çi qasî kirrî?

1.7. Hokerên pirsyarkî: kû, ka, kengî, çiqas...

Gelek caran peyvên “kû” (li çi derê), “ka” (li kû ye), “kengî” (çi demê), “çiqas” (çi miqdar) û hin peyvên din jî li gel cînavên pirsyarkî tîrên rêzkirin û behskirin.

Lê ev peyv ne cînavên pirsyarkî lê hokerên pirsyarkî ne. Loma em ê wan li gel hokerên din di vekolîneke xwe ya din de behskirin.

2. CÎNAVÊN RAVEKER

2.1. Cînavên raveker û tevokên raveker

Cînavên raveker yan *cînavên têkiliyê* (bi inglîzî *relative pronoun*) tevoka serekî û hevoka ravekî bi hev ve girê didin. Mebest ji **tevoka serekî** (bi inglîzî *main clause*) ew beşa hevokê ye ku dikare serbixwe wek hevokeke temam were bikaranîn. Mebest ji **tevoka raveker** (*relative clause*) ew **tevokên binekî** (*subordinate clause*) ne ku tevoka serekî rave dikin. Kerem bikin em li vê van nimûneyan binêrin:

- Yê ku hat, birayê min bû.
- Ev Hesên e ku mamoste ye.
- Mala ku ew lê dijîn biçûk e.

Di her yekê ji van hevokan de tevokeke serekî û tevokeke raveker heye. Eger em tevokên raveker biavêjin, tevokên serekî dê wiha bimînin:

- Birayê min bû.
- Ev Hesên e.
- Mal biçûk e.

Wek ku tê dîtin, tevokên serekî dikarin bêyî tevokên raveker jî bên bikaranîn lê tevokên raveker - wek navê xwe – tevokên serekî rave dikin û zêdetir agahiyan li ser wan didin me. Lê tevokên raveker bi xwe nikarin bi tenê wek hevokên temam bên bikaranîn:

- *Yê ku hat.
- *Ku mamoste ye.
- *A ku ew lê dijîn.

2.2. Rêzbendiya tevokan

Di kurdî de tevoka raveker dikare (tevoka raveker di nimûneyan de hatiye *xwehrkirin*):

- **berî tevoka serekî be.** Bo nimûne: *Yê ku hat, birayê min e.*

- **piştî tevoka serekî be.** Bo nimûne: Ev Hesên e *ku mamoste ye.*
- **di nav tevoka serekî re be.** Bo nimûne: Mala *ku ew lê dijîn* biçûk e.

Di hin zimanan de tevokên serekî û tevokên raveker herdem bi bêhnokekê (vîrgulekê) ji hev tîn veqetandin. Lê di kurdî û piraniya zimanan de adeten bêhnok tenê hingê tê bikaranîn, eger tevoka raveker berî tevoka serekî were bikaranîn:

- Yê *ku hat*, birayê min bû.

Bikaranîna bêhnokê herwiha hingê jî mimkin e gava ku tevoka raveker piştî tevoka serekî be:

- Ev Hesên e[,] *ku mamoste ye.*

Lê gava ku tevoka raveker di nav tevoka serekî re be, bikaranîna tevokê di kurdî de dijwar e. Hingê ne bêhnokek lê du bêhnok divê bîn bikaranîn daku tevoka raveker li destpêk û dawîya wê, wê ji tevoka serekî veqetînin:

- Mal[,]a *ku ew lê dijîn[,]* biçûk e.

Hin caran tê dîtin ku tenê bêhnokek tê bikaranîn, adeten li dawîya tevoka raveker lê ne li destpêka wê:

- Mala *ku ew lê dijîn[,]* biçûk e.

Lê ev awayê ne tevlihevker e ji ber ku ew peyva “mal” ya endama tevoka serekî jî bi tevoka raveker ve dihêle û hem tevoka serekî û hem jî tevoka raveker şêlû dike.

2.3. Cînavên raveker di kurmancî de

Cînavên ravekî di kurmancîya giştî de ev in:

- **(y)a** (yekhejmar mê)
- **(y)ê** (yekhejmar nêr)
- **(y)ên** (pirhejmar)

Ew di kurmancî de bi piranî li gel peyva **ku**⁷ tên bikaranîn. Wek cînavên serbixwe, di kurmanciya rojhilatî de ew bi formên xwe yên bi Y (ya, yê, yêt/yêd) tên bikaranîn, di kurmanciya navendî de bi formên bêyî Y (a, ê, ên) tên bikaranîn. Di zimanê nivîskî de herdu form jî tên dîtin:

kurmanciya rojhilatî:

- Yê ku hat, birayê min e.
- Ya ku hat, xwişka min e.
- Yêt/yêd ku hatin, hevalêt/hevalêd min in.

kurmanciya navendî û rojavayî:

- Ê ku hat, birayê min e.
- A ku hat, xwişka min e.
- Ên ku hatin, hevalên min in.

Di kurmanciya rojavayî de gelek caran forma pirhejmar jî “ê” ye:

- Ê ku hatin, hevalên min in.

Gava ku cînavên raveker li pey navdêrekê bin, ew li gor cins û hejmara wî navdêrî diguherin:

- Mala ku ew lê dijîn biçûk e.
- Bajarê ku ew lê dijîn biçûk e.
- Sêvên ku me xwarin xweş bûn.

Eger peyva pêştir bi konsonantekê bi dawî were, hingê formên bêyî Y (-a, -ê, -ên) tên bikaranîn. Lê eger peyva pêştir bi vokalekê bi dawî were, hingê formên bi Y (-ya, -yê, -yên) tên xebitandin:

- Kitêba / rojnameya ku dixwînim kevn e.
- Bajarê / xaniyê ku lê dijîm mezin e.
- Kolanên / rêyên ku pê ve dimeşim ne teng in.

Ji bilî, navdêran, ravek dikarin herwiha bikevin pey cînavan jî:

- Ewê ku hat birayê min e.

⁷ Di kurmancî de carinan wek “go, ke, kî, ko, kû” jî tî nivîsîn lê forma serdest “ku” ye. Di soranî û zazakî de forma serdest “ke” ye.

- Ewa ku hat xwişka min e.
- Ewên ku hatin hevalên min in.

Di rastiye de formên wek “yê ku hat, birayê min e” jî formên kurtkirî yên “ewê ku hat, birayê min e” ne.

2.4. Cînavên raveker di zar û zimanên lêzim de

Di soranî de cînavên raveker yê serbixwe (ne li pey navdêran girêdayî) “hî” ye ku bêcins û bêhejmar e:

- hî ke hat, biray min e (yê ku hat, birayê min e)
- hî ke hat, xwêşkî min e (yak u hat, xwişka min e)
- hî ke hatin, hawrêyekanî min in (yên ku hatin, hevalên min in)

Cînavên raveker yên girêdayî di soranî de jî wek di kurmancî de bi alîkariya ravekan û girêdeka “ke” (ku) tên avakirin. Ew li gor hejmarê (lê le li gor cinsî) tên cudakirin:

- malî **ke** lê dejîm biçûk e (mala *ku* lê dijîm biçûk e)
- şarî **ke** lê dejîm biçûk e (bajarê *ku* lê dijîm biçûk e)
- sêwekanî **ke** xwardim xoş bûn (sêvên *ku* min xwarin xweş bûn)

Di zazakî de cînavê raveker yê serbixwe bo her cins û hejmara rêzimanî cuda ye:

- o ke ame, birayê min o. (yê ku hat, birayê min e.)
- a ke ame, waya min a. (ya ku hat, xwişka min e.)
- ê ke ameyî, ambazê min ê. (yên ku hatin, hevalên min in.)

Cînavên raveker yên girêdayî jî di zazakî ji ravekên navdêran û girêdera “ke” (ku) pêk tên.

Di farisî de jî cînavên raveker yên girêdayî ji ravekên (izafe) navdêran û girêdera “kê” (herwiha “kî”) pêk tên.

3. Cînavên nediyar

3.1. Cînavên nediyar çi ne?

Mebest ji cînavên nediyar⁸ ew cînav in ku amaje bi ti tiştê bernas yan diyar nakin lê bi awayekî giştîtir in. Hin ji wan cînavên nediyar yên giştî, hin yên neyînî û hin jî yên bijarî ne. Ew dikarin amaje bi mirovan an jî tiştan an jî herduyan bikin. Hin ji wan amaje bi tiştên hejmêrbar bikin, hin bi yên nehejmêrbar û hin jî bi herduyan.

Hêjayî gotinê ye ku gelek ji cînavên nediyar tenê di hin haletên bikaranînê de cînav in. Ew di hin haletên din de endamên yek yan çend birrên din yên peyvan in. Bo nimûne, peyvên “gelek” û “kes”:

- “Gelek hatin.” (gelek = cînav) Lê “Ew gelek baş bûn.” (gelek = hoker.) û “Ev gelek e.” (gelek = rengdêr).
- “Kes nehat.” (kes = cînav) Lê “Em du kes in.” (kes = navdêr.)

3.2. Rêzkirina cînavên nediyar

Di tabloya li jêr de em ê van cînavan li gel varyant û bikaranîna wan rêz bikin. Em ê herwiha diyar bikin ka ew bo amajekirina bi mirovan yan tiştan/heywanan an jî herduyan tîn bikaranîn. Em ê wê jî diyar bikin ka ev cînav tê çemandin (tewandin) yan na di bin sernavê “çembar” de. Di tabloyê de mebest ji + “erê” û ji – jî “na” ye. Li jêrtir em ê yek bi yek li ser van cînavan hûrtir rawestin.

cînav	varyant	mirov	tişt/heywan	çembar	wate bi inglîzî
çend ⁹	çen	+	+	+	some, a few
çendîn	çendan	+	+	-	several

⁸ Di hin rêzimanan de “cînavên nebinavkirî”.

⁹ Bi maneya “hin, hinek, hindêk”, wek “çend kes hatin” (hin kes hatin).

(ya/yê/yên) din	dî, dîtir, di, dinê, dîtirê	+	+	+	other
eynî		+	+	+	same
filan (kes / tişt)	fulan	+	+	+	so-and-so, such-and- such
gelek	gele	+	+	+	many, a lot, lots of
gişt	giş, gişk, gî ¹⁰	+	+	+	all
heman		+	+	?	same
hemû ¹¹	hemî, hemîçk, hemûşk	+	+	+	all
her		+	+	-	every
her kes	herkes	+	-	+	everyone
her tişt	hertişt	-	+	+	everything
her der	herder, her cî, her cih	-	+	+	everywhere
heçî	her çi, her kî	+	+	+	whoever, whatever
herdu	her du	+	+	+	both
hin	hinek, hindek, hindik	+	+	+	somebody, something
hîç	hêç	+	+	+	none, not any
kes	kesek	+	-	+	anyone, no one

¹⁰ Di kurmanciya rojhilatî de nayê bikaranîn.

¹¹ Di kurmanciya rojavayî û piraniya kurmanciya navendî de nayê bikaranîn, li cihê wê "gişt" yan varyanteke wê li kar in.

kêm		+	+	+	few
piçek		+	+	+	a little, some
pir	pirr	+	+	-	many, lots of, a lot
tev ¹²	-	+	+	+	all, altogether
ti	çu, tu, çi	-	+	-	nothing
ti kes	çu kes, tu kes, çi kes	+	-	+	on one, nobody
ti tişt	çu tişt, tu tişt, çi tişt	-	+	+	on one, nobody
tişt	tişte	-	+	+	anything, nothing
xirr ¹³	xirrek, xir, xirek	+	+	+	all
yek	êk, yêk	+	+	+	one, someone
zehf	zaf, zahf	+	+	-	many, plenty, lots of
zêde		+	+	-	too many

Li jêr jî em ê yek bi yek li ser taybetmendiyan van cînavan rawestî û li gor pêwîstiyên nimûne ji wan bidin.

¹² Bi piranî di kurmançiya rojavayî de, carinan di kurmançiya navendî de jî lê ne di kurmançiya rojhilatî de.

¹³ Tenê li hin deverên kurmançiya rojhilatî (bi taybetî li Dihokê) tê bikaranîn.

Çend

Bi eslê xwe “çend” cînavêkî pirsyarkî ye û me li jor, di nav cînavên pirsyarkî de etîmolojiya wê diyar kiriye. Lê di zar û zimanên îranî de ew herwiha wek cînavêkî nediyar yê bi wateya “hin, hinek, hindek” jî tê bikaranîn.

Çendîn, çendî, çend, çendan

Cînavê “çendîn” û varyantên wî “çendan” û “çendî çend” bi maneya “gelek, pir” jî tê bikaranîn:

- çendîn caran (gelek caran, pir caran)
- çendî çend salan (gelek salan)

Ji bilî kurmancî, ew herwiha di soranî û farisî de jî li kar in.

Çu, çi

Binêrin: Ti, tu

(ya/yê(yên) din

Cînavê nediyar “din” di forma serdest ya kurmanciya nivîskî ye lê li gor devokan ew dikare bi çendîn awayên ji hev cuda be:

- kurmanciya rojhilatî: dî, dîtir, dîtirê
- kurmanciya navendî: din, dinê
- kurmanciya bakur-rojhilatî (serhedî): di, din

Hevrehên wê jî di zar û zimanên lêzim de wiha ne:

- soranî: dî, dîke, tir
- bîn
- farisî: dîger, dîgê (→ tirkî “diğer”)
- pazendî: dedîger
- pehlewî: dîtîker

- avestayî: dvitiye kere

Cudahiya cînavê “din” û varyantên wî li gel cînavên din yên nediyar ew e ku ew ne pêşdiyarker e lê paşdiyarker e anku ew dikeve dûv tiştê ku rave dike, ne berî wî. Bo nimûne:

- hevalên din (bidin ber “çend heval, gelek heval, hemû heval, her heval” û hwd.)

Li cihê cînavê “din”, bi taybetî di kurmançiya rojavayî de hevwatera wî ya tirkî **başqe** (ji tirkî “başka”) ji mêj ve cihê xwe girtiye. Ew ne tenê li nav sinorên Tirkiyê di kurdî de li kar e lê heta derbazî Rojavayê Kurdistanê de vera Efrînê û herwiha li Serhedê derbazî kurdiya Ermenistanê jî bûye.

Cînavê “din” û varyantên wî ne li gor cînsî û ne jî li gor hejmarê naçemin lê navdêran berî wî li gor cîns û hejmara xwe ya rêzimanî raveka mê, nêr yan pirhejmar werdigire:

- hevala din
- hevalê din
- hevalên din

Berevajî “din” û varyantên wê yên din yên kurdî-îranî, hevwatera wê ya ji tirkî wergirtî “başqe” ne paşdiyarker lê pêşdiyarker e anku ew dikeve berî peyva raveber:

- başqe tişt (“tiştên din” yan “tiştên din”)
- başqe kesek (kesekî/keseke din)

Eynî

Peyva “eynî” (‘eynî, aynî, ‘aynî) maneya “heman, wek tiştêkî, ne ji tiştêkî cuda” dide. Ew dikare wek rengdêr, hoker û wek cînav were xebitandin.

“Eynî” bi eslê xwe ji erebî ye lê ketiye zimanên din jî (bo nimûne kurdî, farisî, tirkî). Eslê wê peyva erebî ‘eyn anku “çav” e: mebest ji “eynî” bi eslê xwe ew tişt in ku li gor dîtina bi çavan dişibin hev. Ji ber ku “eynî” bi eslê xwe ji erebî ye, di zimanê nivîskî de hin kes gelek caran peyva “heman” tercîh dikin ku vê dawiyê bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmançî (li jêrtir binêrin).

“Eynî” di kurdî de wek pêşdiyarker û hem jî mîna cînavêkî serbixwe tê xebitandin. Bo nimûne:

- Eynî kes hatin. (pêşdiyarker)

- Eynî hatin. (cînavê serbixwe)

Wek pêşdiyarker ew bêyî ravek û bêyî çemandinê tê bikaranîn:

- eynî kes → eynî kesî, eynî kesê, eynî kesan

Wek cînav ew dikare wek mê, nêr û pirhejmar were:

- ez eyniyê dibînim. (ez eynî kesê dibînim)
- ez eynî/eyniyî dibînim. (ez eynî kesî dibînim)
- ez eyniyan dibînim. (ez eynî kesan dibînim)

Lê carinan ew dikare bi forma xwe ya “eynî” li cihê van her sê formên “enyê, eynî/eyniyî, eyniyan” jî were xebitandin:

- ez eynî dibînim (eynî kesê, eynî kesî, eynî kesan)

Filan

Cînavê “filan” (carinan “fulan”) ne tenê di lehceyên kurdî de lê di piraniya zimanên Rojhilata Navîn de (di kurdî, erebî, farisî, tirkî û çendîn zimanên din de) li kar e. Ihtimalen eslê wê erebî ye lê belav bûye nav zimanên din jî. Ew hem serbixwe û hem jî wek “filan kes” yan “filan tişt” tê xebitandin. Herwiha ew bi awayê “filan û bêvan”¹⁴ û “filan û fîstan” jî tê gotin û nivîsîn.

“Filan” cînavêkî wek pêşdiyarker neçembar e:

- filan kes
- filan kesî
- filan kesê
- filan kesan

Lê wek cînavêkî serbixwe ew bi tamamî çembar e:

- filanî got (wî got)
- filanê got (wê got)

¹⁴ Li gor hin devokan “filan û bêhvan” yan “filan û bihvan”.

- filanan got (wan got)

Gelek

Peyva “gelek” li gor haletê bikaranîna xwe dikare hoker, rengdêr an jî cînav be. Li vê derê em ê bikaranîna wê ya cînavî diyar bikin.

Gelek bi eslê xwe ji peyvên “gel” (kom) û “-ek” (yek) pêk hatiye, wek “hin-ek, piç-ek” e. Ev paşgira “-ek” ya çemandinê hê jî di dengnasiya peyva “gelek” de diyar e ji ber ku giraniya anku kirpa peyvê li ser “gel-“ e, ne li ser “-ek” ji ber ku paşgirên çemandinê adeten di kurdî de bê giranî ne. Bi heman awayî ew di peyvên “hin(d)ek” û “piçek” de jî li ser kîteya yekem e, ne li ser paşgira “-ek” e.

Gelek berê tenê di kurmanciya rojhilatî de û di devokên soranî yên nêzikî kurmancî de de li kar bû lê bi rêya zimanê nivîskî û medyayê êdî li deverên din jî yên kurmancî û soranî tê bihîstin. Wek din li cihê wê di kurmancî de peyva “pir”, di soranî de “zor” û di zazakî de “zaf” li kar e. Li derveyî kurmancî û soranî, di zar û zimanên din yên îranî de peyva “gelek” û hevrehên wê peyda nabin.

Peyva bi “gelek” bi eslê xwe ji peyva “gel” (kom) û paşgira “-ek” (yek) pêk hatiye, anku “gelek = komek, ne tenê kesek yan tiştek”. Bi heman awayî peyvên “piçek, hin(d)ek” ji peyveke serbixwe û paşgira “-ek” pêk hatine.

Di kurmancî de di axiftinê de gelek caran wek “gele” anku bêyî K-ya dawiyê tê gotin, xaseten gava ku wek pêşdiyarker berî navdêrekî tê xebitandin:

- gele(k) kes, gele(k) mirov, gele(k) êş

Herwiha gava ku ew wek hoker li berî rengdêran jî tê emilandin, xaseten di kurmanciya rojhilatî de ew bi awayê “gele” tê bihîstin:

- gele xweş

Alternatîva wê ya hokerî di kurmanciya navendî de adeten “gelekî” ye:

- gelekî xweş

Di soranî de li gel forma “gelek”, herwiha awayên “gelêk, gelê” jî li kar in. Di soraniya nivîskî de lihevkirineke sertaserî nîne ka paşgira bi maneya “yek” wek “-ek”, “-êk” yan “-ê” were nivîsîn.

Peyva gelek wek pêşdiyarker li berî navdêran naçeme û ravekê jî nagire:

- gelek kesan (ne “*gelekan kesan”)

Peyva “gelek” bi serbixweyî çembar e:

- gelekê venexwin (gelek avê/şerabê venexwin)

Ji aliyê hejmara rêzimanî ve peyva “gelek” dikare hem wek yekhejmar û hem jî pirhejmar be:

- gelekê nexwin (gelek birincê/savarê nexwin)
- gelekan nexwin (gelek sêvan/soxan nexwin)

Ji aliyê cinsî ve bi temamî ne diyar e ka herdu cins hene yan jî na ji ber ku di kurmanciya rojhilatî de (ku peyva “gelek” tê de bi berfirehî tê bikaranîn) forma çemandî ya paşgira nediyariyê “-ek” ji herdu cinsan re wek hev “-ekê” ye. Di kurmanciya navendî de (ku bikaranîna peyva “gelek” tê de bisinor e) û di kurmanciya nivîskî de vê paşgirê du formên çemandî yên mê (“-ekê”) û nêr (“-ek”) hene. Forma “gelekî” di kurmanciya navendî de zêdetir wek forma hokerî, ne ya cînavî ya nêr, li kar e. Lê beraqil e ku mirov li gor qeydên giştî yên zimanê nivîskî herdu formên nêr (gelekî) û mê (gelekê) binivîse:

- gelekê venexwe (= gelek avê venexwe” ji ber ku “av” mê ye)
- gelekî nexwe (= “gelek nanî nexwe” ji ber ku “nan” nêr e)

Gişt

Peyva “gişt” maneya “hemû, hemî, tev, kull, bitûn” dide. Ew hem di kurmancî û hem jî di soranî de peyda dibe lê ne li her deverê. Di herdu zaran de ew bi awayê “giş” anku bêyî T li dawiyê jî li kar e. Di kurmancî de li hin deran herwiha li cihê “gişt” forma “gişk” jî heye. Di kurmanciya rojavayî de ew herwiha bi forma “gi, gih, gî” tê bikaranîn.

Peyva “gişt” ji aliyê rehnaşî ve ji proto-hindûewropî ye û hevrehên wê hem di şaxên hindûîranî û hem jî di zimanên slavî de peyda dibe: sanskrîtî û hindî विष् (vísva), çekî vše, весь (ves’), slovakî vsetok û hwd. Bo guherîna V bi G, bidin ber kurmancî “gul, gur(g), giya” û zazakî “vil, verg, vaş/vas” û hwd.

Tiştê ecêb ew e ku ew di kurmanciya navendî û kurmanciya rojavayî de û herwiha di soranî de jî heye lê di kurmanciya rojhilatî de – ku dikeve navbera kurmanciya navendî û soranî – peyda nabe.

Peyva “gîşt” û varyantên wê dikarin hem wek pêşdiyarker û hem jî paşdiyarker werin bikaranîn. Li vê derê mebesta me ji “pêşdiyarker” ew e ku cihê wê berî peyva serekî yan û mexsed ji “paşdiyarker” ew e ku ew li pey peyva serekî tê bikaranîn:

- wek pêşdiyarker: gîşt heval
- wek paşdiyarker: heval gîşt

Wek paşdiyarker ew herdem neçemandî û bêyî ravek e:

- heval gîşt hatin
- hevalan gîşt hatin (ne “*hevalan gîştan hatin”)

Wek pêşdiyarker “gîşt” dikare li gel ravekê jî were bikaranîn:

- bêravek: gîşt heval hatin, gîşt hevalan got
- biravek: gîştê hevalan hatin, gîştê hevalan got

Lê wek pêşdiyarker jî peyva “gîşt” nayê çemandin:

- gîşt / gîştê hevalan got (lê ne “*gîştan hevalan got”)

Wek cînavekî serbixwe (ne wek pêşdiyarker yan paşdiyarker), peyva “gîşt” dikare wek nêr, mê û pirhejmar biçeme:

- mê: gîştê dibînim (wek “wê dibînim”)
- nêr: gîştî dibînim (wek “wî dibînim”)
- pirhejmar: gîştan dibînim (wek “wan dibînim”)

Heçî

Peyva “heçî” maneya “her kî jî be” yan jî “her çi jî be” tê bikaranîn. Ew kurtkriina “her çi jî” ye. Bi wateya “her kî jî be” ew herwiha bi şiklê “herkî, hekî” jî tê bihîstin.

Ew hem wek pêşdiyarker û hem jî wek cînavekî serbixwe tê xebitandin. Wek pêşdiyarker ew bêyî ravek û bêyî çemandinê tê emilandin:

- heçî kesê (ku) bike
- heçî kesa (ku) bike

- heçî kesên (ku) bikin

Wek cînavekî serbixwe ew dikare wek mê, nêr û pirhejmar were çemandin:

- heçiya ku bike
- heçiyê ku bike
- heçiyên ku bikin

Heman

Peyva “heman” maneya “eynî, wek tişteki, ne ji tişteki cuda” dide. Ew dikare wek rengdêr û wek cînav were xebitandin.

Tarîxiyên “heman” di kurdî, xaseten di kurmancî, de nû ye. Ew vê dawiyê bi rêya zimanê nivîskî û medyayê bi rêya soranî ji farisî ketiye kurdî. Ji aliyê rehnasî ve ew ji farisî “hem-an” e û “hem”a wê jî hevreh “hev” ya kurmancî û “haw-“ ya soranî ye.

“Heman” di kurdî de wek pêşdiyarker û hem jî mîna cînavekî serbixwe tê xebitandin. Bo nimûne:

- Heman kes hatin. (pêşdiyarker)
- Heman hatin. (cînavê serbixwe)

Wek pêşdiyarker ew bêyî ravek û bêyî çemandinê tê bikaranîn:

- heman kes → heman kesî, heman kesê, heman kesan

Wek cînav ew dikare wek mê, nêr û pirhejmar were:

- ez hemanê dibînim. (ez heman kesê dibînim)
- ez hemanî dibînim. (ez heman kesî dibînim)
- ez hemanan dibînim. (ez heman kesan dibînim)

Lê carinan ew dikare bi forma xwe ya “heman” li cihê van her sê formên “hemanê, hemanî, hemanan” jî were xebitandin:

- ez heman dibînim (heman kesê, heman kesî, heman kesan)

Hemû / hemî

Peyva wateya “gîşt, tev, xirr(ek), kul, cemî”, bitûn” dide. Ew di kurmanciya navendî û di soranî de bi şiklê “hemû” ye. Di kurmanciya rojhilatî de forma serdest “hemî” ye lê herwiha formên biçûkkirî “hemîçk, hemûçk, hemîşk, hemûşk” di kurmanciya rojhilatî de li hin deveran (bi taybetî li Dihokê û Hekariyan) tên bihîstin. Di kurmanciya rojavayî de tarîxiyên ti ji van formên peyda nedibûn yan jî nemabûn lê vê dawiyê bi rêya zimanê nivîskî û medyayê “hemû” ketiye ser zimanê hin qisekerên kurmanciya rojavayî jî.

Di zazakî de hem peyv bi awayê “heme” peyda dibe. Di farisiya klasîk de jî ew “heme” bû lê niha li ser devê xelkê bûye “hemê”. Di pehlewî de ew bi şiklê “hemeg” bû. Hemû hevrehên peyvên “heman, hev” e û eslê wan heta makezimanê proto-hindûewropî jî diçe: yûnaniya kevn “homos” (gîştî, tevahî, hev-, heman), sanskrîtî “sema-”, inglîzî “same” (heman, eynî). Bo guherîna S bi H, bidin ber kurdî “heft” û yûnanî “hêpta” lê sanskrîtî “septan”, latînî “septem” û inglîzî “seven”.

Di kurmanciya rojhilatî û di soranî de H-ya peyvê wek ya di peyvên “heval, her” de ye lê di kurmanciya navendî de ew bi H-ya wek di peyvên “heft, Hesên” de ye ku bi alfabeya erebî bi tê nivîsîn.

Peyva “hemû, hemî” bi piranî wek pêşdiyarker tê bikaranîn. Wek pêşdiyarker ew nediçeme û ne jî ravekê digire:

- hemû dinya → hemû dinyayê (ne “hemûyê dinyayê” yan “*hemûya dinyayê”)

Carinan ew wek paşdiyarker (bêyî ravekê û çemandinê) jî tê xebitandin:

- dinya hemû dizane → dinyayê hemû zaniye

Wek cînavêkî serbixwe, ew dikare wek mê, nêr û pirhejmar were emilandin:

- hemûyê bixwin (wek “şîvê bixwin”)
- hemûyî bixwin (wek “nanî bixwin”)
- hemûyan bixwin (wek “sêvan bixwin”)

Her

Peyva “her” wateya “yek bi yek, hemû, her yek ji endamên komekê” dide. “Her” di hemû zar û devokên kurdî de û di piraniya zimanên din jî yêrî îranî de bi heman maneyê li kar e. Ew herwiha wek

“her” bi heman maneyê derbazî zimanên tirkî, urdûyî û hindî jî bûye û di wan de jî bi berfirehî tê bikaranîn.

Rehên peyva “her” digihin makezimanê proto-hindûewropî. Ew bi pehlewî “herw”, bi avestayî û hexamenişî “heurve-“, bi sanskrîtî “serve-“, bi latînî “salvus” û bi yûnaniya kevn jî jî “holos” bû ku serekaniya peyvên wek “hologram, holîstîk, holokost” û gelek peyvên me yên din jî yên ji yûnanî ye.

Peyva “her” wek cînavêkî pêşdiyarker yê bêravek û neçembar tê bikaranîn:

- her roj → her rojê (ne “*herê rojê” yan “*hera rojê”)
- her kes → her kesî (ne “*herî kesî” yan “*here kesî”)

Bi pêkanîne çendî cînavên din jî kurdî, farisî û tirkî de tên çêkirin. Beşa duyem adeten navdêr e lê dikare hejmar be (bo nimûne “**herdu**, her sê...”) yan jî cînavêkî pirsiyarkî be (**herçi**, **herçend**):

- **her kes**
- **her der**
- **her tişt**
- **her roj**
- **her car**

Carinan ev peyv bi hev ve jî tên nivîsîn: herkes, herder, hertişt, herroj (carinan “heroj” yan “hero”), hercar. Lê bo zelaliyê çêtir e ku ew ji hev cuda bînin nivîsîn. Wek din, sinorê navbera yên bi hev ve bînin nivîsîn û yên ji hev bînin cudakirin, ne diyar e. Bo nimûne, eger em binivîsin “herroj”, çima em nenivîsin “herşev”. Yan eger em binivîsin “hertişt”, çima em nenivîsin “hersêv”, “herkitêb” û hwd.

Hin, hinek, hindek

Peyvên “hin, hinek, hindek” maneya “çend kes yan çend tişt” yan jî “ne kêr û ne jî zêde” dide. Di kurmanciya navendî û kurmanciya nivîskî ya bi alfabeya latînî de formên serdest “hin, hinek” in. Di kurmanciya rojhilatî de forma serdest “hindek” e lê carinan jî forma kurtkirî “hin” tê bihîstin.

Eslê peyvê têkilî peyva “hind” anku “ew qas” e ku heta niha jî di kurmanciya rojhilatî de û bi paşgira “-ek” hatiye sazkirin, wek peyvên “gelek, piçek” jî. Di soranî de ew wek “hendêk” heye û di farisî de jî bi forma “endek” hebû lê di farisî de ji bikaranînê ketiye.

Peyvên “hin, hinek, hindek” hem wek cînavên serbixwe û hem jî wek pêşdiyarker tên xebitandin. Wek pêşdiyarker ew bêyî ravek û çemandinê li kar e:

- hin kes, hinek kes, hindek kes → hin kesan, hinek kesan, hindek kesan

Wek cînavê serbixwe jî ew wek pirhejmar tê çemandin û ravekirin:

- hinan, hinekan, hindekan (hin kesan, hin tiştan)
- hinên din, hinên baş, hinên xweş (hin tiştên din, hin kesên baş, hin xwarinên xweş)...

Hindik

Peyva “hindik” bi maneya “kêm, piçek” li kar e. Ew di kurmanciya navendî û rojavayî de heye lê di kurmanciya rojhilatî de peyda nabe. Berevajî vê, di kurmanciya rojavayî û navendî de hevwateryên wê “piçek, kêm” nayên bikaranîn an jî kêm tên xebitandin.

Peyva “hindik” bi rastî wek rengdêr û hoker tê emilandin lê carinan wek cînav jî li kar e. Wek cînav ew dikare hem cînavê serbixwe be û hem jî wek pêşdiyarker tê şuxilandin:

- Hindik hatin. (kêm kes hatin)
- Hindik kes hatin.

Wek pêşdiyarker ew naçeme û ravekê jî nagire:

- hindik kes dizanin → hindik kesan dizanî

Wek cînavê serbixwe ew bi pirhejmarî diçeme û ravekê jî digire:

- hindikan dizanî
- hindikên ku dizanin

Hîç

Peyva “hîç” maneya “ti, qet” dide. Ew dikare wek rengdêr, hoker û cînav were bikaranîn.

“Hîç” bi eslê xwe peyveke îranî ye ku di soranî û farisî de jî heye û di pehlewî de jî bi şiklê “êç” li kar bû. Ew ji zimanên îranî wek “hiç” ketiye tirkî jî. Lê bikaranîna peyva “hîç” di kurmançî de tarîxiyên kêrman bû yan jî kêrman bûbû lê vê dawiyê li ber tesîra tirkî yan soranî yan farisî yan jî wan hemûyan dîsa ber bi zêdebûnê ve ye. Lê heta niha jî di kurmançî de li cihê wê zêdetir peyva “ti” yan yek ji varyantên wê “tu, çu, çi” tê emilandin.

Wek pêşdiyarker ew bê ravek û bê çemandin tê xebitandin:

- hîç kes → hîç kesî/kesê/kesan

Lê wek cînavêkî serbixwe ew carinan diçeme û dikare ravekê jî digire:

- hîçan nabînim (hîç kesan/tiştan nabînim)
- hîçên baş tine bûn (ti kesên/tiştên baş tine bûn)

Kes, kesek

Peyva “kes” bi eslê xwe navdêr e lê ew herwiha wek cînav jî tê bikaranîn. Peyva “kes” ji bilî kurmançî, herwiha di zarên din yên kurdî û zimanên din yên îranî de jî bi heman şiklê “kes” li kar e û li gel peyva “her” wek “herkes” ketiye zimanê tirkî jî.

“Kes” wek cînav adeten di hevokên neyînî de li cihê “ti kes” tê xebitandin:

- Kes nehat (ti kes nehat)

Lê carinan di hevokên erênî, bi taybetî yên pirsyarkî de jî peyda dibe:

- Kes dizane? (Ma kesek heye ku bizane?)

Wek cînavêkî serbixwe, peyva “kes” çembar e:

- Kesî negot (ti kesî negot)

Li cihê forma “kes”, bikaranîna forma nediyar ya yekhejmar “kesek” û formên wê yên çemandî jî mimkin in:

- Kesek nehat. (Ti kes nehat)
- Kesekî negot. (Ti kesî negot.)

Kêm

Peyva “kêm” maneya “hindik, piçek, ne gelek, ne zehf, ne zêde” dide. Di kurdî de ew bi piranî wek hoker û rengdêr tê xebitandin lê bikaranîna wê wek cînav jî mimkin e:

- Kêm hatin. (Kêm kes hatin.)
- Kêman ew dîtiye. (Kêm kesan ew dîtiye.)

“Kêm” peyveke kurdî-îranî ye, di soranî de jî hem wek “kêm” û hem jî wek “kem” tê bikaranîn, di farisî de “kem” e û di pehlewî de jî “kem” bû. Di kurmancî de “kêm” bi taybetî di kurmanciya rojhilatî de û hinekî jî di kurmanciya navendî de tê bikaranîn lê di kurmanciya rojavayî de yan peyda nabe yan jî pir kêm tê xebitandin. Di zazakî de wek “kemî” li hin deveran heye lê peyva serdest ya bi vê maneyê di wî zarî de “tay, tayn” e. Di kurmancî de li cihê “kêm” carinan forma “kêmek” jî tê emilandin, li ber modela “gel-ek, piç-ek, hin-ek” û hwd.

“Kêm” hem dikare wek cînavê serbixwe û hem jî wek pêşdiyarker were bikaranîn. Gava ku ew wek pêşdiyarker tê şuxilandin, ew bêyî ravek û çemandinê dikeve berî peyva raveber:

- kêm tişt → kêm tiştan (ne “*kêman tiştan”)
- kêm mirov → kêm mirovan (ne “*kêman mirovan”)

Wek cînavê serbixwe ew dikare bibe pirhejmar û wisa biçeme jî:

- Kêm dibêjin (kêm kes dibêjin) → kêman got (kêm kesan got)

Piçek

Peyva “piçek” maneya “kêm hindik, ne gelek/zêde” dide. Ew hem wek rengdêr, hoker û cînav jî tê xebitandin.

Bi vê erkê xwe “piçek” wek “hinek” û “gelek” ji paşgira “-ek” pêk hatiye. Destpêka wê “piç” jî maneya “biçûk, pirt, pirtik, çip, tişteki pir hûrik” e.

Bergeha cografî ya peyva “piçek” tarîxiyen teng e: ew bi berfirehî tenê di kurmanciya rojhilatî de li kar bûye. Niha bi nivîsînê li deverên din jî yên kurmancîaxiv berbelav bûye.

Peyva “piçek” hem wek pêşdiyarker û hem jî wek cînavêkî serbixwe tê xebitandin. Wek pêşdiyarker ew bêyî ravek û bêyî çemandinê tê emilandin:

- piçek nan → piçek nanî (ne “*piçekî nanî”)
- piçek sêvê → piçek sêvê (ne “*piçekê sêvê”)
- piçek kes → piçker kesan (ne “*piçekan kesan”)

Wek cînavêkî serbixwe ew wek pirhejmar tê xebitandin û çembar e:

- piçek çûn (piçek kes çûn)
- piçekan dît (piçek kesan dît)

Pir, pîrr

Peyva “pir” yan “pîrr” di kurmancî de maneya “gelek, zehf, zor, mişe” dide. Ji aliyê rêzimanî ve hem wek rengdêr, hem wek hoker û hem jî wek cînav tê bikaranîn.

Peyva “pir, pîrr” di kurmanciya navendî, rojavayî û rojhilatî de li kar e lê ew tarîxiyen di kurmanciya rojhilatî de peyda nabe yan jî nemaye. Ji bilî kurmancî, “pîrr” herwiha di zarên din yên kurdî û zimanên din jî yên îranî de jî peyda dibe. Lê maneya wê di van zar û zimanan de ne wek kurmancî ye lê ew wateya “tijî, tije, mişt, dagirtî” yên kurmancî dide. Ev wateya eslî ya peyvê ye û di kurmancî de wateya wê guheriye.

Rehên peyva “pîrr” heta makezimanê proto-hindûewropî ye û hevrehên wê bi maneya “tijî, mişt, dagirtî” di gelek zimanên hindûewropî de hene: kurmancî, soranî, kurdiya başûrî, zazakî, hewramî “pîrr”, farisî “por”, belûçî “pur”, avestayî “pir-, pirine-”, sanskrîtî “purna-, per-”, latînî “plenus”, yûnanî “poly, plethos”, inglîzî “full, fill”, almanî “vull”...

Peyva “pîrr” hem wek pêşdiyarker û hem jî wek cînav serbixwe tê bikaranîn. Wek pêşdiyarker ew bê ravek û bê çemandinê tê xebitandin.

- pir kes → pir kesan (ne “*piran kesan” yan “*pira kes” yan “*pirê kes”)

Wek cînavêkî serbixwe ew pirhejmar e û çembar e:

- pir hatin (pir kes hatin)
- piran got (pir kesan got)

Tev

Peyva “tev” wek cînav maneya “hemû, gişt, hemî” dide. Wek daçek “tev” wateya “li gel, pê re, bi ... re” dide.

Di nav zarên kurdî û zimanên îranî de ew tenê di kurmançî de heye û di kurmançî de jî tenê li hin deveran. Di kurmançiya rojhilatî de ew tarîxiyên peyda nabe yan jî nemaye. Herî zêde ew di kurmançiya rojavayî de li kar e lê herwiha di kurmançiya navendî de û di zimanê nivîskî de jî tê bihîstin û dîtin.

Etîmolojiya peyva “tev” ne bi temamî bêguman e lê du teoriyên xurt bo wê hene. Ew dikare “di hev (de)” be, wek ku “pev” jî “bi hev” û “jev” jî jî “ji hev” e. Lê herwiha ew dikare qusandina yan kurtkirina peyva “teva, tevav” be ku bi eslê xwe jî peyva “temam” ya esil-erebî ne.

Peyva “tev” hem wek cînavêkî serbixwe û hem jî wek diyarker were bikaranîn. Wek cînavêkî serbixwe ew dikare bibe mê, nêr û pirhejmar:

- tevan bixwe (tev sêvan bixwe, hemû sêvan bixwe)
- tevê bixwe (tev sêvê bixwe, hemû sêvê bixwe)
- tevî bixwe (tev nanî bixwe, hemû nanî bixwe)

Wek diyarker ew dikare bibe pêşdiyarker (anku bikeve berî peyva raveber) yan jî paşdiyarker (anku bikeve pey peyva raveber):

- tev heval hatin (pêşdiyarker)
- heval tev hatin (paşdiyarker)

Ti, tu, çu, çi

Cînavê “ti” û varyantên wî “tu, çu, çi” maneya “hîç, qet ne tişteke yan kesek jî” didin û di wateyên peyva “her” in.

Di kurmanciya navendî û rojavayî de û herwiha bi serdestî di kurmanciya nivîskî ya bi alfabeya latînî de jî, formên “ti, tu” tên bikaranîn. Di kurmanciya rojhilatî de formên serdest “çu, çi” ne. Li derveyê kurmancî, di zarên din yên kurdî de û di zimanên din yên îranî de ev cînav bi vê wateyê nayê dîtin. Di soranî û farisî de li cihê wê peyva “hîç” tê xebitandin.

Ji aliyê etîmolojî ve cînavê nediyar “ti, tu, çu, çi” ji cînavê pirsyarkî “çî” peyda bûye û varyantên wê ne. Bo guherîna Ç/T bidin ber peyvên “paçe/pate, qurç/qurt”. Ji aliyê dengnasî ve cînavê nediyar “ti, tu” ji cînavê kesî yê duyem “tu” (di hin devokan “ti”) cuda ye ji ber ku cînavê nediyar bi T-ya bipif (req) lê cînavê kesî bi T-ya bêpif (nerm) tên gotin.

Peyva “ti” û varyantên wê dikarin wek cînavên serbixwe yan jî wek pêşdiyarker bînin emilandin:

- Ti nehatin. (“ti” wek cînavê serbixwe)
- Ti kes nehatin. (“ti” wek pêşdiyarker)

“Ti” û guhartoyên wê di hevokên destnîşankirinê (indikativ) de adeten li gel lêkerên neyînî tînin xebitandin (li jor “ti [kes] nehatin”) lê di hevokên pirsyarkî de dikarin bi erênî û neyînî werin şuxilandin:

- Ti kes hat?
- Ti kes nehat?

Wek cînavê serbixwe ew dikare bi pirhejmarî biçeme jî:

- Ez tiyan (ti tiştan/kesan) nabînim.

Çemandina yekhejmarî jî xaseten di kurmanciya rojhilatî de bi varyanta “çu” mimkin e:

- Ez çu[y]ê nabînim. (ti kesekê/tişteke mê)
- Ez çu[y]î nabînim. (ti kesekî/tişteke nêr)
- Ez çu[y]a[n] nabînim. (ti tiştan)

Peyva “ti” û varyantên wê li gel çendîn navdêran hin peyvên nû ava dikin ku carinan bi hev ve lê bi piranî ji hev cuda tên nivîsîn:

- ti car, ticar
- ti der, tider
- ti kes, tikes
- ti gav, tigav

Bo sebebê tercihkirina nivîsîna ji hev cuda, li beşa li ser peyva “her” li jortir binêrin.

Hinan caran cînavê “ti” (û varyantên wî “tu, çu, çî” ji van peyvên pêkhatî dikevin lê dîsa jî ew heman maneya xwe ya peyva pêkhatî diparêzin:

- ti kes nehat → kes nehat (bi maneya “ti kes nehat, hîç kes nehat, qet kes nehat)

Tişt, tişte

Peyva “tişt” bi eslê xwe navdêr e lê ew herwiha wek cînav jî tê bikaranîn.

Hevreha peyva “tişt” di soranî de “şit”, bi farisî “çîz, çî” û bi zazakî jî “çî” ye. Bo guherîna Ç/T bidin ber cînavê nediyar “ti, tu, çu, çî” li jortir an jî peyvên “paçe/pate, qurç/qurt”. Bo guherîna “-işt” bi “-î” (kurmancî “tişt” û zazakî û farisiya devkî “çî”) bidin ber cînavê “gişt” û varyanta wî ya devokî “gî” li jortir.

Peyva “tişt” an “tişte” wek cînavê nediyar kurtkirina “ti tişt, ti tişte” e. Ew wek cînav adeten di hevokên neyînî de tê xebitandin:

- Tişt(ek) nekir (ti tişte kir)

Lê carinan di hevokên erênî, bi taybetî yên pirsyarkî de jî peyda dibe:

- Tişte heye? (Ma/gelo ti tişte heye?)

Wek cînavê serbixwe, peyva “kes” çembar e:

- Tiştî nabînim (ti tiştî nabînim)

Xirr, xirrek (xir, xirek)

Peyva “xirr” (xir) yan jî “xirrek” (xirek) wek cînavê nediyar bi maneya “hemû, hemî, gişt, tev, kull, bitûn” tê bikaranîn. Ew bi vê maneya xwe li hin deverên kurmançiya rojhilatî, bi taybetî li Dihokê li kar e. Li deverên din yên kurmançîaxiv ew bi vê maneyê nayê xebitandin lê wek navdêr bi wateya “endamê cinsî yê nêran” anku “kîr” tê emilandin.

Ji aliyê etîmolojî ve cînavê kurmançî “xirr” hevrehê “xirr” (berhev, li ser hev, komkirî) ya soranî ye. Bi esehî nayê zanîn lê mimkin e ku ew herwiha hevrehên “xeylî, xêlî” (pirr, gelek zehf) yên farisî û zazakî jî bin.

Wek cînavê serbixwe, “xirr” bi mêyîtî, nêrîtî û pirhejmarî diçeme:

- xirrê/xirrekê bîne (hemûyê bîne)
- xirran/xirrekan bibe (hemûyan bibe)

Ji aliyê dengnasî ve kîteya pêşî girankirî ye û “-ek” wek paşgireke çemandinê tê hesabandin (wek “gelek, piçek, hinek/hindek, kêmek) jî û nayê kirpandin/girankirin tevî ku ew bi xwe jî dikare paşgirên çemandinê wergire: xirr-ek-ê, xirr-ek-an.

Wek pêşdiyarker, cînavê “xirr, xirrek” bêyî ravek û çemandinê dikeve berî peyva raveber:

- xirr/xirrek kes → xirr/xirrek kesan (ne “*xirran kesan)

Zehf, zaf

Peyva “zehf” û varyantên wê “zahf, zaf, zav” bi maneya “pirr, gelek, mişe, zor, zêde” ye. Ew wek rengdêr, hoker û cînav di kurdî de tê xebitandin.

Eslê peyvê erebî ضافي (ḍaffî) ye. ض (ḍ) anku D-ya “qelew” ya erebî di kurdî de adeten dibe Z. Bo guherîna A bi EH, bidin ber “kanî → kehnî, karik → kehrik”. “Zehf, zaf” hevrehê peyva “îzafe” ye.

Peyva “zehf” an guhartoyeke wê (zahf, zaf, zav) bi berfirehî di hemû devokên kurmançî de û herwiha di zazakî de jî li kar e. Lê di soranî de nayê bikaranîn an jî bikaranîna wê kême.

Wek pêşdiyarker “zehf” û varyantên xwe bêyî ravek û çemandinê dikevin berî peyva raveber:

- zehf tişt → zehf tiştan (ne “*zehfan tiştan”)

Wek cînavê serbixwe, peyva “zehf” û varyantên wê pirhejmar diçemin jî:

- zehf dibêjin (gelek kes dibêjin) → zehfan got (gelek kesan got)

Zêde

Peyva “zêde” maneya “pirtir/gelektir ji ku hewce ye” dide lê bi berfirehbûnê dikare herwiha wateya “gelek, pir” bi xwe jî bide. “Zêde” ji erebî “ziyade” ye ku wek “ziyad” di soranî de jî tê bikaranîn. Li gor hevokê, “zêde” dikare rengdêr, hoker an jî cînav be.

Wek cînav ew dikare serbixwe were xebitandin an jî wek pêşdiyarker were emilandin:

- wek pêşdiyarker: Zêde kes hatin.
- wek cînavê serbixwe: Zêde hatin.

Wek pêşdiyarker ew bêyî çemandin û ravekê tê xebitandin:

- zêde kes → zêde kesan (ne “*zêdeyan kesan” yan “zêdeyên kesan”)

Di gotinên wek “zêdeyî min e” û varyanta wê “zêdeyê min e” de “-yê/-yî” ne ravek in lê daçek in û maneya “bo, jê re” dide: “zêdeyî min e = ji min re zêde ye”.

Wek cînavê serbixwe jî ew adeten nayê çemandin lê çemandina wî mimkin e:

- Zêdeyan got (zêde kesan got – adeten “yên zêde bîne”)

Di vê nimûneyê de jî “zêdeyan” êdî ne cînav lê rengdêrekî navdêrkirî (rengdêrekî bûyî navdêr) e.

Zor

Peyva “zor” bi eslê xwe navdêr e û maneya “tade, kotekî, şidet, hêz, quwet” dide. Ew peyveke îranî ye ku ketiye tirkî jî. Lê di soranî de ew ji navdêriyê vequlipiye rengdêrî, hokerî û cînaviyê û wateya “gelek, pirr, zehf, zêde” wergirtiye. Di van dehsalên dawiyê de ev bikaranîn ji soranî belavî nav kurmancî jî bûye:

- wek hoker: zor baş (gelek baş, pir baş)
- wek cînav: zor kes (gelek kes, pir kes)

Wek cînavekî pêşdiyarker ew bêyî ravek û çemandinê tê xebitandin:

- zor kes → zor kesan (ne “*zoran kesan” an “*zorê kesan”)

Wek cînavekî serbixwe jî ew zêdetir tenê xwerû û neçemandî tê bikaranîn:

- Zor hatin. (zor kes hatin)

Lê forma wê ya çemandî wek cînav yan nayê bikaranîn an jî bikaranîna wê pir nadir e:

- ?¹⁵ Zoran got. (Gelekan got. Zor kesan got.)

”Mêrik, lawik, peya, kabra, heval, yaro/yarû, zilam” û hwd.

Ev hemû peyv bi eslê xwe navdêr in. Lê ew dikarin bi awayekî giştîkirî wek cînav jî bîn bikaranîn bi maneya “ew” yan “filan kes”.

”Mêrik, heval, peya¹⁶, zelam/zilam” zêdetir di kurmancî de, “kabra” pirtir di soranî de û “yarû” jî bêtir di kurdiya başûrî de (li hin deveran wek “yaro” di soranî de jî) tên xebitandin. Eger kesa behbehs jin be, peyvên wek “jinik, hurmet, kulfet/kuflet” bi vê mebestê tên bikaranîn.

Kul(lî), cemî

Ev herdu cînav maneya “hemû, gişt, tev” didin. Ew ji erebî ne lê carinan di kurdî de jî tên xebitandin.

”Kul, kullî, kulî” bêyî ravek û cemî adeten bi ravekê ve dibin pêşdiyarker:

- kullî misilman (hemû misilman)
- cemîê misilman(an) anku hemû misilman

¹⁵ Li vê derê mebest ji nîşana pirsyarkî ? ew e ku bi eshî nayê zanîn ka ev awayê gotinê di zimanî de heye yan na.

¹⁶ Li vê derê mebest jê peyva “peya” ya bi P-ya bipif (req) û zirav e ku maneya “mêrik, zilam, , ne ”peya

Adeten ew tenê wek pêşdiyarker tên emilandin û bikaranîn wan wek cînavên serbixwe û çemandî tişteki nader e.

Bitûn

Peyva “bitûn, butûn, butun” maneya “hemû, gişt” dide. Ew ji tirkî “bütün” hatiye lê hem li Bakurê Kurdistanê di axiftina kurdan de belav bûye û hem jî heta gihiştîye derveyê Bakurê Kurdistanê jî. Bo nimûne, Fêrîkê Ûsiv ji devê lehengeki xwe wiha neqil dike:

"Em: ewledê ana Xezal ruh remetî
- Riza, Meyrem, Hemîd, Huso, Zeytûn, Zekî

Bîr û bitûn bi mal-nefer, bi kurr û qîz

Radimûsin destê xalê xwe yî ezîz..."¹⁷

"Bîr û bitûn" kurdîkirina "bir ve bütün" anku "yek [bi yek] û hemû" ya gotina tirkî ye.

"Bitûn" hem wek pêşdiyarker û hem jî wek cînavê serbixwe tê bikaranîn. Wek pêşdiyarker ew dikare li gel ravekê yan jî bêyî wê were istimalkirin:

- bitûn dinya dizane ku...
- bitûnê dinyayê dinyayê dizane ku...

Wek cînavê serbixwe ew adeten neçemandî tê xebitandin:

- Bitûn dibêjin. (hemû dibêjin)

Bikaranîna formên çemandî mimkin e lê nader e:

- Bitûnan wisa go[t]. (hemûyan wisa got.)

¹⁷ Binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2016/07/22/ferike-usiv-helbesten-bijare/> r. 318.

Gêndî

Cînavêkî din jî yê ji tirkî hatî "gêndî" maneya "xwe, bi xwe" dide. Ew ji tirkî "kendi" yan jî hê deqîqtir ji tirkîya devokî "gendi, gendü" hatiye ku maneya "xwe, bi xwe" dide. Ev cînav li gelek deverên kurmançiya rojavayî, bi piranî li Bakurê Kurdistanê lê herwiha bo nimûne li Rojavayê Kurdistanê jî li devera Efrînê li kar e.¹⁸

Cînavê "gêndî" jî di kurdî de wek hevwatera xwe ya xwemalî "xwe" ya kurmançî neçemandî tê bikaranîn.

4. CÎNAVÊN DÎROKÎ

Di hejmareke peyvên kurdî de şopa hin cînavên dîrokî anku tarîxî hene ku êdî wek cînavên serbixwe di kurdî de peyda nabin. Bo fehmkirina meseleyê kerem bikin em li van peyvan binêrin:

- îro, îsal, îşev
- hingê, hind, hindî, hingî

Cînavê pêşgir î-

Pêşgira î- di peyvên wek "îro, îsal, îşev" de bi zelaî maneya "ev" yan "vê" dide:

- îsal = ev sal; vê salê
- îro = ev roj; vê rojê
- îşev = ev şev; vê şevê

¹⁸ "Birano, peyva 'gêndî' weke we gotî ji 'kendi' ya tirkî hatiye û heta berî çel pênî salî li Efrînê kêmbû dîre ji aliya Tirkî hêdî hêdî belav bû û ket şûn cînava 'wî' de di hin deran de... — (Azad Ekkaş, ji Efrînê, di koma "Zimanê Kurdî" ya li ser Facebookê de, 1/2012) – Em jî gendî bi kar tînin. Ew gendi di tirkî de wekî kendi ye. — (Kesek bi bernavê Gundê Qaşan di heman komê de).

Ev cînavê dîrokî hevrehê “îm-“ ya soranî û “im-, êm-“ ya farisî ye û di soranî de cînavê serbixwe bi forma “em” (bi maneya “ev” ya kurmancî) û di farisî de jî bi şiklê “în” (dîsa bi wateya “ev” ya kurmancî) peyda dibe.

Di devokên kurmancî de “î-“ dikare ji bilî awayê xwe yê serdest û standard “î-“ herwiha bi şiklê “i-“ (kurmanciya rojhilatî) yan jî “hi-“ (kurmanciya rojavayî) be. Di kurmanciya rojhilatî de ew di peyva “iro, iroke” de heye ku varyanteke peyva “evro” (îro) ya di kurmanciya rojhilatî de serdest e. Di kurmanciya rojavayî de ew dîsa li gel peyva “ro(j)” bi şiklê “hiro” tê xebitandin. Lê bikaranîna heman cînavê pêşgir di peyvên din yên nimûne de di kurmanciya rojhilatî de peyda nabe anku mirov nabêje “*îsal, *îşev” lê “ev sale; vê salê” û “ev şeve; vê şevê”. Tenê di kurmanciya navendî û bakurî de bikaranîna pêşgira “î-“ li gel hejmareke peyvên demî (îro, îşev, îsal) mimkin e.

Cînavê pêşgir hi-

Ji peyvên “hingê” (wê demê) û “hind” (ewqas) diyar e ku pêşgira “hi-“ li şûna cînavê “ew, wê, wî” tê bikaranîn. Li şûna “hi-“, ew di hin devokan de di hin peyvên de ew dikare bi awayê “hî-“ be, bo nimûne di kurmanciya rojhilatî de di peyva “hîngê” (wê demê) de. Lê di heman devokan de dîsa jî peyva “hind” (ewqas) heye ku bi “hi-“ ye, ne bi “hî-“.

Dîsa peyva “hinde” heye ku maneya “evqas, bi qasî vî/vê” dide. Ji vê peyvê diyar dibe ku “hi-“ yan “hî-“ ne tenê bi maneya “ew, wê, wî” lê herwiha bi wateya “ev, vê, vî” ye jî.

Dîsa ji peyvên “hin-gê, hin-d, hin-de” diyar e ku mimkin e ku eslê peyvê ne “hi-“ lê “hin-“ yan “hîn-“ bû.

Di farisî de hevrehê wê “în” e. Bo zêdebûna H di kurdî de li destpêka peyvên, bidin ber kurmancî “hesp, hesin/asin, hêsan, hêsir” lê farisî “esb, asin, asan, esr”.

Anku mimkin e ku eslê peyvê maneya “ev” dabe û paşî wateya “ew” wergirtibe yan jî ji destpêkê ve peyveke cotwateyî be.

5. “JÊ, LÊ, PÊ, TÊ” WEK CÎNAV?

Di peyvên “jê” (ji wê/wî/wan), “lê” (li wê/wî/wan), “pê” (bi wê/wî/wan) û “tê” (di wê/wî/wan ... [de]) hem daçek (ji, li, bi, di) û hem jî cînav (wê, wî, wan) hene.

Di rêzimannivîsîna zazakî de gelek caran peyvên wiha wek cînav hatine qal- û qebûlkin. ¹⁹ Lê di rêzimannivîsîna kurmançî û soranî de hem ji aliyê kurdan ve û hem jî ji hêla zimannasên biyanî ve jî ev wek daçek hatine qebûlkin. Me jî berî niha li gel daçekan peyvên wiha rave kirine. Loma li vê derê em ê wan dubare nekin lê berê xwandevanên hêja bi ruxseta wan bidin wê vekolîna xwe.

6. PEYVRÊZIYA CÎNAVAN

Di komikên de cînav adeten berî navdêran tên:

- ew kes
- wê rojê
- çend caran
- her dem

Herwiha eger di komikê de rengdêr (û hoker) hebin, cînav berî wan jî tê:

- ew kesa qenc (cînav + navdêr + rengdêr)
- wê roja gelek xweş (cînav + navdêr + hoker + rengdêr)

Lê di doxa (halê) xwedîtiyê de cînav dikeve dikeve dûv navdêrê gava ku cînav xwedî (xudan) be:

- kitêba te
- birayê wî
- çîrokên wan

¹⁹ Bo nimûne Roşan Lezgîn di kitêba xwe “Gramera Kirdkî” ya bi kurmançî de û Selcan Zülfü jî di “Grammatik der Zaza-Sprache” (Rêzimana zimanê zazakî) ya bi almanî de peyvên wiha wek cînav didin nasîn.

Lê hînge jî cînav berî rengdêr û hokeran tê:

- birayê wî yê mezin (navdêr + cînav + ravek + rengdêr)
- kitêba te ya gelek kevn (navdêr + cînav + ravek + hoker + rengdêr)

Cînavê **din** û varyantên wî yên devokî *dî, di, dinê, dîtir, dîtirê* û herwiha hevwaterên wî yên soranî *dî, dîke, tir* û hevwatera wan ya zazakî *bîn* herdem li pey cînava raveber tî anku “din” û varyantên xwe paşdiyarker in:

- şeva din, hevalê din, bajarên din... (bidin ber “wê şevê, wî hevalî, wan bajarên)

Wek ku tê dîtîn, cînavê “din” bi alîkariya ravekan (-a, -ê, -ên) bi peyva berî xwe ve tê girêdan. Di peyva “cardin, cardî” (dîsa) de ravek (û paşgira nediyariyê “-ek” jî) nehatine bikaranîn an ji ber bikaranîna pirr ya peyvê, ravek û paşgira nediyariyê bo sivikirinê hatine avêtin.

Berevajî “din” û varyantên wê yên din yên kurdî-îranî, hevwatera wê ya ji tirkî wergirtî “başçe” ne paşdiyarker lê pêşdiyarker e anku ew dikeve berî peyva raveber:

- başçe tişt (“tiştên din” yan “tiştên din”)
- başçe kesek (kesekî/keseke din)

Hin cînav jî dikarin hem pêşdiyarker û hem jî paşdiyarker bin:

- hemû, gişt, tev, kul, cemî’, bitûn

Wek ku tê dîtîn, ew hemû hevwater ne. Wek pêşdiyarker û wek paşdiyarker jî ew eynî maneyê didin anku raguhostina cihê wan watera wan naguherîne.

- Hemû heval hatin – heval hemû hatin.
- Gişt dinya dinya – dinya gişt dizane.

Ew ne wek pêşdiyarker ew naçemin lê wek paşdiyarker dikarin biçemin:

- Hemû heval dibêjin → *hemû* hevalan got.
- Heval hemû dibêjin → hevalan *hemûyan* got.

7. PIRHEJMARKIRINA DUBARE YA CÎNAVAN

Li gor qeyd û bendên giştî yên kurmancî, navdêr di halê xwerû de bi yekhejmarî û pirhejmarî eynî ne. Bo nimûne, kerem bikin li van herdu hevokan binêrin:

- Heval dibêje.
- Heval dibêjin.

Em dizanin ku di hevoka jorîn (heval dibêje) de "heval" yekhejmar e anku kesek bi tenê ye lê di hevoka jêrîn (heval dibêjin) de pirhejmar e anku du yan zêdetir kes in lê ne tenê yek kes e. Lê peyva "heval" bi eynî şiklî ye, tenê peyvên "dibêje/dibêjin". Ji ber ku yekhejmarî yan pirhejmarî bi xwe ji lêkerê (dibêje/dibêjin) diyar e, ne hewce ye (û di kurdî de nabe) ku pirhejmarî li peyva "heval" jî were barkirin û diyarkirin.

Eger em vê nimûneyê wergerînin çend zimanên din, em ê bibînin ku di vê meselê de gelek ziman ji kurmancî cuda ne:

ziman	yekhejmar	pirhejmar
kurmancî	heval dibêje	dibêjin
inglîzî	the friend says	the friends say
fransî	l'ami dit	les amis disent
tirkî	arkadaş diyor	arkadaşlar diyor(lar)

Wek ku tê dîtin, kurmancî bi tenê cudahiyeke yekhejmarî û pirhejmarîyê ji hev ferq dike: "dibêje/dibêjin". Wek din peyva "heval" di herdu hevokan de eynî ye.

Di inglîzî de hejmara rêzimanî bi du cudahiyan tê kirin: di hevoka yekhejmar de "friend" heye û di ya pirhejmar de "friends" anku S li dawiyê ye. Herçi lêker e, ew, berevajî navdêrê, di yekhejmarîyê de S li dawiya wê heye lê di pirhejmarê de na. "The" ya ku di herdu hevokan de wek hev e, pirtika (article) diyariyê ye anku diyar dike ku tê zanîn ka mebest kîjan heval e yan kîjan heval in.

Eger em niha jî li hevokên fransî binêrin, em ê bibînin ku ti ji her sê peyvên du hevokan ne tam wek hev in: l'/les, ami/amis (heval), dit/disent (dibêje/dibêjin). "L'/les" hevwaterên "the" ya inglîzî ne anku pirtikên diyariyê ne.

Di tirkî de hevoka yekhejmar "o diyor" e lê hevoka pirhejmar dikare "arkadaşlar diyor" an jî onlar diyorlar" be. Di "arkadaşlar diyor" de cudahiya yekhejmarî û pirhejmariyê tenê bi peyva "arkadaş / arkadaşlar" e lê di hevoka "arkadaşlar diyorlar" da herdu pey bi paşgira "-lar" ji hevoka yekhejmar tên cudakirin. Çawa be jî, ya tirkî ji ya kurmançî cuda ye ji ber ku di tirkî de hevwatera peyva kurdî "heval" her diguhere lê hevwatera peyvên "dibêje/dibêjin" dikare biguhere yan jî eynî be.

Tiştê li vê derê ji me re giring ew e ku navdêr di halê xwerû de di kurmançî de li gor yekhejmarî û pirhejmariyê naguherin lê ferqkirina hejmara rêzimanî (yekhejmar an pirhejmar) bi lêkerê ye (di nimûneyên me dayî de "dibêje" û "dibêjin").

Ev ferqkirina hejmara rêzimanî di cînavan de jî bi awayekî berfireh wek di navdêran de ye. Piraniya cînavan di rewşa xwerû de li gor yekhejmar û pirhejmarê naguherin:

- ew dibêje – ew dibêjin
- bi xwe hat – bi xwe hatin

Lê wek ku me li pêştir di behskirina cudahiyan navbera navdêr û cînavan de kiriye, di hin cînavan de di halê xwerû de jî hejmara rêzimanî diyar dibe:

- yekhejmar: ez, tu
- pirhejmar: em, hûn

Berevajî "ez/min" û "tu/hûn", kurmançiya standard û di hevokan de jî bi piranî kurmançiya rojhilatî û ya navendî cînavê sêyem "ew" di halê xwerû de li gor hejmara rêzimanî naguherînin. Ferqkirin tenê bi lêkerê ye:

- ew hat – ew hatin

Lê di hemû devokên kurmançî de rewş ne wisa ye. Di hin devokan de (bi taybetî kurmançiya rojavayî û bakurî) hejmara rêzimanî hem bi lêkerê û hem jî bi cînavî tê diyarkirin, bi gotineke din, ew hejmara rêzimanî tê dubarekirin. Wek forma pirhejmar ya neçemandî ev devok cînavê "wan" yan "ewan" dixebitînin ku di kurmançiya rojhilatî û navendî de formên çemandî yên pirhejmar yên cînavê "ew" in.

Heman cudakirina dubare ya ferqa hejmarê rêzimanî di soranî, kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) û zazakî de jî heye:

zar ²⁰	yekhejmar	pirhejmar
kurmanciya rojhilatî, kurmanciya navendî û kurmanciya standard	ew hat	ew hatin
hin devokên kurmanciya rojawayî û kurmanciya bakurî	ew hat	wan hatin, ewan hatin
soranî	ew hat	ewan hatin
kurdiya başûrî	ew yat	ewane yatin
zazakî	o ame ²¹	ê ameyî

Hin devokên kurmancî – bi taybetî yên rojavayî û bakurî – ne tenê cînavê pirhejmar yê çemandî (wan, ewan, wa) gelek caran li cihê forma neçemandî (ew) dixebitînin lê heman cînavî bi duçarî jî pirhejmar dikin:

- ew → ewan, ewan, wa → ewana[n], wana[n]

Ew heta van formên dubare pirhejmarkirî û çemandî jî carinan li cihê forma neçemandî ya pirhejmar ya kurmanciya rojhilatî û navendî û zimanê nivîskî diemilînin:

- rojhilatî, navendî, standard: ew hatin
- rojavayî, bakurî: wan hatin, ewan hatin, wana hatin, ewana hatin

Heman tişt li cînavê destnîşankirinê "ev" jî tê kirin:

²⁰ Ji bilî kurmancî, ji zarên din (soranî, başûrî, zazakî) ji her yekê tenê nimûneyek hatiye dan daku diyar bibe ka mesele di wan lehceyan de çawa ye. Bo dirêjnekirina meseleyê, me varyantên devokî ji wan lehceyan nedane.

²¹ "O ame" forma nêr e. Forma mê "a ameye" ye. Berevajî kurmancî, zazakî di halê xwerû de jî navdêr û cînavê sêyem bi cînsê wan yê rêzimanî jî ji hev cuda dike.

lehce	yekhejmar	pirhejmar
kurmanciya rojhilatî, kurmanciya navendî û kurmanciya standard	ev(e) ²² hat	ev(e) hatin
hin devokên kurmanciya rojawayî û kurmanciya bakurî	va ²³ hat	van hatin, evan hatin, vana hatin, evana hatin
soranî	eme hat	emane hatin
kurdiya başûrî	(e)ye yat	yane yatin
zazakî	no ame	nê ameyî

8. AVÊTINA CÎNAVAN

Di gelek rewş û haletan de di hevokên kurdî de bikaranîna cînavan tiştêkî ixtiyarî anku dilxwazî ye. Bi gotineke din: bikaranîna cînavan di her hevokê de ne zerûrî ye, bêyî cînavan jî di hin rewşan de diyar e ka mebest kîjan cînav e.

Kerem bikin em li çend nimûneyan binêrin:

- Ez hatim.
- Tu çi dibêjî?
- Ew ne kurd e.

Ji van hevokan em bi xêra "ez, tu, ew" dizanin ka mebest jê kî ye. Lê dîsa jî em dikarin cînavan ji van hevokan biavêjin:

- Hatim.
- Çi dibêjî.

²² "Eve" forma kurmanciya rojhilatî ye.

²³ "Va" li vê derê kurtkirina "eva han" e.

- Ne kurd e.

Dîsa jî em fehm dikin ku kesê hat "ez" im, kesê dibêje "tu" yî û kesa/kesê ne kurd jî "ew" e.

Sebebê imkana avêtina an jêxistina cînavan ew e ku di nimûneyên me dayî de ne tenê cînav lê herwiha paşgirên kesî yên lêkeran jî diyar dikin ka mebest jê kîjan cînav e:

- hatim (= ez)
- dibêjî (= tu)
- ne kurd e (= ew)

Lê avêtina cînavan herdem ne mimkin e. Kerem bikin em li çend nimûneyan binêrin:

- min got
- te got
- wî got
- me got
- we got
- wan got

Ji ber ku peyva "got" bi tenê diyar nake ka kê got, ne mimkin e ku mirov ji hevoka "min got" cînavê "min" biavêje û dîsa peyva "got" bi maneya "min got" fehm bike. Loma kesê tiştek gotî eger "min, tu, me, we" be, hingê bikaranîna cînavî di vê haletê de zerûrî ye:

Lê dîsa jî peyva "got" dikare bi tenê bêyî cînavên "wê/wî/wan" were bikaranîn û bi maneya cînavê sêyem were fehmkirin. Anku mimkin e mirov "wî got" yan "wê got" yan jî "wan got" kurt bike û tenê bibêje "got".

Bi gotineke din, eger ti paşgirên kesî bi lêkerên gerguhêz (transîtîv) yên di dema borî de ve tine bin, ew wisa tê fehmkirin ku biker anku kesê tiştek kiriye "wê, wî, wan" in:

- xwar (wê/wî/wan xwar – kesek yan çend kes, jin an mêr)

Eger ti paşgirên bi lêkerên negerguhêz (intransîtîv) ve tine be, hin biker wek kesê sêyem yê yekhejmar tê fehmkirin:

- hat = ew hat (kesek bi tenê – jin an mêr)

Di rastiye de ji hevoka "min got", "te got", "wî got" ... ji xwe cînavê "ew" hatiye avêtin:

- min got = min ew (tişt) got

Anku peyva "got" dibe bedelî "wî ew (tişt) got" yan "wê ew (tişt) got" yan "wan ew (tişt) got".

Di kurmanciya navendî de û herwiha bi piranî di kurmanciya nivîskî de jî paşgirên kesî yê cînavên pirhejmar wek hev in:

- em **hatin**
- hûn **hatin**
- ew **hatin**

Ji ber vê, avêtina cînavên "em" û "hûn" ne mimkin e anku ne mimkin e mirov li cihê "em hatin" tenê bibêje "hatin" û ev dîsa wek "em hatin" were fehmkirin (bidin ber "ez hatim → hatim" ku dîsa jî tê fehmkirin ku kesê tê ez im). Di rewşên wiha de tenê "ew hatin" dikare bibe "hatin" û dîsa wek "ew hatin" were têgihîştin.

Di kurmanciya rojhilatî de û herwiha di soranî de jî paşgirê yê cînavê "em" ne wek yê cînavên "hûn" û "ew" ya pirhejmar "-in, -n" e lê "-în, yn" e:

kurmanciya navendî	kurmanciya rojhilatî	soranî
em <i>hatin</i>	em hatîn	ême hatîn
hûn <i>hatin</i>	hûn <i>hatin</i>	êwe <i>hatin</i>
ew <i>hatin</i>	ew <i>hatin</i>	ewan <i>hatin</i>

Ji ber vê, di kurmanciya navendî de ne mimkin e ku mirov "hatin" tenê bi wateya "em hatin" yan "hûn hatin" bixebitîne. Lê di kurmanciya rojhilatî de û di soranî de "hatîn" bi "-în" (ne bi "-in") li gel cînavê "em" tê bikaranîn, mimkin e û diyardeyeke berbelav e jî ku gotina "hatîn" bêyî cînavê "em" jî tê emilandin û dîsa jî bi wateya "em hatin" tê fehmkirin.

Carinan gava ku werger ji soranî tê kirin, di zêdekirina cînavê "em" ku di kurmancî de zerûrî û di soranî de gelek caran ixtiyarî ye, tê jibîrkirin, loma hin kêmasiyên wiha derdikevin:

- "Nêçîrvan Barzanî: Bi serkeftina îradeya gelê Tirkiyê dilxweş in."²⁴

²⁴ <http://rudaw.net/kurmanci/kurdistan/160720162>

Lê ji vê hevokê bi kurmancî wisa tê fehmkirin ku N. Barzanî gotibe ku hin kesên din dilxweş (kêfxweş) in lê di orijînalê hevokê ya soranî de li cihê "in" ya dawîya hevoka kurmancî "în" heye ku maneya "em ... in" dide anku N. Barzanî gotiye "em bi... dilxweş in" lê ji hevoka kurmancî wisa tê fehmkirin ku wî gotibe "ew bi ... dilxweş in".

Lê di kurmanciya rojhilatî û di soranî de jî mirov nikare "hûn hatin" (bi soranî "êwe hatin") tenê wek "hatin" bi kar bîne. Di wan devok û lehceyan de jî "hatin" bêyî cînav dîsa maneya "ew hatin" tê fehmkirin.

9. KURTKIRINA CÎNAVAN

Diyardeyeke giştî ya kurdî û hemû zimanan e ku peyvên pir tînan bikaranîn meyla kurtbûnê heye anku ber bi kurtbûnê ve ne. Ji ber ku cînav – bi taybetî cînavên kesî – pir tînan bikaranîn, ew kurt dibin.

Ez → e

Cînavê "ez" di axiftinê de di hin rewşan de Z-ya xwe diavêje yan jî wê bi dengê peyva pey xwe ve dihelîne:

- ez jî → ejî
- ez nizamim → e'nizam

Min → mi, -m

Cînavê "min" hem di kurmancî û hem jî di zarên din yên kurdî de di axiftinê dibe "mi":

- Min got → mi go
- Mi dît → mi dî

Cînavê "min" wek paşdiyarker (li pey raveberê) jî hin caran kurt dibe û tenê 'm jê dimîne:

- cana min → cana'm

Tu → ti, t'

Cînavê "tu" gelek caran di piraniya devokên kurmançî de û li hin deveran jî herdem bûye "ti" ku formeke ji eslê xwe "tu" kurttir e:

- Tu çi dibêjî? → Ti çi dibê?

Di axiftina kurmançiya navendî de "tu" gelek caran herwiha bi lêkera alîkar ya dema bê "ê" (dê, wê, yê) ve dihele û bi hev ve dibin "tê":

- Tê çi bikî? (Tu ê çi bikî? Tu dê çi bikî?)

Ewê, ewî, ewan → wê, wî wan

Di kurmançiya nivîskî de û herwiha di piraniya devokên kurmançî de jî niha formên cînavê "ew" yên serdest yên çemandî "wê" (mê), "wî" (nêr) û "wan" (pirhejmar) in.

Lê eslê wan "ewê, ewî, ewan" bû û "e" ji destpêka hemûyan ketiye:

- ew+ê → ewê (bidin ber "kitêb+ê" → "kitêbê") → wê
- ew+î → ewî (bidin ber "nan+î" → "nanî") → wî
- ew+an → ewan (bidin ber "kitêb+an" → "kitêban") → wan

Cudahiya formên kurtkirî yên "wê, wî, wan" li gel formên kurtkirî yên "ez, min, tu" ew e ku "wê, wî, wan" êdî di zimanê nivîskî de jî bûne standard û "ewê, ewî, ewan" pir kêm di kurmançiya devkî yan nivîskî de tên bikaranîn.

Em, me

Di hemû devokên kurmançî de tek forma neçemandî ya cînavê yekem yê pirhejmar "em" û forma çemandî jî "me" ye. Bi gotineke din, mirov ti kurtbûn an guherînê di di vî cînavê ji xwe kin de nabîne.

Lê eger mirov "em, me" bide ber hevwateriyên wî yên soranî "ême, -man", mirov dikare bibîne ku kurtbûneke dîrokî di van de jî di kurmançî de peyda bûye.

Hûn, we

Forma çemandî ji cînavê duyem yê pirhejmar di kurmançiya nivîskî de û herwiha di piraniya devokên kurmançî de "we" ye ku ji xwe kurt e û mirov wê êdî kurttir nake. Lê ew di kurmançiya rojhilatî de "hewe" ye û di soranî de jî "êwe" ye. Bi vê mirov dikare bibîne ku kurtbûneke dîrokî di "we" ya niha di kurmançî de serdest çêbûye û vê forma kurtkirî di piraniya devokên kurmançî de ser ji formên din standiyê û wek tek alternatîv maye.

Forma neçemandî ya cînavê duyem yê pirhejmar di kurmançî de li gor devokan pir diguhere. Forma standard û serdest "hûn" e lê herwiha formên wek "hun, win, hûn, hîn, hingo" û belkî hin varyantên din jî hebin. Pir kêm be jî, forma "win" hinekî ji formên din kurttir e anku mirov di vê de jî kurtkirinê hest dike.

10. DUBAREKIRINA CÎNAVAN

Carinan heman cînav di eynî hevokê de tê dubarekirin. Dubarekirina dikare bi mebesta xurtkirinê: bi merema diyarkirina ku kesekî tiştê bi xwe kiriye, ti kesekî din ew tişt kiriye. Bo nimûne:

- Ez ê bikim, ez. (ne ti kesekî din ji bilî min)
- bi xwe xwe şûşt (ne bi destê ti kesekî din)

Wek ku tê dîtin, mebest jê giringîdana bi bikerî ye. Dubarekirin di piraniya haletan de ne zerûrî ye. Loma mirov dikare nimûneyên li jor wiha jî binivîse:

- Ez ê bikim.
- Xwe kuşt.

Ev jî eynî wateyê didim lê ne wek nimûneyên pêştir xurt in.

Carinan jî dubarebûna cînavê ji neçarî ye. Bo nimûne:

- Birayê min dê min bibe bajêr.

Mirov nikare yek ji van herdu "min"an biavêje bêyî ku wateya wê biguhere.

- "Birayê min dê bibe bajêr" wê maneyê nade ku yê were birin "ez" im.

- "Bira dê min bibe bajêr" wê maneyê nade ku yê min bibe birayê min e.

Bi taybetî jî bikaranîna cînavê "ew" û formên wî yên çemandî di heman hevokê de diyardeyeke berbelav e. Gava ku ew tê dubarekirin, adeten mebest jê du kesên ji hev cuda ne:

- Ew wê nas dike. (Ehmed Eyšê nas dike.)
- Wan ew dît. (Ehmedî û Hesenî Fatê dît.)

11. KIRPANDINA CÎNAVAN

Mebest ji "kirp" an "kirpandin"ê (bi inglîzî "stress") girankirin, şidandin an dirêjkirina kîteyeke (heceyeke) peyvê ye.

Piraniya cînavên kurmançî ji xwe yekkîteyî ne û ew kîte bi zerûrî kirpandî anku girankirî ye. Hin formên devokî de û herwiha hin cînavên lehceyên din yên kurdî dukîteyî ne û hingê kîteya dawiyê kirpandî ye:

- ji devokên kurmançî: ewê (wê), ewî (wî), ewan, hewe, hingo
- nimûne ji soranî: ême (em), êwe (hûn), ewan
- nimûne ji zazakî: şîma (hûn, we), înan (wan), aye (wê)

Eger ravek an lêker alîkar ya dema bê "ê" li pey hebe, hingê adeten ew bi dengnasî wek beşek ji cînavê tê hesabandin, cînav dibe dukîteyî kirp dikeve ser beşa dawiyê:

- adeten: "ez ê biçim"
- "ew a reben"
- birayê min ê mezin

Lê eger mirov bixwaze bi taybetî giringiyê bide wî kesî û bibêje ku mexsed illeh ew e û ne ti kesê din e, hingê kirp li ser cînavî bi xwe dimîne û ravek yan lêkera alîkar nayên kirpandin:

- "ez ê biçim" (ez, ne ti kesî din)
- ewa reben (ew, ne ti kesî din)
- birayê min ê mezin (birayê min, ne birayê kesekî din)

12. RASTNIVÎSÎNA CÎNAVAN

Di meseleya rastnivîsîna cînavan de du mijar hene:

- Cînav bi xwe çawa anku bi çi herfan tên nivîsîn?
- Kengî cînav ji peyv û peyvikên pey xwe cuda tên nivîsîn û kengî jî bi wan ve tên zeliqandin?

12.1. Rastnivîsîna cînavan bi xwe

Ji piraniya cînavên kurmançî du yan zêdetir varyant û guharto hene. Li vê derê em ê diyar bikin ka kîjan forma her cînavê kesî serdest û standard e (li gor nivîsên kurmançî – ne li gor qenaeta şexsî ya vekolerê vê mijarê). Pêşî em ê formên neçemandî (netewandî, xwerû) pêşkêş bikin.

cînav (neçemandî)	standard, serdest	formên din
kesê yekem yê yekhejmar	ez	e, wez, es
kesê duyem yê yekhejmar	tu	ti, tû, t'
kesê sêyem yê yekhejmar	ew	-
kesê yekem yê pirhejmar	em	-
kesê duyem yê pirhejmar	hûn	hon, hun, hûn, hwîn, hîn, hingo, win, wun
kesê sêyem yê pirhejmar	ew	ewan, ewana, ewanan, wana, wa

Formên çemandî (tewandî, oblîk) jî wiha ne:

cînav (çemandî)	standard, serdest	formên din
kesê yekem yê yekhejmar	min	mi, 'm
kesê duyem yê yekhejmar	te	-
kesê sêyem yê nêr	wî	ewî
kesa sêyem ya mê	wê	ewê
kesê yekem yê pirhejmar	me	-

kesê duyem yê pirhejmar	we	hewe
kesê sêyem yê pirhejmar	wan	ewan, ewana, ewanan, wana, wa

Ne tenê di cînavên kesî de lê di yên din de jî varyantên nivîsînê hene. Bi taybetî cînavê lêveger "xwe", cînavê beramberiyê "hev" û cînavê nîşandanê "han" xwedî çendîn varyant in. Di kurmancî de rewşa wan wiha ye:

cînav	standard, serdest	varyantên din
cînavê lêveger	xwe	xo, xu, xwi, xe, xa, xwu
cînavê beramberiyê	hev	hevdu, hevdi, hevûdu, hevûdin, yekûdu, yekdî, êkûdu, êkdu
cînavê nîşandanê	han	ha, hanê, he, henê

20.2. Bi hev ve yan ji hev cuda?

Yek ji lihevnekirinên serekî yên rastnivîsîna kurdî li ser wê ye ka kengî bi peyvikên erkî (*function word*) yên pey xwe ve bînin nivîsîn û kengî jî ji wan werin veqetandin:

- "ew kitêba min e" yan "ew kitêba mine"?
- "ez ê biçim" yan "ezê biçim"?
- "ewa han" yan "ew a han"?
- "dayika xwe ya pîr" yan "dayika xweya pîr"
- "hevalên hev ên qenc" yan "hevalên hevên qenc"?
- "ezî/ezê reben" yan "ez î reben / ez ê reben"?
- "birayê te yê biçûk" yan "birayê teyê biçûk"?
- "mala wan a berê" yan "mala wana berê"?

Cînavên pašdiyarker jê cuda

Cînavên kurmancî û zazakî ji peyva berî xwe cuda tên nivîsîn:

- kitêba min (ne ”*kitêbamin”)
- birayê te (ne ”*birayête)

Ev berevajî soranî, kurdiya başûrî, farisî, tirkî û erebî ye ku cînavên pêvekirî yan paşgirên cînavî hene (hemû bi maneya ”serê te”):

- soranî: ser-it
- kurdiya başûrî: ser-id
- farisî: ser-it
- erebî: reis-ek
- tirkî: kafa-n

Di kurmancî de qeyda giştî ew e ku cînav bi peyva berî xwe ve nayên zeliqandin lê hin awarte û istisnayên giring û hinên kêmtir giring jî hene.

Istisnayên giring kurtkirin û zeliqandina cînavên ”wê, wî, wan” bi daçekên bingehîn ”bi, di, ji, li” ve ye:

- bi wê, bi wî, bi wan → pê
- di wê, di wî, di wan (de) → tê (de)
- ji wê, ji wî, ji wan → jê
- li wê, li wî, li wan → lê

Herwiha istisnayeke giring jî pêvekirina cînavên ”wê, wî, wan” bi şiklê ”-î” bi dawiya hin navdêran ve:

- serê wî/wê/wan → serî: derbeyek li serî da (li serê wê/wî)

Istisnayeke nadirtir û zêdetir devkî û helbestkî kurtkirin û girêdana cînavê ”min” bi peyva berî wê ve ye:

- cana min → canam

Lê cînavên kurtnekirî herdem divê ji peyva berî xwe cuda werin nivîsîn:

- bi te, ji min, li wan, bi xwe, ji xwe, ji wê re, bi te re, li gel wan
- serê min, serê te, serê wê, serê wî, serê me, serê we, serê wan

Kopula herdem jê cuda

Kopula anku formên dema niha yên lêkera "bûn"ê peyvên serbixwe ne û ji hemû peyvên berî xwe cuda tên nivîsîn:

- "Ew kitêbek e" rast e, ne "ew kitêbeke" (bidin ber "ew kitêbek bû", ne "ew kitêbekbû")
- "Ew kitêba min e" rast e, ne "ew kitêba mine" /bidin ber "ew kitêba min bû", ne "ew kitêba min bû")

Peyvikên li dûv cînavên çemandî jê cuda

Eger cînav di halê çemandî de be, hingê peyvikên pey wî pê ve nayên girêdan:

- birayê *te yê* mezin (ne "*birayê *teyê* mezin", bidin ber "birayê Hesenî yê mezin", ne "birayê Hesenîyê mezin")
- du hevalên *min (y)ên* baş (ne "du hevalên *minên* baş, bidin ber "du hevalên Fatê yên baş", ne "xwişka Fatêya baş")
- xwişka *wî ya* mezin (ne "xwişka *wîya/wiya* mezin", bidin ber "xwişka Azadî ya baş", ne "xwişka Azadîya baş")

Eger formên çemandî û neçemandî yên cînavî eynî bin, hingê dîsa cînav ji peyvika pey xwe cuda tê nivîsîn eger cînavên xwedî du formên cuda yên çemandî û neçemandî di eynî rewşê de ji peyvika pey xwe cuda werin nivîsîn:

- hevalên *hev (y)ên* baş (ne "hevalên *hevên* baş" – bidin ber "hevalên min ên baş", ne "hevalên minên baş")
- birayê xwe *yê* mezin (ne "birayê *xweyê* mezin" – bidin ber "birayê *te yê* mezin", ne "birayê *teyê* mezin")

Lêkera alîkar "ê" ya dema bê jê cuda

Dema bê di kurmancî de bi lêkereke alîkar tê çêkirin ku forma wê ya kurtkirî "ê" ye, wek din li gor devokan dikare "dê", "wê" yan "yê" be:

- tu ê bikî
- tu dê bikî
- tu wê bikî
- tu yê bikî

Gava ku formên "dê" û "wê" tên bikaranîn, piraniya nivîserên kurmancî ti pirsgirêk di rastnivîsînê de nabe: ew vê peyvîkê ji cînavê berî wê cuda dinivîsin:

- tu dê bikî (ne "*tudê bikî")
- tu wê bikî (ne "*tuwê bikî")

Lê gava ku forma "ê" yan "yê" tê xebitandin, hin kes wê bi ji cînavê berî wê cuda dinivîsin û hin jî pê ve dizeliqînin:

- ez ê bikim, tu yê bikî
- ezê bikim, tuyê bikî

Lê lêkera alîkar ya dema bê (ê, dê, wê, yê) peyveke serbixwe ye û divê ji cînavê berî xwe cuda were nivîsîn:

- ez ê bikim (wek "ez dê bikim, ez wê bikim", ne "*ezdê bikim, *ezwê bikim")
- tu (y)ê bikî (wek "tu dê bikî, tu wê bikî", ne "*tudê bikî, *tuwê bikî")

Ravek bi cînavên neçemandî ve

Di kurmancî de ravek (izafe) bi navdêrên neçemandî ve tên nivîsîn:

- keça kurd, kurê kurd, gelê kurd
- jina reben, mêrê reben, mirovên reben
- hevala hêja, hevalê hêja, hevalên hêja

Bi heman awayî ravek bi cînavên neçemandî ve jî tên zeliqandin:

- ewa kurd, ewê kurd
- eza reben (jin), ezê/ezî reben (mêr), emên reben (pirhejmar)
- tuyê hêja, hûnên hêja

www.arxivakurdî.org

FERHENGEKE PEYVÊN HIQÛQÎ



Ferhenga *Türkçe-Kürtçe Hukuk Sözlüğü* (Ferhenga hiqûqî ya tirkî-kurdî) ferhengeke peyvên dadnasî/hiqûqî ya bi qebareyeke biçûk û 175 rûpelî ye. Ferheng yekhêlî ye: peyvên tirkî di ferhengê de hatine rêzkirin û ew li kurdî (kurmançî) hatine wergerandin lê li gor rêzbandiya kurdî peyv nehatine rêzkirin û ew li tirkî nehatine wergerandin. Ferheng sala 2014 di nav weşanên Belge de derketiye.

Li ser cildê pêşîn û herwiha di rûpelên ewilî de navê parêzer **Hüseyin Özdemir** wek amadekar (hazırlanan) hatiye diyarkirin. Lê di ferhengê de keda 3 kesan heye ku ji bilî Özdemir herwiha du kesên yek bi bernavê **Keremo** û yê din jî bi bernavê **Miraz Ronî** ne.

Her yekê ji wan kurtepêşgotinek ji ferhengê re nivîsiye (Özdemir û Ronî bi tirkî, Keremo bi kurdî). Lê dîsa jî ne bi tamamî zelal e ka kê ji wan çi karê vê ferhengê kiriye.

Rola Miraz Ronî (ku navê nivîskariyê yê kesekî bi navê **Mulazim Özcan** e) hinekî ji ya herduyên din çêtir aşkere ye: ew bi karê redaksiyon û verastkirinê rabûye û wisa dixuye ku piştî amadekariya ferhengê ew pê de çûye û ew verast kiriye. Ronî berê jî çend kitêb bi kurdî nivîsîne û bi taybetî jî ji tirkî li kurdî wergerandine. Ne zêde meşhûr be jî, ew di nav kurdînivîsan de tê dîtin.²⁵

Lê parvekirina xebatê ya vê ferhengê di navbera parêzer Hüseyin Özdemir û "Keremo" de ne diyar e. Hüseyin Özdemir wek parêzer û herwiha wek siyasetvan (niha di nav HAK-PARê de) tê nasîn lê

²⁵ Bo hevpeyivînekê li gel Miraz Ronî mirov temaşeyî vê bernameyê bike:

<https://www.youtube.com/watch?v=1pMuJkB11IQ>

haya me ji berhemên wî yên bi kurdî nîne û me li dû lêgerîn û pirsînê jî nedît ku wî heta niha li derveyî vê ferhengê tişteki din bi kurdî nivîsibe.

Herçi Keremo ye, ew bernavê kesekî bi navê **Kerem Tekoğlu** ye ku ji nivîskar yan zimannasiyê zêdetir wek dengbêj û helbestxwîn tê nasîn.²⁶ Hem Özdemir û hem jî Keremo itiraf dikin ku ne şarezayên zimanî û ne jî yên ferhengسازیê ne.

Wisa dixuye ku ferheng zêdetir li ser daxwaz û insiyatîva Özdemir ve hatiye amadekirin lê wergerandina wê li kurdî di pratîkê de ji aliyê Keremo ve hatiye kirin û ji hêla Miraz Ronî ve jî hatiye verastkirin.²⁷

Ev ne yekem ferhenga hiqûqî ya kurdî ye. Ya yekem bi kurdî (soranî), erebî, inglîzî û fransî ji aliyê **Nûrî Talebanî** ve hatiye amadekirin.²⁸ Yekem ferhenga hiqûqî bi kurmancî jî (peyvên dadnasî yên kurmancî li inglîzî hatine wergerandin) *Mafname* ye û ji hêla **Husein Muhammed** ve hatiye amadekirin û ev nêzîkî 15 sal in ku li ser Internetê peyda dibe.²⁹

Çawa be jî, bi vê ferhenga biçûk xebateke hêja hatiye destpêkirin. Li gel hin kêmasiyan, wateyên pîraniya peyvên baş hatine pêşkêşkirin û dikarin bi kêrî bikarînerên ferhengê bînin.

Özdemir di pêşgotina xwe de dibêje ev ferheng bi armanca wê hatiye amadekirin ku alîkariya parêzeran bike ku heq û hiqûq û wezîfeyên miwêkilên xwe (mîşteriyên xwe) bi zimanê wan baştir bi wan bidin fehmkirin daku heqê wan neyê xwarin û ji nezaniyê nekevin ber pîrsgirêkên qanûnî.

Helbet mimkin e ku ev ferheng wisa jî were bikaranîn lê ihtimala vê yekê kême e. Eger kesekî ku baş peyvên hiqûqî yên di tirkî de li kar (ku bi eslê xwe ji erebî), bo nimûne "emir, emniyet, hakim, mahkeme, kanun, zarar", ne mihtemel e ku ew çêtir peyvên ferhengên yên "kurdiya akademîk" yên wek "ferman, ewlehî, dadgêr, dadgeh, zagon" (ew jî bi eslê xwe bi piranî ji zimanên din hatine kurdî) fehm bikin.

²⁶ Binêrin: <https://www.youtube.com/channel/UCLB0vO7N1qGj9FkflEeyFg>

²⁷ Özdemir û Keremo di hevpeyivîneke xwe de paşî vê bi zelalî jî dibêjin: <http://www.ozgur-gundem.com/haber/106387/anadilde-savunma-icin-sozluk>

²⁸ Bo pêşgotina ferhenga Nûrî Talebanî bi inglîzî, binêrin: <http://www.kurdishacademy.org/?q=node/141>

²⁹ Binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/07/07/mafname-ferhenga-dadnasi-ya-kurdi-inglizi/>

Giringiya vê ferhengê di pileya pêşîn de ne ew e ku ew alîkariya kesên tirkînezan yan tirkîkêzman bike. Ew berî her tiştî dikare ji wergerandina ji tirkî bikin:

Kurdî hê li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê nebûye zimanekî resmî lê dîsa jî van salên dawiyê hem li bajarên Bakurê Kurdistanê ji aliyê belediyên di destê kurdan de û hem jî heta ji aliyê dewletê ve (bo nimûne di Ajansa Nûçeyan ya Anadolu de û di televizyona fermî TRT de) li ser gelek mijarên hiqûqî û qanûnî jî tê nivîsîn an jî – hê zêtir – nivîs ji tirkî li kurdî tên wergerandin. Kar û feydeya ferhengên wiha xaseten dikare di van wergeran de hebe.

ZIMAN Û ÇÎNÎ KOMELAYETÎ

Nûsînî: Profesor Peter Trudgill

Wergêranî: Hesênî Qazî

Eger miro inglîsiy ziman bê yan hêndêk sebare be komellekanî inglîsiy ziman bizanê, detuwanê tenê be pêy em belge zimaniyaney lêre da amajeyan pê dekeyn be texmîn pile û helkewtî komellayeti em axêweraney xuwarewe helda. Axêwerî A: I done it yesterday (emin dwênê ewim kird), axêwerî B: I did it yesterday, axêwerî A: He ain't got it (ew werî negirtuwe), axêwerî B: He hasn't got it, axêwerî A: It was her what said it (ewe ew bû gutî), axêwerî B: It was her that said it.

Eger miro gwêy lew axêwerane, gwêy lew şitane bê, be texmîn way dadenê ke, B pile û helkewtî komellayeti le A beriztir bê, û miro be dilniyayiyewe çakî boçuwe. Ewe çone ke ême detuwanîn ew core şitane le yek bikeynewe?

Wulamî ew pirsiyare le hebûnî şêwezare zimaniyekan daye ke êsta be lehcegelî çînî – komellayeti yan, le layen hêndêk nûserewe be sociolêkt nêwzed kirawin. Le nêwan qisekirdinî ew dû axêwerane da ciyawazî rêzimanî heye û ewe serepetêke bo dirkandin û derxistinî paşxanî komellayeti ewan. Her weha eweş delwê, egerçî ewe le ser laperey çapkiraw da nîşan nedrawe, ke ew ciyawaziyane hawkat ciyawazî fonêtîkî û dengsazîşyan le nêwan dabê- wate, rawêjgelî (accents) ciyawazî çênî – komellayetiş hen. Ciyawaziyekanî nawkoyî komelle însaniyekan le zimanekanyan da reng dedenewe. Deste ciyawaze komellayetiyeke şêwezari ciyawazî zimanî bekar dehênin û wekû endamanî be ezmûnî komellge zimaniyekan ême (û ew kese inglîsiyeke le bendî yekemî em kitêbeda) rahatûyn ke axêweran bew pêye polên bendî bikeyn.

Ciyawazeti komellayeti boçi ew karlêkeriyey le ser ziman heye? ême dekrê amaje be le ber yek ronani berewpêşçûnî ew şêwezare komellayetiyanê û berewpêşçûnî şêwezare herêmiyekan bikeyn: le herdûk nimûnan da berhelist û mewda beruwalet xo derdexen. Lehcenasan (dialectologists) dozîwyanetewe ke sinûrekanî lehcey herêmî zor car le tek berhelisti cugrafiyayî, yek degirnewe wekû çiya, zel û çom: bo nimûne, gişt axêweranî lehcegelî nerîti le nawçekanî Birîtanya le serûy çomî

Humber (le nêwan Lincolnshire û Yorkshire) da wûşey wekû House ('hoose' [hu:s]) hêştâ be monophthong* derdebirn, le katêkda ew axêweraney ke xelkî lay Başûrî ew çomen bo çendîn sed sallan coreyek diphtongî**wêney [haws] yan bekarhênawe, û le Dewlete Yekgirtuwekanî Emrîka sinûrî nêwan lehcekanî Bakûrî û Nêwerast (bo agadarî ziyatir biruwane bendî 8-î em kitêbe)le hêndêk nawçan hawterîbî çomî Ohio n. Her weha eweş rûn buwetewe ke herçendî mewday cugrafîyay nêwan dû lehcan ziyatir bê le rûy zimaniyewe ewendeş le yektirî dûr dekewnewe: bo nimûne, ew şêwezaraney inglîsiy Birîtanyayî ke le şêwey qisekirdinî London herî dûrin bêguman şêwezarekanî Bakûrî rojhelatî Scotland – Bujan in, û le Emrîkay Bakûrî ciyawazî here gewrey zimanî le nêwan şêwezare herêmiyekanî inglîsî da be berawurd kirdinî şêwey qisekirdinî Newfoundland û Mississippi be cuwanî derdekewê.

Berewpêşçûnî şêwezare komellayetiyeke renege bikrê be heman şêwe- wate berhelstî komellayeti û mewday komellayeti da şî bikirênewe. têwe hatin û wexokirdinî nêşane û xesletêkî zimanî bo nêw komellêk dekirê be hoy berhelste komellayetiyeke çênayeti, temen, regez, dîn yan hokargelî dîke berbest bikirê. û mewday komellayeti lewaneye herheyan core karlêkerî hebê ke mewday cugirafîyayî heyetî: bonimûne, tazeyetiyeke zimanî ke lenêw desteyekî hereberzî komellayeti dest pêdeka kartêkerî le nêw destey here nzmî komellayeti da î here duwayî ye, eger kartêkeriyekî ewtoy her hebê. (egel eweş da, ême debê wişiyar bîn, û gişt ew ciyawaziye komellayetiyaney zimanî tenê herbewşêwe tewaw mîkanîkiye şî nekeynewe, çunkû her wek le bendî yekemî em ktêbe da dîtman, boçûn û dîtin sebarete beziman be aşkirayî rolêkî girîng degêrê le parastin yan rewandinewey cêyawaziye lehceiyekanda.)

Lenêw hemû şêwekanî ciyawazeti komellayeti da, bo nimûne, ciyawazî çînayeti, temen, cîns, regez yan dîn, iême lem bende da debê le ser ew şêwe taybetiye le ciyawazeti komellayeti cext bikeynewe ke lenimûney axêweranî A uB da nîşaniman da _ wate tuwêjbendî komellayeti. twêjbendî komellayeti zaraweyeke bo amajebe kelekebendî destekane lekomel da dekardekirdrê betaybetî le ruwî destelat, serwet û dewlemendî û plewpayewe. le komelle pişesaziyeke rojawa da ewe şêwey tuwêjbendî çînekomellayetiyeke bexoyewe degirê, û debête hoy peydabûnî lehcegelî çînî komellayeti le ruwî zimaniyewe. (gişt pirsî çînî komellayeti le rastîda ta radeyek cencaliye, betaybetî le ber ewey ke komellnasan lemer tebî'etî rasteqîne, mana û nêwerok yan hebûnî çînekomellayetiyeke hawranîn. legel eweş, lêre da becê niye hewl bidrê bo rîzkirdin yan helsengandinî boçûnî ciyawaz ke sebarete bew babete lelayan têorîzananî komellnasewe hatûnete

gorê. her renga ewende bes bê hêmay pêbikayn ke begîştî çîne komellayetiyeke be koy ew takuterayaney dadendrên ke xesletî wekû yekî komellayetî û/iyan abûrîan heye. boçûnî giştî lemer çînî komellayetî le zorbey lêkolînewe zimaniyekanda le birgekanî xuarewe da derdekewin.)

Legell eweşda, twêjbendî çînî – komellayetî diyardeyekî cîhanî niye. Bo nimûne, le Hîndûstan, komellî nerîtî be kastî (çastes) ciyawaz dabeş buwe. Le ruwangey zimannasêkewe, lêkolînewe û şîkirdinewey lehcegelî kast ta radeyek le lehcegelî çînî komellayetî hasantire. Ewîş leber eweye kastekan be rêje pitewtir û xoragirtirn, be rûnî nêwyan lêndirawe, be tewawî le yektirî cwê kirawnetewe, ser be ewan bûn û endametî têtayanda mîratiye û deretanî zor kem heye bo dest berdan le kastêk û çûne naw û legel kewtinî kastêkî dîke.

(Diyar e ewe heta bilêyî sade kirdinewey ew çemke ye, mebestî serekî min lêre da eweye ke cext le ser ciyawazî nêwan kast û komelle çînayetiyeke bikemewe.) Le ber ew cwêkirdinewey aşkirayey xelik be destey taybetî û ciyawaz, ciyawazî lehceyî le nêw kastekan da be aşkirayî bederewen, û ciyawazî komellayetî de ziman da hêndêk car gewretir û ziyatirin le ciyawaziye herêmiyeke. Xiştay jimare 2 ew xalane nîşan deda lemer zimanî Kannanda, ke zimanêke le binemaley Diravîdiyayî Başûrî Hîndûstan ke xizmayetî legell zimanî Tamîl da heye. Ew xişte jimareyek lew şêwane nîşan deda ke le layen Birahmînekanewe bekar dehêndirên, ke beriztirîn kastin, û hawtakanyan le qisekirdinî kaste xuwarewetirekan, le dû şarî Bangalor û Dharwar nîşan deda, ke nizîkey 350 mîl (400 kîlomîtir) le yektirî dûr in.

Sê nimûney yekem nîşan deden ke, egerçî formekanî Bangalor û Dharwar bo kaste xuwarewetirekan wek yek wan, belam kastî Birahmîn formî ewtoy heye ke nek her ciyawazin le kastekanî dîke belkû lew dû şare da de nêw yektirîş da le yek ciyawaz in.

Xiştay 2. ciyawaziyeke herêmî û kast le zimanî Kannada.

Birahmîn şarî dharwar ' heye' eda şarî Bangalor ide, Dharwar ' lenêwê da' –olage, Bangalor –alli nawgirî çawg: Dharwar- likke, Bangalor-jk, nawgirî awelnawî kirdarî, Dharwar -j, Bangalor –j Dharwar, 'danîşe' küt-, Bangalor küt-, cênawî înkasî, Dharwar kj, Bangalor kj kastî xeyrî Birahmîn le şarî Dharwar ' heye' ayti, le şarî Bangalor ayti, Dharwar ' le nêwê da', - àga Bangalor –àga, nawgirî çawg: Dharwar –à, Bangalor –à, ' danîşe' Dharwar küt-, Bangalor küt- cênawî înkasî, Dharwar

kont-, Bangalor kont formekanî kastî beriztir zor le formekanî xuwarewetir nawçeyîtirin. (duwatir debînîn sebarete be şêwezare çîneyetiyekanî inglîsî ewe be pêçewane ye.)sê nimûney duwem nîşan deden ke le nêw deste komellayetiyeke da weyekçûn ziyatire ta deste cugrafiyayîyeke- mewday komellayetî zor ziyatir le mewday cugrafiyayî ciyawazî dexate nêw destekan.

Le komelle çîneyetiyekanî dinyay inglîsî zimanda barudoxî komellayetî zor legoranhatûtire, û her boyeş barudoxî zimanî zor aloztire, be lanî kemewe le hêndêk ruwewe. çuwarçêwey çîne komellayetiyeke be rûnî diyarî nakrê yan şeqlî hebûnêkî sinûrdiyarîkirawyan lê nadrê, belkû tenê wekû koyek le xelik dadendirên ke xesletî wekûyekî komellayetî û abûriyan heye; û wegerkewtinî komellayetiyan wek yeke - cûle bo serewe û xuwarewey hêrarşî komellayetî – be tewawî delwê û rûdeda. Ca ewane şitekan bo her zimannasêkî ke biyewê şêwezarekî taybetî şî bikatewe zor ziyatir diwartir deken- komelleyek herçendî corarwcor û çeşnawçeşin bê, têyda zimanîş her ewende coracor û çeşnawçeşne. Be sallanî dûr û dirêj helwêst û kardanewey zimannas le hember ew pêçelpêçî û aloziye be giştî nedîtin û çaw lê helbuwardin bû- eweş be dû şêwey ta radeyek ciyawaz.

Zor le zimannasan le lêkolînewekanî xoyanda cextyan le ser "idioleçt" dekird – wate şêwey qisekirdinî take kesêk le katêkda û be şêwazêk – ke eweş wa dadendira – (be giştî ewe zor rûdeda - biruwane laperey 29-î deqî inglîsî em kitêbe) zor be qa'îdetir bê le şêwey axaftinî komellgeyek le giştî xoyda. Le layekî dîkewe, lehcenasan (dialectologists), le lêkolînewey xoyanda cextyan dekird le ser şêwey qisekirdinî zaniyarîderanî derewey şaran û gundan, û betaybetî le şêwey qisekirdinî ew core xelkane wurd debûnewe ke xwêndewarî kemyan hebû û le gunde tak kewtûwekanda dejiyan, û zor be taybetîtir le waney ke zimannasî Kanadayî Jack Jambers nêwî nawe 'NORMS' - nêrîney besaldaçûy necûlî gundnişin – (none – mobile older rural males) (hoy ewey ewan piyawanyan le ber çaw girtuwe û nek jinan le bendî 3-î em kitêbeda rûn dekrêtewe). Helbet, tenanet gunde piçûkekanîş le rûy komellayetiyeke coracor û çeşnawçeşnin, belam le gundekan da çawhelbuwardin lew rastiye le şare gewrekan hasantir e.

Le gel eweşda, tenê becê ye bigutirê, ke dû şîkirdinewey zêdey dîkeş hen ke boçî lehcenasan bew şêweye cextyan le ser nawçe gundiyeke dekird. yekem, ewan pêyan xoş bû zor le nîşanekan û xesletekanî lehcey ber bas ke le halî awêlkedan da bû be belge ko bikenewe ber lewey ew core lehcanê be tewawî kip bin û nemênin. duwem, hestêk hebû ke le şwênêk le qisekirdinî xelkî besaldaçûtir da şarabuwewe, qise kirdinî xelkî nexwêndewar û perwerde nedîtû lehcey 'rastî' û '

resen û pak' bûn ke bere bere le ber karlêkerî şêwezarî standard şêwa bûn, belam lehcenasan deyantuwanî biyandoznewe û şiyar bikenewe eger ewan zîrek bûbayen. (ewe derkewt ke çemkî lehcey yekdestî ' resen û pak' îş ta radeyekî zor çemkêki efsaneyî ye:hemû layenî ziman dekewête ber kartêkerî ciyawazî şêwazî û komellayetî, çunkû hemû komellge însaniyekan le barî karkirdewe le astî corbecor da ciyawaz, corawcor û çeşnawçeşnin. Hemû şêwezarî zimanîş dekewne ber kartêkerî goran. Boye, tenanet le lehceyekî here tak kewtû û here xoparêzî gundîş da towêkî ciyawazîkerewe heye.) Le gel eweşda, lehcenasan bere bere boyan derkewt ke tenê be lêkolînewey qisekirdinî axêweranî besaldaçûtir, û nexwêndewar û perwerde nedîtû ewan wêneyekî natewaw û na durustî qise kirdinî nawçe ciyawazekanyan dest dekewê. (bo nimûne, belgekanî astekirdinî lêkdanewey lehce inglîsiyekan nîşan deden ke le gerek û dewerî sarî Surrey, ke le tenîşt xuwarûy London helkewtuwe, nawçeyeke lewê xelik /r/ î na ber le vokal le wuşey wekû yard û farm da telefûz deken (birwane laperey 149-î deqî inglîsî em kitêbe)le katêk da herkes çûbête Surrey dezanê ke ewe lay beşêkî zor le danîştûwanî ewê wa niye.)

Duwatir lehcenasan destyan kird bewey ke zanyarî komellayetî û her weha cugrafîyayîş le lêkdanewekanî karî xoyan le mer lehcekan ziyad ken. Bo nimûne, ew kesaney le ser etlesî zimanî le Dewlete Yekgirtuwekanî Emrîka û Kanada karyan kirduwe, ew karey ke le sallanî 1930 yekanî Sedey rabirdû da destî pêkird bû, zanyarîderekanî xoyan be ser sê deste da dabeş kird, ziyatir be pêy piley xwêndewarî û perwerdey ewan, û bew şêweye rehendêkî komellayetîşyan le zanyarî zimanî xoyan ziyad kird. Ewan her weha, ta radeyek be parêzewe, destyan kird be lêkolînewey qisekirdinî nawçe şariyekanîş. Legel eweşda, de rastîda ta duway kotayî hatinî şerî Duwemî Dinya girewey pêçû, ke zimannasan dest biken be têgeyîştin lew rastiyekey ke sinûrdarkirdinî lêkolînewekanyan be şêwey serekî be nawçe gundiyekeyan karêkî wa deka ewan sebarey be qisekirdinî zorbeyekî heraw le danîştûwan naagadar bin û le serî nezanin – wate şêwey qise kirdinî ewaney le şarekanda deşyan. komellêkî zor zanyarî zimanî ke hem serbexo çawrakêş bûn û be tuwanayekî benirx bûn bo tîorî zimanî le dest çûn. Leber ewe, nûsrawey wek şêwey qisekirdinî şarî New York û telefuzkirdinî inglîsî le sanfransîsko seriyan helda. legel eweşda, lêkolînewe le lehcey şarekan gîrugiriftêkî dîkey leber dem qut buwewe - ey dad û bêdad zimannasêk çon detuwanê ' şêwey qise kirdinî şarî New York' şî katewe- şarêk ke heşt mîlyon yan ziyatir danîştûy heye? ewe çend rast bû ke be girdibrî amaje be 'zimanî inglîsî le Sanfransîsko' bikrê le katêkda şîkirdinewe û lêkdaneweke tenê le ser binemay şêwey qisekirdinî jimareyekî kem le axêweran le nêw bedeyan hezar kes kirabû ke miro deytuwanî lêy

bikolêtewe - be gutinêkî dî, gelo rewa bû yan ewendey dehêna mêtodî nerîtî lêkolînewey lehçenasî gundiyaney bo lêkolînewey le lehce û şêwey axawtinî nawçe gewre şariyekan dekar bikirdirê? duwa car wulamî ew pirsiyare derkewt ' na' bê.

Ew lehçenasaney le lehce şariyekanyan dekolînewey û têgeyîştin nabê mêtodî kon bekar bihêndrê naçar man rêgeyek bibînnewe bo ewey, şêwey qisekirdinî şaroçke û şaregewrekan be tewawî û be durustî şî bikenewe û le wulamdanewe bew gîrugirfte da bû ke lehçenasî şariyane duwacar bû be zimaninasî komellayêtî. Le sallî 1966 zimannasî Emrîkayî William Labov kitêbî 'twêjbendî komellayêtî zimanî inglîsî le şarî New York' î bilaw kirdewe û akamekanî helsegandinêkî berbilawî şêwe qisekirdinî New Yorkî têda bû. Labov ew çawpêkewtinaney kirdibûnî hemûyanî le ser rêkordir aste kirdibû, ewîş nek her legel çend kesêk, belkû legell 340 kes. Leweş girîngtir, ew zanyarîderekanî xoy be rêgey dost û nasiyawan û pêwendî şexsî destbijêr nekirdibû (wek ewey pêşûtir dekra), belkû ew karey be rêgey nimûneyekî legotre ke zanstane gelale kirabû berêwe bird, bew manaye egerçî nedekira legell hemû kes çawpêkewtin bikrê, belam hemûkes derfetî yeksanî hebû ke bo çawpêkewtin destbijêr bikrê. Be bekarhênanî mêtodî komellnasane wek nimûne hênanewey legotre bo nêw zimannasî, Labov le wuzey da bû ewe pasaw bida ke şêwey qisekirdinî zanyarîderekanî berastîş nwênerayêtî şêwey qisekirdinî xelkî New York deken (yan belanî kemewe ew nawçe taybetiyey ke ew lêy kolînewey, wate berî xwarewey rojhelatî şareke). Leber ewey zanyarîderekanî nimûneyekî nwênerayêtî bûn, boyeş şîkirdinewey zimaniyeyê detuwandira bigutrê şîkirdineweyekî duruste sebarete be hemû ew şêwezaraney inglîsî ke le nawçeke qiseyan pêdekira. Labov her weha, core têknîkêkîşî pêşxist, ke duwatir tewawtir kira, bo derxistinî qisekirdinî asayî le xelik sereray le berdest dabûnî rêkordir (ewe berewpêşçûnêkî zor girîng bû ke ême le bendî 5-î em kitêbe da ziyatirî le ser deroyî.) Ew her weha hêndêk mêtodîşî dahêna bo pêwanî çendayêtî zanyarî zimanî, ke beşêkî le xuwarewe da bas dekeyn. Leweta ew pêşkewtine zor lêkolînewey dîke sebarete be lehce şariyekan, le zor şwênî diniya kirawin, her be pêy ew çuwarçêweyey ke Labov daynawe.

Ew mêtodaney Labov pêşî xistûn selmandûyane ke zor girîngin bo lêkolînewey le lehce û rawêjgeli çînî komellayêtî. Mêtodekanî lehçenasî nerîtî dekrê becê bin bo şîkirdinewey û baskirdinî lehcegelî kastekan(egerçî eweş qisey le sere, çunkû her takêk, egerçîş destbjêr kirabê, rêy têdeçê ciyawaziyekî hênde zorî legell destey kasteke be giştî nebê. Belam le lêkolînewey çînî komellayêtî da nakrê be destbjêrkirdinî axêweranî takutera ewan wek axêwerî gişt çîneke bijmêrdirên. Ewe pinktêkî girîng bû ke le layen Labovewey nîşan dira. şêwey qisekirdinî axêweranî takane (îdîolêktekanyan) lewaneyey

ta radeyekî berçaw le şêwey qisekirdinî ew kesaney wek ewanin ciyawaz bê, leweş ziyatir, le nêw xoyda, detuwanê zor naşêlgîrîş bê. şêwey qisekirdinî zor le xelkî New York be şêweyekî be tewawî le gotire û çawerwanekiraw derkewt ciyawaz bê. Car car ewan dengî /r/ yan le wuşey 'guard' da derdebirî û car car kiloryan dekird. Hêndêk car ewan 'beard' û 'bad' yan be heman şêwe derdebirî û car car be ciya telefuzyan dekirdin. Zimannasan le rûy nerîtiyewe nêwî ew core telefuzkirdinyan nawe ' coracorî azad'. Legel eweşda, Labov selmandî ke ew coracoriye azad niye. Be leber çawgirtinî pêşxanî komellgey zimanî le giştî xoyda, ew coracoriye le gotire nebû, belkû hokargelî derewey zimanî be şêweyekî tewaw çaweruwankiraw eweyan diyarî dekird. Wate, miro natuwanê le boneyek da pêşbînî bika ke takuterayan delên 'cah' yan 'car', belam dekrê nîşan bidrê ke, eger axêweran ser be çênêkî komellayetî, hawtemen, hawcîns bin, ewan şêweyek yan şêweyekî dîke be texmîn x le sed car be şêwey mamnawendî, le barudoxêkî leberçawgîraw da, bekar dehênin. îdîolêkt (şêwey qisekirdinî takekesî) lewaneye le gotire bê, belam şêwey qisekirdinî gomelge zimaniyeke tewaw çaweruwankiraw bû. Her çonêk bê, be rêgey ew core mêtodaney Labov bekarî hênan, gîrugiriftî nahawcînsî û nek wekûyekî komellge zimaniyekan, be lanî kemewe, ta radeyek yek la kirawetewe. êsta ême detuwanîn nîşane û xeslete zimaniyekan be durustî le çînî komellayetî girê deyn, û bew rêgeye da wêneyekî rûntir le ciyawazêtî lehcey komellayetî wedest bihênîn.

Ta ew cêyey ke degerêtewe ser zimanî inglîsî, le mêje zimannasan dezanin ke lehce û rawêje (dialects and accents) ciyawazekan pêwendiyar heye be paşxanî ciyawazî çînî komellayetiyewe. Le Birîtaniya, ême ta radeyek be şêweyekî sadekirawe, detuwanîn barudoxî êstekanê be şêwey xuwarewe şî bikeynewe. Lehce xo parêzkan, û, be taybetî lehce şariyekan – şêwezare konebawekan ke î destekanî here xuwarewey hîrarşî komellayetîn – bere bere be cûlan û derkewtin le nawçey derewey şaran ra degordirên. Ew xaley le bendî yekemî em kitêbeda le mer sefer kirdin le Norfolkewe berew Suffolk basman kird be tewawî sebarete be sefer kirdin le Cornwallewe berew Aberdeenşewe her waye: lew nawbere da zincîreyek lehcegelî ciyawaz hen ke wurde wurde deçin debal yektiriyewe. Ew zincîrane wek zincîrey lehceyî amajeyan pê dekirê – jimareyekî zor lehcey ciyawaz, belam be asayî nek cwey nastandard ke be rêgey zincîrêkî weyekçûn beyekdî bestirawnetewe, belam le lehcekanî qefî here serewe û here xuwarewey ew zincîre dûrin û weyan naçn. Ewe le mer seferkirdin le Bangor, û Maine, Tallahassee, Florida, yan le serêkî Alman yan Feranse yan Italiya bo serêkî dîkeyan her awa ye.

Le Birîtaniya, legell eweşda, le serêkî dîkey terazûy komellayetî da, barudoxeke zor ciyawaze. Axêweranî çînî here berzî çînî komellayetî lehceyek bekar dehênin ke ême wek lehcey inglîsî standard amajeman pêkird, û her wek le bendî 1-î em kitêbeda dîtman, tenê hêndêk ciyawaze le beşe ciyawazekanî wulat da. Ba nimûneyekî qamûsî bas bikeyn, le lehcey inglîsî standard da taqe wuşeyek heye bo 'scarecrow' dawel, ewîş şitêke wek însan razêndrawetewe ke cûtbendan le zewiyekanyan daydeçeçênin bo tirsandin û rewandinewey balndan, le layekî dîkewe, le nêw şêwezare herêmiyekanda ême zor wuşey nawçeyîman heye her bo em manaye, wek boge, flay-crow, mawpin, mawkin, bird- şçarer, moggy, şay, guy, bogeyman, şuft, rook – şçarer û çendîn wuşey dîkeş [be pêy qamûsî Henbane Borîney Hejar, em wuşane: daleho, dawil, dalo le kurdîda hawatay dawel in – têbînî wergêr). Her ew core nimûnane le ciyawaziye rêzimanîyekanîşda debîndirênewe. Bo nimûne ême le inglîsî standard da hem ristey wek: He's a man who likes his beer (ew piyawêke ke awîcoy xoy pê xoşe) û hem ristey wek: He's a man that likes his beer debînin. Belam corawcorî herêmî le şêwezare nastandardekanî inglîsî Birîtaniyayî da zor lewane ziyatirin. Gişt em nimûnane xwarewe ke yek manan hemûyan bekar dehêndirên. He's a man who likes his beer, He's a man that like his beer, He's a man at likes his beer, he's a man as likes his beer, He's a man weat likes his beer, He's a man he like his beer, He's a man likes his beer.

Ta ew cêgeyey ke degerêtewe ser rawêj (accent), barudox le Birîtaniya hêndêk ciyawaze, ewîş leber helkewtî takaney RP wate (telefuzî we xokiraw).

(Ewe bew manaye niye bigutrê ke le nêw RP da corawcorî niye, belkû mebest eweye ke ewe le rûy herîmiyewe diyarî nakirê, wate le herşuwênêkî înglîstan da, û belanî kemewe le hêndêk beşekanî dîkey şaşînî yekgirtû da, zincîreyek le rawêjan hen, le rawêjî RP yewe bigire, ta degate rawêje corbecore nawçeyîyekan, û ta degate ew rawêjey ke be rawêjî here nawçeyî çînî here xwarewey komellayetî dadendirê. Le xiştêy sêyemda çilonayetî telefuz kirdinî wuşeyek, wate 'home' nîşan dirawe. Le hêlî serewey xiştêkeda tenê yek şêwey derbirînî wuşeke debîndirê le katêkda le hêlî here xwarewe da 8 core telefuz kirdin nîşan dirawe, leweş ziyatir, bûnî şêwe rawêjî Edinburgh û Newçastle ke [ho:m] wekû yek derdebrin le hêlî duwem da û betaybetî şêwey derbirînî [houm] le rawêjî Liverpool û Bradford da, nîşan deda ke hêndêk le telefuzkirdinekanî xeyrî RPî le beşe cor be core kanî wulat da degene astî standaredekanî telefuz kirdinî herêmî, û kemptir le rawêjî nawçeyî da berteng demêninewe. Ême lemêje agaman lew core corawcoriyey lehce û rawêjî komellayetî û herêmî heye, û ta radeyekî baş agadar kirawîn sebarete be çoniyetî RP. legell eweşda, ta ber lewey

ew core lêkolînewane dest pêbikrên, ême nemandezanî ke RP û rawêjekanî nêwerast û rawêjgelî here nawçeyî be çî şêweyek pêwendiyar be çî komellayetiye heye; neman dezanî RP ta çendey terazûy komellayeti û le şwênî ciyawaz çon birr deka, neman dezanî çî core axêwerêk telefuzî standardî herêmî bekar dehênê; neman dezanî be wurdî rawêjgelî nêwerast û benawçeyî kiraw çine.

Zimannasî komellayeti manay eweye ke ême êsta le helumercêk dayn bo wulamdanewey ew pirsiyarane.

Xiştay 3. şêwey telefuzkirdinî wuşey 'home' be rawêjî RP û rawêjî nawçeyî RP le Edinburgh høum, le Newçastle høum, le Liverpool høum, le Bradford høum, le Dudley høum, le Norwiç høum, le London høum rawêjî nêwerast le Edinburgh ho:m, le Newçastle ho:m, huom le Liverpool, houm, le Bradford houm, h):m le Dudley h)um,)um le Norwiç hu:m, hum le London hAum, Aum rawêjî here nawçeyî le Edinburgh he:m, le Newçastle heim, jem, le Liverpool oum, le Bradford):m, le Dudley wum, le Norwiç um, le London aewm Eger bimanewê wêneyekî durust le pêwendî nêwan ziman û twêjbendî komellayeti wedest bihênîn debê bituwanîn her dûk diyardey zimanî û komellayeti bipêwîn bo ewey bituwanîn ewan be durustî le yek bibestînewe û pêwendiyar diyarî bikeyn.

Ta ew cêyey ke degerêtewe ser çî komellayeti ewe berêje be hasanî (egerçî wenebê zorîş hasan bê) dekrê be rêgey mêtodî komellanasewey rabiperêndirê wate xiştayekbe jimarewe bo takuterayan lemer pîşe, dahat, astî xwêndin û perwerde û/yan xesletekanî dîkeyan saz bikrê duwaye ewan wek girûpêk bixirêne pal destê dîkey kexiştayan bo saz kirawe (egerçî pasawdanî dabeşkirdin be ser destey ciyawaz da lewaneye qisehelgir û cencalî bê). Pêwanî ziman zor lewe diwartire. Ew çareseriyey wa le layen Labovewey pêş xirawe û dahatuwe û lew demiyewey le layen kesanî dîkeşewey bekarhêndrawe birîtiye lewey ew nîşane zimanîaney pêyiyan zandirawe le berçaw bigîrên, yan bepêy lêkolînewey pêşûtir yan be pêy texmîn û legotre le layen axêwerî zimannasewey, bo derxistinî ciyawazî le nêw ew komellgeyey lêy dekoldirêtewe, û be şêweyek be hasanî le pêwan dê. Bo nimûne, le dû helsengandinî ciyawaz da, yekyan le Detroit, le Dewlete Yekgirtuwekanî Emrîka, û ew diyan le Norwiç, le inglîsitan, derkewit ke nîşaney rêzimanî wekûyek bew şêwey lebartir û becêtire. Le inglîsiy standard da kesî sêyemî zemanî êstay şêwey takî kirdar paşgirêkî heye, ke le rênûs da be -s derdekewê, ke le xelkî dîkey ciwê dekatewe: I Know Emin dezanîm, we know ême dezanîn, they know Ewan dezanîm, belam bo kesî sêyem şe knows Ew dezanê. Le Angliay Rojhelat, ew nawçeyey

Inglîstan ke Norwiçî lê helkewtuwe, û le Detriot em –s e zor car dernakewê, belanî kemewe le qisekirdinî hêndêk xelik da. wate miro dekirê gwêy lem şêwane bibê: She like him very much, He don't know a lot, do he? It go ever sofast.

Leber ewey inglîsî standard –s î heye, û le ber ewey şêwezari standard be giştî le destê here berze komellayetiyan şêwezari her nizîke, gomanî ewe hebû lewane ye pêwendiyekî rastewxoy dûlayene le nêwan helkewtî çînî komellayeti û bekarhênanî –s da hebê. Lêkolînewe lew egere berêje hasan bû, çunkû hîç diwariyek bo pêwanî ew nîşane zimaniye le gorê da nebû: tenê be gwêgirtin lew newaraney le katîhelsengandinekeda aste kirabûn û bijardinî ewey ke axêwer çend carî –s bekarhênawe ewe rûn debuwe. Akamî ew lêkolînewane le nêw axêweranî xelkî Norwiç le Bîrîtaniya û axêweranî Emrîkayî Efrîkayî le Detriot eme nîşan deda. Lêkolîneweke derî dexa ke ew gumaney heye tewaw pasa dedrê – wate bûnî hawpêwendiyekî aşkira le nêwan çînî komellayeti û bekar hênanî –s da. (le lêkolînewekeda zaniyarîderanî xelkî Norwiç be ser pênc destey komellayeti da dabeş kirabûn – twêjî nêwerastî çînî nêwerast; twêjî xuwarewey çînî nêwerast; twêjî serewey çînî kirêkar, twêjî nêwerastî çînî kirêkar û twêjî xuwarewey çînî kirêkar – be gwêrey pinketekan le lîstey çînî komellayeti da. Ew zimannasaney legell zaniyarîderanî Detriotî karyan dekir ewanyan be çuwar destey çînî komellayeti dabeş kirdibû.) Lêreş da pêwendî nêwan çînî komellayeti û bekarhênanî – s tewaw be aşkirayî derkewit.

Ew barudoxey le merr her dû nimûnekan le serewe da wêna kira dekrê wekû nimûneyekî têkelawbûnî lehceyî dabindirê. Ême detuwanîn bilêyn, ke le nimûneyekemda, ême de rastîda legell dû lehcey ciyawaz berewrûyne, yekyan –s bekar dehêne û ewî dîkeyan bekarî nahêne. (koy pinketekanî twêjî nêwerastî çînî nêwerast le Norwiç hêndêk piştî ew boçûne degirê.) Duwaye ême detuwanîn bilêyn ke ew dû lehce cwêyane be rêjey ciyawaz le layen axêweranî ser be çînî ciyawazewe têkel dekirdirên. Le rastîda ewe lewaneye şîkirdineweyekî benirxî mêjûyî bê bo selmandinî ewey ke barudoxeke çon hatuwete gorê. Legel eweşda, be boçûnî min, baştir eweye ke ew barudoxe wekû nimûneyek le corawcorêti zatî şî bikirêtewe. Corawcorêti zatî manay ewe ye ke corawcorî le ber têkelawbûnî dû yan şêwezari ziyatir niye belkû beşêkî cwênekraweye le şêwezareke xoy. Boye be pêy ' rwangey têkelawî lehcan' axêweranî Detriotî le ber ewe şêwey gerdankirdinî kirdar degorin çunkû ewan inglîsî reşî Detriotî têkelawî şêwe qisekirdinî (ke le şêwey 'resen'î xoyda –s î niye)inglîsiy standard deken (ke em –s î heye). Le layekî dîkewe, be pêy ' ruwangey ' ciyawazêti zatî' ew corawcoriye tenê xesletêkî inglîsî Emrîkayî Efrîkayî Detriote. Belgey selmandinî em ruwangey

duwayî ewe ye ke ew corawcoriye le astêkî berbilaw da xoy derdexa, çî le nêw gişt axêweran da û çî le jimareyekî berbilawî nîşaney dîkey zimanîda. şitêkî ew boçûn zor rûntir dadegrêtewe ewe ye, ke em şêwe le coracorêtiye tenanet le şêwey qîsekirdinî mindalanî zor kem temenîşda bedî dekrê ke qet nekewtûnete ber karlêkerî lehcekanî dîke. Wa wêdeçê corawcoriyekanî zimanî le zatî xoyanda wekû qa'îde û rêsayek legoranhatû bin ta ewey ke rêzper bin, û renge ciyawazêtî zatî hawtayekî zimanî neguncan û newekûyekî komellayetî bê.

Jimareyekî dîkeş le nîşanekanî rêzimanî, ke ta radeyek aloz û pêçelpêçin, nîşan dirawin bo bestineweyan be çînî komellayetî her le gwên ew nimûne –wate, be destinîşankirdinî radey diyarkewtin û bûnyan û le nêw lehce çînayetiye ciyawazekanda (be bê ewey lêk dabirabin). Bo nimûne, lem ristaney xuwarewe wurd binewe katêk bimanewê le doxî nefî da deryan bibrîn: I can eat anything, Emin detuwanim hemû şitêk bixom. le şêwezarî standardî inglîsîda dû rêge heye bo derbirînî em risteye le doxî nefî da, yan kirdareke dexirête doxî nefî yewe ke risteyekî away lê saz debê: I çan't eat anything, Emin natuwanim hemû şitêk bixom, yan dekrê cênaweke bixrête doxî nefî yewe: I çan eat nothing (heman şit le ristey hawşubar da ke herfî te'rîfêkî nadiyar yan cênawêkî nadiyarî têda bê her awaye.) legell eweşda, le hêndêk le şêwezarekanî inglîsîda derfetêkî sêyemîş heye- ke ême detuwanîn hem kirdar û hem cênawe nadiyareke bixeyne doxî nefî yewe: I çan't eat nothing, Emin natuwanim hîç bixom.

Be temaşa kirdinî ew lêkolînewey le Detriot kirabû, derkewit pêwendiyekî aşkira le nêwan bekar hênanî sê şêwey xistine doxî nefî kirdin – dûcar, baştir, fire car - û çînî komellayetî le ara daye. le sedî bekar hêndiranyan le şêwe nastandardekanda awa bû. le nêw twêjî serewey çînî kirêkar 2, le nêw çînî xuwarewey çînî nêwerast 11, le nêw twêjî serewey çînî kirêkar 38, le nêw çînî xuwarewe çînî kirêkar 70. – lêreşda her heman nimûney çînayetî debînîn, û dîsan derdekewê ke hîç çînêk be şêlgîrî tenê core şêweyek yan yekîdî bekar nahênê.

Rawêjekanî 'accents', çînayetî, be pêçewaney xeslete rêzimanîyekan be ruwalet pêweçaranyan zor diwartire. ême wekû axêweranî xocêyî [inglîsî], be pêy ezmûnî xoman dezanîn ke zincîreyekî berbilaw ke morkî komellayetiyan pêwe diyare hen, belam gelo ême be wurdî ew nîşane fonêtîkî û dengsaziyane çilon be derxere (parameters) komellnasanekaneke bîlkênîn û pêwendiyên pê bideyn? Mêtodî asayî ewe ye ke tak tak, le telefuzî vawêlekan û konsonantekan bikoldirêtewe. Bo

nimûne, be rêje hasane bûn yan nebûnî dengêkî konsonantî taybetî le kutêkî qise kirdin da bijmêrdîrê. Le şarî Norwiç lem sê nîşanane koldirawe:

1. le sedî hebûnî n' le beramber ng le wuşegelî wek walking, running û htd da – [w):kn] le ast [w):ki?] da.
2. le sedî hebbûnî bestî gerûyî (glottal stops) le ast t le wuşey wekû butter, bet û htd da. – [ba?e] le beramber [bata] da.
3. le sedî ' hs-î kilor ' le beramber 'e' le wuşey wekû hammer, hat û htd da. [aeme] le beramber [haema] da.

Le xuwarewetir da radey derkewtinî ew konsonantane bas dekeyn. Ew sê konsonantane be aşkirayî derxerî başin bo helkewtî çînî komellayetî le Norwiç, û be taybetî wekû derxer girîngin bo nîşandanî ewey ke be giştî axêwer endamî çînî nêwerast yan çînî kirêkare. Leweş ziyatir, wa wêdeçê nekrê basî rawêjgelî cwêy çînî komellayetî pasawî bo bihênrêtewe- belkû dîsan zincîreyek le gorêdaye, ke zorbey axêweran carêk telefuzêk dekar deken û carêkî dîke telefuzêkî dîke. Formekanî xeyrî RP (telefuzî wexokiraw) bo derbirînî sê konsonantan le Norwiç. Ng – (çend lesed) le nêw twêjî nêwerastî çînî nêwerast 31, le nêw çînî xuwarewey çînî nêwerast 42, le nêw twêjî serewey çînî kirêkar 87, le nêw tuwêjî nêwerastî çînî kirêkar 95, le nêw çînî xwarewey çînî kirêkar 100. t (çend le sed) le nêw twêjî nêwerastî çînî nêwerast 41, le nêw çînî xuwarewey çînî nêwerast 62, le nêw twêjî serewey çînî kirêkar 89, le nêw twêjî nêwerastî çînî kirêkar 92, le nêw çînî xuwarewey çînî kirêkar 94. h (çend le sed) le nêw çînî nêwe rastî çînî nêwerast 6, le nêw çînî xuwarewey çînî nêwerast 14, le nêw twêjî serewey çînî kirêkar 40, le nêw twêjî nêwerastî çînî kirêkar 59, le nêw çînî xuwarewey çînî kirêkar 61.

Zorbey here zorî axêweranî Norwiç her dûk telefuzekanî gişt konsonantekan bekar dehênin. Ewe be taybetî çawrrakêşe serncî bidrêtê ke be şêwey mamnawendî tenanet çînî here sereweş telefuz kirdinî şêwe - walkin' le sedî 31 caran bekar dehênê.

Reng e lêkolînewe lew core corawcorî konsonantiyekan yekem car le layen Labov le şarî New York kirabê, ber le lêkolînewe û lêkdanewe serekiyekey. Ew ferziyeyey ke bekar hênanî /r/ î na- ber le vokal pêwendî dedrêtewe be çînî komellayetî be şêweyekî ezmûnî taqîkirayewe nek wek zor le

lêkolînewe zimaniyekan ke be şêweyekî zor raşkawanetir berîwe çûn. (Labov belanî kemewe le layen pisporêkî dîkey zimannasiy komellayetî yewe wekû ' nabîxeyekî karî be mêtod' nêwzed kirawe). Ewey ew kirdî ewe bû ke şêwey qise kirdinî şagird û berdestî dûkanan le sê firoşgey gewre be taqî bikatewe, ke ew firoşgeyane be rîz pile û astyan beriz, mamnawendî û le xuwarewe da bû. Karekey awa bû le pêşda bizanê kameyek le firoşge gewrekan le nihomî çuwaremdan û duwaye le herçende berdestî dûkaney ke dekra le şwênekanî dî firoşgeke pirsyarêkî awa bika: ' Exeçuse me, where are the women's shoes? (Bibûre kewşî jinan le kwê hene?)

Diyar e wulamî ew pirsiyare 'fourth floor' (nihomî çuwarem) bû be dû derfetî derkewtinî/r/î na-ber le vokal. Bew şêweye zanyarî sebarete be bekarhênanî /r/ le 264 zanyarîderan wergîra (ke helbet, ewan neyandezanî le layen zimannasêkewe ew pirsiyareyan lê kirawe). Akamî ew lêkolîneweye awa bû: 38 le sedî berdestanî pile berzî firoşgekan çî /r/ bekar nedeheña, 49 le sedî berdestanî firoşgekan ke pile û payey mamnawendiyan hebû û 83 lewaney ke pile û astî xuwareweyan hebû ewanîş/r/yan bekar nedeheña. Ca boye, Labov cige lewey ke zanyariyekî sinûrdarî sebarete be şwêninasî 'topography' firoşge gewrekanî New York wedest xist eweşî rûn kirdewe ke be rêje xesletî be hênd negîrawî rawêjî 'accent' le barî komellayetiyewe detwanê çende girîng bê.

Kêşey pêwanî vawêlan, ke le rûy komellayetiyewe zor le konsonantekan giringtirin gewretire, çunkû lew bareyewe kareke le ser bûn û nebûnî dengêkî taybetî niye, belam ciyawazî kemî (zor car zor kem) çoniyetî vawêl le gore daye. Zimannas bo raperandinî ew kêşeye be le yek kirdinewey durustî nêwan çoniyetî vawêlekan û wayan da denê ke ewan wek dengî cwê wabin. Bo nimûne, le inglîsiy New York da zincîreyek corawcorî girîngî komellayetî hen bo telefuzkirdinî dengî vawêl le wuşey wek: cab, bag, bad, half, pate, dance da. Ew corawcoriye ciyawazyane zincîreyek pêk deheñin, belam nakrê be şêweyekî destkird cwê bikrênewe. Be giştî dekrê be çuwar cor dabeş bikrên. Duwaye dekrê lîsteyek saz bikrê bo hejmartinî her kamyane be tenê (û duwaye bo her kamyane lîsteyekî girûpî saz bikrê) be hîsab kirdinî rêjey mamnawendî nirxêkî dedrê be derkewtinî ew vawêle le qisekanyanda. Ewe bekar hênanî telefuzkirdinî mamnawendî takêk yan desteyek nîşan deda – eger takekan be berdeyamî ba bilêyn bad, bag, half wek [be:d] û htd. telefuz biken. Ewan 1. 0, pinktyan dedrêtê, belam eger ewan şîlgîrane bilên [bae:d] 4. 0 pinktyan dedrêtê. Akamî lêkolînewe le nêw sê destey çînî komellayetî awa bû. çînî serewe 2. 7 pinkt, çînî nêwerast 2. 5 pinkt, çînî xuwarewe 2. 3 pinkt.

ke wabû, le qisekirdinî xomane da, gişt New Yorkiyekan be şêwey mamnawendî telefuzkirdinêkî

nêwan [bead] û [bae:d] bekar dehênin, belam ciyawaziyekî kem belam berdewam le nêwan telefuzkirdinî çîne komellayetiyeke da heye: axêweranî çînî xuwarewe zor ziyatir le axêweranî çînî serewe vawêlêkî zor beyekewelkawtir bekar dehênin. Ca boye ciyawaziyekî kem le çoniyetî vawêl da derkewit ke le rûy komellayetiyeke ta radeyek girîng e.

Her ew core têknîke bo tawtwê kirdin û şîtel kirdinî rawêjekanî Birîtaniyayî dekar kirawe. Le inglîsiy Norwiç da dekirê sê çoniyetî vawêl le wuşey wekû pass, part, şaft, bate, card da le yek bikirênewe.

1. vawêlêkî dirêjî piştewey şêwey RP (telefuzî wexokiraw)yewe wek [a:] le wuşey wekû pass da derdekewê yan dengî vawêl le wuşey Emrîkayî pot da. 2. vawêlêkî nêweraste, û 3. vawêlêkî pêşeweye [a:] her wek şêwey derbirînî dengî vawêl le wuşey part da le Austiraliyayî yan rojhelatî şêwey Newengland da. Ewe bew manayeye ke ew pinktaney beseryanda dabeş dekirên le 1. 0 ewe destpêdeka bo telefuzkirdinî şêlgîrî RP ta degate 3. 0 pinkt bo bekar hênanî şêlgîraney vawêlî pêşewe. Hawguncî nêwan çoniyetî vawêl legel çînî komellayetî awa derdekewê. Twêjî nêwerastî çînî nêwerast 1. 9 pinkt, çînî xuwarewey çînî nêwerast 2. 1 pinkt, twêjî serewey çînî kirêkar 2. 8 pinkt, twêjî nêwerastî çînî kirêkar 2. 9 pinkt, twêjî xuwarewey çînî kirêkar 3. 0 pinkt.

Be giştî, axêweranî inglîsiy Norwiçî çînî kirêkar vawêlêkî pêşeweyan heye, le katêkda axêweranî çînî nêwerast lewê vawêlêkî nêwendî bekar dehênin, belam, hêştas be şêweyekî mamnawindî, ciyawaziyekî kem le nêwan çonêtî vawêl da heye ke be rêgey ewda çênêk le çînêkî dîke dekrêtewe. Zor nimûney dîkey ciyawazî çînayetî ew çeşne dekrê le hemû şwênêk derbikewê û bas bikrê eger miro biyewê nêwyan berê. Bo nimûne, le Leeds, le Inglîstan, axêweranî çînî nêwerast vawêlêkî [A] amal le wuşey wekû but, up, fun da bekar dehênin, le katêkda axêweranî çînî kirêkar heman deng wekû vawêlêkî beriztir û xirtir dekar deken [0]; le London wuşey wekû name, gate, façe û htd. wekû [neim], [nêim] yan [naem] telefuz dekirên be pêy çînî komellayetî (çînî here serewe le formî yekemda); le Jicago dengî vawêl le wuşey wek roof, tooth, root da zor car wek [û] telefuz dekirê, belam le qisekirdinî endamanî ser be çînêkî beriztirî komellayetî da zor car be wêkhênanî her dük lêwekan derdebirdirê [0]; le Boston, Massaçusetts, axêweranî çînî serewe le ûşey wek ago, know da vawêlekan wek [ou] derdebirin, le katêkda axêweranî dî wek [ou] telefuziyan deken.

Lêre da zor becêye xwênerewe pirsiyar bika başe, danî ew core zaniyariyane awa be wurdî çî nirxêkî heye? hoyekî girîng bûnî ew meseleye eweye ke hênêdik lew nûseraney ke sebarete be zimannasiy komellayetiyan nûsîwe wek ' zimannasiy komellayetî beyekbestirawane ' corretoinal soçiolinguistiçs

galteyan bew core kare kirduwe. Wek ewey ke mebest le rahatineke her gutinê ewey bê ke be yek bestiraneweyek le ara daye, nek ewey ême bituwanîn şitêkî lê fêr bîn. Le wulamî pirsiyarî becêy xwênerewe da debê bigutrê, yekem, ewe nîşan deda ke be wurdî ême le ser çî core zanyariyek kar dekeyn katêk ême pileyekî komellayetî le axêwerêk şetek dedeyn le ser binemay belgey zimanî. Be rêgey ezmûnî zimanî xoman ra ême hestiyariyekman têda pêk hatuwe, be asayî bê ewey pêy bizanîn, le beyekewe bestiranewey ewto le nêwan çînî komellayetî û şêwe standard yan nawçeyekanî zimanî da. Xalî duwem eweye, ew core zanyariye hêndêk şitman sebarek be binaxey komellayetî komellgegelî taybetî bo rûn dekatewe, bo nimûne, sebarek be hem Norwiç û hem Detriot boşayî dûrî û nizîkî here gewre le nêwan pinktekanda birîtiye le ciyawazî nêwan twêjî xurawey çînî nêwerast û twêjî serewey çînî kirêkar da. Ew rastiyeş deyselmênê ke dabiranî komell be dûçînî serekî, wate 'çînî nêwerast' û 'çînî kirêkar', dabiranêk ke ta astêkî zor belam nek be tewawî le ser binemay ciyawazî nêwan pîşey karî destî û kar na destî pêk hatuwe, hêndêk nirx û girîngayetî heye, le ber ewey ke kend û kospî komellayetî be rûnî le zimanda reng dedatewe. Xalî sêyem eweye ew core zanyariye ew layeneş rûn dekatewe ke le serewe le mer îdîolêkt (şêwey qise kirdinî tak le katêkî taybetî da) basî lêwe kira. Egerçî takuterayan hêndêk car her şêweyekî kirdar bekar dehênin, û katêkî dî şêweyekî dîke, le sedî mamnawendî bo her desteyey dekewête nêw qalibî nimûneyekî be tewawî çawerruwan kirawewe.

Xalî çuwarem eweye, ew core zanyariye, agadariyekî gelêk zorman sebarek be lehcekanî çînî komellayetî le ber dest denê. Bêtu ême serinc bideyne ser tenê xesletêkî zimanî ta ewey ke le şêwezarêk be giştî wurd bînewe, ewe aşkraye ke, lehcegele komellayetiyeke, her wek lehce herêmiyeke hebûnî be tewawî leyek ciyawa nîn, ewan têkelawî yektirî debin bo ewey zincîreyek pêk bihênin. Ême eger bimanewê dekrê nêwî lehceyek wek ' lehcey Norwiçî çînî nêwerastî çînî kirîkar' heldeyn, belam eger ewe bikeyn debê zor berçawman rûn bê (a) ke dabeşkirdinî çînekan be pênc çînî komellayetî le layen êmewe le waneye yeklayene bê, (b) ke ew ciyawaziye zimaniyaney le gorê dan tenê rêjeyî bin û radey derkewtîyan her le mer nîşane û xesletî taybetî bin û (c) le waneye akamî ciyawaz derkewê eger hokarî gorênerî dîkey zimanî leber çawbigîdirê. Ca boye qalibî bawî nêwxelk sebarek be lehcegelî çînî komellayetî teqrîben hemîşe rast dernaçin û ser lê şêwênerin. Bo nimûne, ewe rast niye ke qisey awa be girdibrî bikirê ke belê ' lehcey Detriotî Emrîkayî Efrîkayî le kirdarekanî zimanî êsta da hîç derxerî kesî sêyemî niye' Emrîkayîye Efrîkayîyeke xelkî Detriotî ser

KURDISTAN DIBE EREBÎZIMAN

Rewşa kembax ya zimanê kurdî li Bakurê Kurdistanê bi berfirehî tê zanîn û behskirin jî tevî ku birêveberên kurd ti tiştêkî dorgêrr û werçerxîner bo guherandina rewşê nakin. Roj bi roj pêgeha zimanê tirkî li Bakurê Kurdistanê xurttir dibe. Ne ku tenê kurd hînî tirkî dibin û dibin duzimanzan lê di rastiyê de rêjeya duzimanîtiyê li Bakurê Kurdistanê ber bi kêmbûnê ve ye: yên ku kurdî û tirkî dizanin kêmtir dibin û roj bi roj nifşekî ku tenê tirkî dizane mezin dibe.

Bi ser ve, rewşa Başûr û Rojavayê Kurdistanê berevajî rewşa Bakur e. Ji aliyê siyasî û eskerî ve wisa dixuye ku hem Başûrê Kurdistanê li ber e ku ji Iraqê cuda bibe û bibe dewlet û hem jî li Rojavayê Kurdistanê birêberiyêke kurdî ya otonom an federal ava dibe.

Mixabin rewşa zimanê kurdî li Başûr û Rojavayê Kurdistanê jî ber bi wêranîyê ve ye. Rast e ku kurdên Başûr û Rojava bi xwe dest ji axiftina kurdî bernedaye û bi temamî neqlî bikaranîna erebî nebûne (tevî ku li Rojavayê Kurdistanê piranî di nivîsînê de erebî bi kar tînin, ne kurdî). Lê pêgeha zimanê erebî hem li Başûrê Kurdistanê û hem jî bi taybetî li Rojavayê Kurdistanê xurt û berfireh dibe.

Li gor vekolîneke nû, bikirrên 80 % ji milkên ku niha li Başûrê Kurdistanê tên firotin ereb in.³⁰ Li hin taxên paytext Hewlêrê divê mirov lê bigere heta kurdîaxivan bibîne. Ji bilî milk-kirran, herwiha bi sedan hezaran penaberên ereb li Kurdistanê bi cih bûne. Tevî ku wek prensîp mana wan li wê derê demkî ye, lê bi salan e ew li wê derê ne û ihtimala vegera piraniya wan qet nîne.

Bi taybetî li deverên nakok (yên ku hikûmeta Iraqê û ya Kurdistanê li hev nakin ka divê di bin îdareya kê de bin) yê wek Kerkûkê, hejmara penaber û şênîyên din yê ereb roj bi roj zêde dibe. Li bajarekî din yê nakok, li Xormatûyê, li ser navê biratiyê kurdan berî demekê rê da ku milîsên şîî jî li nav bajarî bi cih bibin. Ji hingê ve revandina kurdan ji aliyê wan milîsan ve didome. Êdî di nêzik de kurd li wê derê namînin. Kurd çendî idia bikin ku Kerkûk dilê Kurdistanê ye jî, kurdan bi xwe rê daye (kontrola sinorên Kerkûkê di destê pêşmerge de ye) ku hind zêde ereb li Kerkûkê bi cih bibin ku êdî piraniya bajar ne kurd lê ereb in.

³⁰ <http://ekurd.net/arab-real-estate-iraqi-kurdistan-2016-06-27>

Li Başûrê Kurdistanê ev demeke dirêj e ku gengeşe li ser forma zimanê resmî yê kurdî tê kirin. Gelek soranîxiv rijd û serhişk in li ser wê ku divê ji lehceyên kurdî tenê soranî bi resmî were bikaranîn. Di heman demê de li Başûrê Kurdistanê erebî, tirkmenî, aşûrî û ermenî jî wek zimanên fermî hatine qebûl kirin.

Di pratîkê de ti rola zimanên aşûrî û ermenî niha li Kurdistanê nîne. Tirkmenî ji xwe nayê nivîsîn û resmîkirina tirkmenî tê maneya resmîkirina zimanê tirkî. Bo nimûne, li ser alaya wilayeta Kerkûkê ne bi tirkmenî (ku bi alfabeya erebî tê nivîsîn) lê bi tirkîya stembolî hatiye nivîsîn.

Resmîkirina zimanên din ji her tiştî zêdetir xizmeta zimanê erebî û ereban dike. Niha li Kurdistanê – heta li paytext Hewlêrê jî – ereb dikarin her tiştê xwe bi erebî bikin û qet ne hewceyê bikaranîna kurdî ne. Her cara ku eger tenê erebek jî di civateke hezarkesî ya hemû kesên din kurd de beşdar be, di pratîkê de zimanê erebî tê bikaranîn.

Li Başûrê Kurdistanê bi her awayî rê li ber zimanê erebî hatiye xweşkirin lê di heman demê de gelek "ronakbîrên" soranîxiv hemû enerjîya xwe bo serkutkirina lehceyên din yên kurdî bi kar tînin û bi her awayî dijî bikaranîna kurmançî di perwerdeyê û dezgehên îdarî de ne. Wek her carê, tehemila kurdan ji her kesê biyanî re heye lê ji birayên xwe yên kurd re nîne.

Li Rojavayê Kurdistanê rewş hê ji Başûr jî gelek kembaxtir e. Îdareya wê derê ereb, aşûrî û tirkmenan li ser serê xwe digêrîne û toza pêlavên wan dialîse lê bi ti awayî tehemila kurdên ku bi qasî misqaleke zerrî jî jê cuda bifikirin nîne.

Di pratîkê de hemû îdareya Rojavayê Kurdistanê bi erebî dimeşe. Ji ber ku di meclis, lijne û her kombûn û civînên îdarî de bi kêmî yek-du kesên ne-kurd jî beşdar dibin, hemû civîn bi erebî tînin birêvebirin. Her sê kanton qanûn û daxuyaniyên xwe bi erebî belav dikin (tenê bi nav çend miswede li kurdî tînin wergerandin).

Hejmara kurdên ku niha ji Rojavayê Kurdistanê direvin bi her awayî ji hemû demên desthilatên biyanî berfirehtir e. Li cihê wan roj bi roj ereb bi cih dibin.³¹

Ev xurtbûna ereban û zimanê wan hem li Rojavayê Kurdistanê û hem jî li Başûrê Kurdistanê bi bi rêjeyeke wisa biserketî dimeşe ku Sedam û Esed nedikarî di xewnên xwe de jî wiha xeyal bikin.

³¹ <http://rudaw.net/kurmanci/kurdistan/25072016?keyword=li%20rojawa>


Eger zû çareyek ji vê lehiya erebî ya bi ser Kurdistanê de neyê girtin, di çend dehsalan de kurdî dê bi tamamî ji Rojavayê Kurdistanê were maliştin û li Başûr jî zêde-zêde li çend deverkan bimîne û taliyê ji wan jî were paqijkirin.

Sûc, xeta û berpirsiyariya vê meselê ne ereb an tirk in. Em kurd bi xwe vê li ser xwe qebûl dikin. Tenê em bi xwe dikarin rê jî li ber vê felaketê bigirin û xwe ji qirrbûna zimanê û neteweyê rizgar bikin.

www.arasivakkeid.org

Rêzimana kurdî ya R. F. Jardine

Bahdinan Kurmanji



Kitêba *Bahdinan Kurmanji* (Kurmanciya Behdînan) an jî bi navê xwe yê temam *Bahdinan Kurmanji – a Grammar Of The Kurmanji Of The Kurds Of Mosul Division And Surrounding Districts Of Kurdistan* (Kurmanciya Behdînan – Rêzimeke kurmanciya kurdên wilayeta Mûsilê û deverên derdor yên Kurdistanê) kurterêziman û ferhengokek e ku ji aliyê kaptenekî artêşa Brîtanyayê yê bi R. F. Jardine ve hatiye nivîsîn. Kitêb sala 1922 li Bexdayê ji çapxaneya hikûmeta Brîtanyayê – ku hingê li Iraqa niha serwer bû – hatiye weşandin.

Wek ku ji navê kitêbê diyar e, mijara wê kurmancî, hê deqîqtir kurmanciya herêma Behdînan e. Nivîserê wê bi xwe li Dihokê bi cih bûbû û kurdiya kitêbê ya wê derê ye anku kurmanciya rojhilatî yan "behdînî" ye.

Kitêb ji 114 rûpelan pêk tê. Teqriben nîv jê rêziman e, nîva din jî ferhengokeke inglîzî-kurdî ye. Ferhengok li gor rêzbendîya peyvên inglîzî ye anku peyvên inglîzî tê de hatine rêzkirin û li kurdî (kurmancî) hatine wergerandin. Ji bilî van herdu beşên mezin, li destpêkê herwiha pêşgotinek li ser zimanê kurdî, bi taybetî kurmancî û ji kurmancî jî xaseten devoka behdînî heye. Piştî wê jî, lê berî destpêkirina beşa rêzimanê, dengnasiya kurdî tê behskirin.

Beşa rêzimanê bi xwe ji sê beşên serekî pêk tê. Beşa yekem li ser birrên peyvên in (navdêr, rengdêr, cînav, hoker, lêker û hwd). Beşa duyem derbarê hevoksaziyê ye. Beşa sêyem jî behsa şêwaznasiya anku stîlîstîka kurmançî dike, nimûneyan jê dide û herwiha hin gotinên berbelav yê ihtiram û rêzgirtinê pêşkêş dike.

Jardine hewl daye ku kitêboka xwe bi awayekî hêsan bo karmendên brîtanî yê li deverê kar dikin amade bike tevî ku vê bi aşkerekî nabêje jî.

Di pêşgotina xwe de bi kurtî behsa cudahiyan kurmançî û soranî û herwiha behsa hebûna cudahiyan di devokên kurmançî de jî dike. Li aliyekî din, dibêje ku naxwaze xwe biavêje nav gengeşeya wê ka gelo kurdî lehceyekî farisî ye yan na lê idia dike ku "piraniya kurdan li ser wê qenaetê ne ku kurdî awayekî herimandî yê farisî ye li gel zêdekirina peyvên kurmançîkirî yê ji erebî û tirkî".

Ew vê idiya xwe ya derbarê zimanê kurdî û herwiha derbarê "qenaeta piraniya kurdan" bi ti awayî bi delîlan isbat nake. Ew bi zelaî gotineke ne rast e hem derbarê zimanê kurdî (hingê jî bi zelaî di zimannasiyê de kurdî wek zimanekî ji farisî serbixwe hatibû qebûl kirin) û herwiha derbarê qenaeta piraniya kurdan jî ji ber ku piraniya kurdan (bi taybetî jî yê wê deverê ku wî lêkolîn li ser kiriye) farisî nedizanî û heta belkî piraniya wan di wê serdema bêyî medyaya guhdarî-bînahî de qet carekê jî farisî nebihîstibû. Hem kurd û hem jî faris ev bi kêmî hezar sal e ku xwe du milletên ji hev cuda dihesibînin. Ev ne tenê ji berhemên klasîkên kurdî, wek Mem û Zîna Ehmedê Xanî lê herwiha ji berhemên farisî, bo nimûne ji Şehnameya Firdewsî jî aşkere ye. Ya ji vê jî giringtir: kurdî û farisî ne bi dualî û ne jî bi yekalî ji qisekerên hev re ne fehmar in. Bi gotineke din, kurdîaxiv ji farisî fehm nakin û farisîaxiv jî ji kurdî fehm nakin (ji bilî hin gotinan) eger wan xwe hînî zimanê hev nekiribe.

Di beşa li ser dengnasiyê de piraniya dengên kurdî baş şirove kirine tevî ku bo nimûne behsa cotdengên pifdar (req) û bêpif (nerm) yê Ç, K, P û T nake jî. Li aliyekî din, behsa du H-yan (heval/heft), du X-yan (ax/xezal) û du Z-yan (zer/zanîn) dike lê dîsa behsa du S-yan (ser/sed) nake.

Di meseleya cudahiyan kurmançî û soranî de, Jardine idia dike ku kurmançî gelek sadetir û safitir ye lê diyar nake ka di çi warî de kurmançî ji soranî sadetir an safitir e. Di rastiyê de di hin waran de kurmançî sadetir e (bo nimûne di pêvenekirina cînavan de) lê di hin mijaran de jî soranî sadetir e (tinebûna du cîsên cuda yê rêzimanî di soranî de).

Di mijara çemandin (tewandin) û ravekirinê (pêkvegirêdanê) de Jardine tê gihîştîye ku di kurmançî de du cîsên rêzimanî (mê û nêr) hene. Lê hê ji unîta yekem ve ew şaşiyên dike. Bo nimûne, dinivîse:

- *bāb e kichk* (li gor nivîsîna niha dibe "babê kiçk") lê di devoka ku ew li ser dinivîse de mirov dibêje "babê kiçkê" (li gor nivîsîna wî divê nivîsîba "*bāb e kichkê*") anku peyva "kiçk" (keçik) divê biçeme anku bitewe.
- *daik a kurrk* (li gor nivîsîna niha dibe "deike kurrk") ku ji çend aliyan ve şaş e. Mebesta wî "dayika kurrikî" ye ku li Behdînan li hin deveran dikare wek "deyka kurrkî" were gotin. Raveka mêtîyê di kurmancî de "a" ye û Jardine jî dibêje "a" ye lê li destpêka kitêba xwe wî herfa "a" wek dengê "e" yê niha diyar kiriye. Loma divê li gor nivîsîna wî bijartî raveka mê wek *ā* hatiba nivîsîn. Peyva "kurrk" di vê komika nimûne de di kurmanciya Behdînan de divê wek "kurrkî" hatiba çemandin lê Jardine ew neçemandî hiştiye. Dengê "i" – ku Jardine di peyva "daik" de bi kar aniye – li wê derê li gor rêbazên wî bi we bijartî yên nivîsînê jî ne rast e ji ber ku wî jî "i" wek kurmanciya niha bo dengê "i" bijartîye lê li vê derê li şûna "y" yan "î" bi kar aniye.

Wek din jî kêmasiyên herî mezin yên kitêbê neqilkirina dengên kurdî ne. Bo nimûne, mirov dikare sernivîseke ji rûpela 49 neqil bike vê derê. Jardine sernavê çirokê yan serpehatiyê wiha dinivîse: "RIZ ET TIRI U MIVISH". Mebesta wî "Rezên tirî û mewîj" e ku bi kurmanciya Behdînan mirov dibêje "Rezêt tirî û mêwîj". Wek ku tê dîtin, heman herfa "i" bo diyarkirina 4 dengên cuda hatiye bikaranîn:

- li cihê E: peyva "rez" wek "riz" nivîsiye.
- li cihê I: peyva "tirî" wek "tîri" nivîsiye.
- li cihê Î: peyva "tirî" wek "tîri" nivîsiye.
- li cihê Ê: peyva "mêwîj" wek "mivish" nivîsiye.

Li aliyekî din, di heman sernavê de li cihê Ê ("rezêt" ku forma behdînî ya "rezên" ya kurmanciya navendî û standard e) wek E nivîsiye: "rez et". Ji xwe ne hewce ye em bibêjin ku di peyva "mêwîj" de li cihê dengê W herfa V û li şûna dengê J jî cotherfên SH bi kar anîne. Li derên din ew W bo dengê W û V jî bo dengê V bi kar tîne û cotherfên SH jî bo diyarkirina dengê Ş dixebitîne.

Tevî van rexneyan jî, divê mirov bibêje ku ev kitêb yek ji xebatên pêşîn yên bi inglîzî yên li ser zimanê kurdî bûye. Ferhengoka wê ya inglîzî-kurdî demeke dirêj tek ferheng an ferhengoka inglîzî-kurmancî bû.

Em dilşa ne ku bikarin vê kitêbê bixin xizmeta vekolerên zimanê kurdî:

<https://zimannas.files.wordpress.com/2016/07/behdinan-kurmanji.pdf>

GRAMERÊ ZAZAKÎ DE NEGATÎFÎYE

Özlem Kılıç

Na xebate de gramerê zazakî de sîstemê negatîfîye, şekilê negatîfbîyayîşî û cigêrayîşê viraştişê ey armanc keno. Şima zî zanê ke nêgatîfîye katêgorîyêkê gramerî yo gerdûnkî yo, sîstemê nêgatîfîye goreyê viraştişê her zimanî esto. Na rewşe esas gênî û sîstemê nêgatîfîye yê zazakî zî esto û no tevger ra xebate de nêgatîfîye ke gramerê zazakî de ca gênî hem hetê viraştişî ra hem zî hetê manaye ra girewtê dest û etud kerdê.

Xebat bi qismo şîyayîş û peynîye ra wet hîrê qisman ra yena raste. Qismo şîyayîş de ziwannasî, babetê nêgatîfîye û gramerê zazakî girewto dest. Qismo yewin de nêgatîfîyê ke zazakî name, sifet, karan de yê hem hetê viraştişî hem zî hetê manaye re etud kerdê. Eynî qismo de zazakî de şinasnayîşê raweyanê xebere û waştişî virazîyayê, raweyê ke babeta vateyî de negatîfî bi wasitaya karan raweyanê demî û şertan ancîyayê û heme raweyî bi halê tabloyan de etud bî.

Qismo diyîn de zazakî de tewirê cumleyan tesnîf kerdê, nêgatîfîyê ke tewiranê cumleyan de cumleyê ke cuya rojane de şuxulîyenê nimûne kerdê.

Qismo hîreyin yê xebate de zazakî de nêgatîfîyê ke duayan de, zewtan de, vateyê verênan de û îdyoman de yê hem hetê viraştişî ra û hem zî hetê manaye ra etud bî û zazakî de nêgatîfîyê ke duayan de, duayan de, zewtan de, vateyê verênan de û îdyoman de bi xebate ardê raste. Necîte yê xebate de daneyê ke tez de resayê înan, ca dayo înan.

Vekin û bixwînin:

<https://zimannas.files.wordpress.com/2016/07/c3b6zlem-kilic3a7-1.pdf>

Nasandin û naveroka kovara

HETAWÎ KURD

Mesûd Serfiraz

Hetawî Kurd yek ji kovarên kurdî ya dewra Osmanî ye. Ew li Stenbolê dihate weşandin û xwedî û mudîrê berpirsîyarê wê Baban 'Ebdulezîz bû.[1]

Kovar ji aliyê Civata Telebeyên Kurd Hêvî (Hêvî Kürd Talebe Cemiyeti) ve dihate weşandin. Ev civat, piştî îlan kirina meşrûtiyeta duyem (1908) di 27'ê Tîrmeha 1912'an li Stenbolê ava bûye. Qedrî Cemîlpaşa, 'Emer Cemîlpaşa, Fuad Temo, Cerrahzade Zekî sazkarên wê; Kemal Fewzî, Memdûh Selîm, Ekrem Cemîlpaşa, 'Ezîz Baban, Mistefa Şewqî, Mihemed Şefîq 'Erwasî, Hemzeyê Muksî, Asef Bedirxan, Mihemed Mîhrî, 'Evdirehîm Rehmî jî ji hin endamên wê bûn.[2]

Civata Hêvî, gelek armanc dane pêşîya xwe. Ev armanc di beyannameya xwe de yek bi yek nîşan dane:

1. Feqeê Kurdan bi hev bidine nas kirin û di mabeyna wan da biratiya Misilmanî bidine danîn.
2. Zimanê Kurdan yek kirin û kitêbên Kurdî civandin û tarîx û qewaid (rêziman) çêkirin û çap kirin û kitêb ji bo zarokê Kurdan çêkirin.
3. Di Kurdistanê da medrese vekirin.
4. Zar'wê feqîrê Kurdan li ber xwendin û sin'et danîn û ji bo muhtacan arî kirin.
5. Di Kurdistanê da û xasseten (taybetî) di gundan da [ji]mizgeft û mekteb çêkirin ra rêberî kirin.
6. Ji bo pêşçûna Kurdan û bilindbûna wan çî ji dest bê ewê çêkirin.
7. Xebat ji me, muyesser kirin (bi serketin) ji Xudê[3].

Civat, pêşî kovarekê bi navê *Rojî Kurd* derdixe. Ev kovara bi kurdî û tirkî, hejmara wê ya ewil di 19'ê Pûşpera 1913'an de derketiye. Piştî jimara çarem (12'ê Rezbera 1913'an) weşana kovarê betal bûye. Bozarlan dibeje ku kovar ji aliyê hikûmetê ve hatiye girtin.[4]

Civata Hêvî, piştî rawestîna weşana *Rojî Kurd* bi demeke kurt vê carê dest bi weşandina *Hetawî Kurd* dike (24'ê Çiriya Pêşîn a 1913'an). Îro di destê me de hejmarê wê yên 1, 2, 3, 4, 4-5[5] û 10'an hene. Kovar, heta hejmara çara mehane, piştî wê jî serê panzdeh rojan carekê derketiye. Gava mehane bûye her hejmar 32 rûpel bûye, piştî ku dibe serê panzdeh roja tê şazdeh rûpelan.

Du hejmarên ewil ên kovarê li çapxaneya Resimli Kitab, ya çaran li çapxaneya Hikmet, ya 4-5 û deha jî li çapxaneya Necmî Îstîqbal çap dibin. Di hejmarên kovarê de şeş wêne hatine weşandin: Baban Ebdurehman Paşa (Bergê hejmara ewil), li Şamê malbatek Kurd (Bergê hejmara duyem), Babanzade Îsmail Heqqî Beg (Bergê hejmara seyem), Babanzade Asim Beg (Bergê hejmara çarem), Şêx Mihemed Nisredîn Efendî (Bergê hejmara dehem), Serekê Eşîra Terkan Mihemed Axa û maiyeta wî (Jimara dehem, rûpel 8).

Ji berga paşîn a hejmara 4-5'a em hîn dibin ku îdarexaneya kovarê li Şehzadebaşi, li kolana Fewziye, di avahiya Civata Hêvî de ye. Kovar li vir û li Kitêbxaneya Şefeq dihate belavkirin. Ev agahî di berga paşîn a hejmara dehemîn de jî tê nîşandan.

Piştî hejmara dehem a 3'yê Tîrmeha 1914'an weşana kovarê radiweste, lewra ji ber Şerê Cîhanê yê Yekem Dewleta Osmanî seferberî îlan dike û gelek endamên civatê jî wekî 'esker tevî vî şerî dibin.

Zinar Silopî dibêje ku piraniya mesrefên komeleyê û weşanên wê ji mezinên kurdan û bi rêberiya yek ji serekê kurdan Seyîd 'Evdilqadirê Nehrî (Kurê Şêx 'Ubeydullahê Nehrî) ji 'emeleyên kurd dihate temînkirin[6].

Naveroka Hejmarên Hetawî Kurd

Hejmar 1 (23 Zilqe'de 1331 / 11 Teşrînî Ewwel 1329 / 24 Çiriya Pêşîn 1913)[7]

Beşa Tirkî

- Hetawî Kurd Gazetesi Muharrirlerine, Dr. 'Ebdullah Cewdet, r.2-3

- Dersa'âdette Hetawî Kurd Cerîde-i Garrâsî Müdîriyet-i Aliyesine, Mes'ûd, r.3-8
- Kürd Gençlerimizden Bir Temennî, T., r.8-10
- Kürd Ulemâsına!, Kerküklü Necmeddîn, r.10-13
- Kürdistan Mektûbları -Malâtya-, Bênav[8], r.13-15
- Pûşîde-i Târîh, Kerküklü Necmeddîn, r.15-116

Beşa Kurdî

- Zemanê Hişyariye, Slêmanî Zîwer, r.17 (Helbest, soranî)
- Se'y Bikeyn, Zehawîzade E. M., r.18 (Pexşan, soranî)
- Ji Mezinê Kurdan ra ye, M. X., r.19-22 (Pexşan, kurmancî)
- Xeften Beseleme Ziyatir!, Benî Erdelanî E. M., r.23 (Pexşan, soranî)
- Şa'irî Baban û Soran[9], M. X., r.24-26 (Helbest, soranî)
- Paranewe Le Hemiyetmendanî Kurdan!, Hetawî Kurd, r.27 (Pexşan, soranî)
- Here Dûr Were Axûş, Mihemed Nûrî el-Mardînî, r.27-31 (Pexşan, kurmancî)

Hejmar 2 (4 Muharremu'l-haram 1332 / 21 Teşrînî Sanî 1329 / 4 Çileyâ Pêşîn 1913)

Beşa Tirkî

- Muhterem "Hetawî Kurd" Gazetesi Müessislerine, Mewlanzade Rif'et, r.2-3
- Fu'tebirû Ya Uli'l-Ebsar, Babê Naco, r.3-10
- Kürd 'Ulemâsına 2, Kerküklü Necmeddîn, r.10-13
- Kürdistan Mektûbları -Fırât Sâhili-, Bênav, r.13-14
- Pûşîde-i Târîh, Kerküklü Necmeddîn, r.15-117
- Kürdlük 1, Bitlîsî Şehab Malwer, r.17-18
- Hetawî Kurd -Şems-i Tulû'da-, Bitlîsî Şehab Malwer, r.18-19

Beşa Kurdî

- We'z, Necmeddîn Kerkûkî, r.20-22 (Pexşan, soranî)
- Qesîdey Kurdiyye Eserî Mehwî Efendîyî Slêmanî Le Wesfî Roja, r.22-25 (Helbest, soranî)
- Derdê Kurdan -nizanim çiyê paşvemane û roj bi roj paş ve diçin-, M. X., r.25-30 (Pexşan, kurmancî)
- "Kitêba Kurmanca" Ser Çîroka û Bajariya Kurmanca Du Sê Gotin, Zeko 'El, r.30-31 (Pexşan, kurmancî)

Hejmar 3 (13 Saferu'l-Xeyr 1332 / 29 Kanûnî Ewwel 1329 / 11 Çileyê Paşîn 1914)

Beşa Tirkî

- Zavallı Kürdlük ve Bir Ufûl, Hetawî Kurd, r.2-3[10]
- Kürdler ve Kürdistan, Babanzade Îsma'îl Heqqî, r.4-6
- Tercüme-i Hâli, Bênav, r.6-7
- Bedbaht Kürdler!, Kerküklü Necmeddîn, r.7-9
- Acı Bir Felâket Daha, Slêmaniyeli Ehmed, r.9
- Mersiye, Kerküklü Rasix, r.10 (Helbest)
- Hissî Hâdiseler ve Aklî Hâdiseler, Dr. 'Ebdullah Cewdet, r.11-12
- Büyüklerimiz, Law...[11], r.13-15
- Kürdistan Mektupları 3 -Harpût-Mezre-, Bênav, r.15-16
- Şerâit-i Sihhiye I, Harpûtlu H. B., r.16-18
- Kürd Gençlerine, Babanzade Ehmed Ref'et, r.18-19

Beşa Kurdî

- Babanzade Îsma'îl Heqqî Beg Wefat Kird, Kerkûkluzade Kerîm, r.20 (Pexşan, soranî)
- Bê Tali'ya Kurdan, Necmeddîn Kerkûkî, r.20-21 (Pexşan, soranî)

- Ji Qesîdeyê Hecî Rehmetî Têne Zanîn Ku, M. X., r.21-22 (Pexşan, kurmancî)
- Eûzu Billahî Mineşşeytanirrecîm, D..zade Mihemed Mîhrî, r.22-24 (Helbest, soranî)
- Dîwanî Merhûm Mehwî Efendî ye, r.25 (Helbest, soranî)
- Hilo Rabin Gelî Mu'mîn[12], Îbrahîm Heralûş, r.26 (Helbest, kurmancî)
- Mesteî Weten, Îsma'îl Heqqî Slêmanî, r.26-27 (Helbest, soranî)
- Ji Şêxan Gerwaza[13], Hecî Qadirî Koyî, r.28-30 (Helbest, soranî)
- Mekteb Çi ye, Qadîzade Mistefa Şewqî, r.30-31 (Pexşan, soranî)
- Tawî Hetawî Kurd, Bênav, r.31-32 (Pexşan, soranî)

Hejmar 4 (5 Cemaziyu'l-Ewwel 1332 / 19 Mart 1330 / 1 Nîsan 1914)

Beşa Tirkî

- Muzâ'af Te'essüflü Bir İrtihâl, Bênav, r.2
- Yine Bir Ziyâ'-ı Elîm, Bênav, r.3
- Fecî' Bir Hâdise, Bênav, r.3-4
- Erbâb-ı Hamiyet ve Himmete, Babê Naco M. X., r.4-7
- Kürdlerde Hiss-i Millî, Zehawîzade Y. Z., r.7-8
- İnneme'l-Mu'minûne İxwetun, 'Ebdulmecîd [Nûrsî], r.8-9
- Ey Hetawî Kurd Hey'et-i Muhteremesi, 'Ebdulmecîd [Nûrsî], r.9
- Kürdlükte Seyyâle-i Hayât, Baban 'Ebdulezîz, r.10-12
- Kardeşim Âsafa, Dersimli A. C. Riza, r.12-13
- -I- Uyan, Diyarbekirî M. N., r.14-15
- Hetawî Kurd Gazetesinin Muhterem Sâhibine, M. 'E. Mehmûd, r.15
- Hetawî Kurde Takdîm, Elhac Hesên Tehsîn Sîwerekî, r.16

Beşa Kurdî

- Bo Gewrekanî Kurd, Slêmanîyeli Zîwer, r.17 (Helbest, soranî)

- Qesîdeyî Rehmetî Hacî Qadirî Koyî, r.17-19, (Helbest, soranî)
- Eş'arî Merhûm Nalî, r.20-21 (Helbest, soranî)
- Mersiye Babanzade Îsma'îl Heqqî Beg, Mihemed Mîhrî, r.21-22 (Helbest, soranî)
- Tereqqîî Dînman Diwê..., Qadîzade Mistefa Şewqî, r.22-24 (Pexşan, soranî)
- Kurdistana Hitâb, Elhac Hesên Tehsîn Sîwerekî, r.24-25 (Helbest, kurmancî)
- Modanî M. X. -Gazindeê Kurdan-, Fuad Temo, r.25-26 (Helbest, kurmancî)
- Name[14], Mihemed Huseyn Xal, r.26 (Pexşan, soranî)
- Bismillahirrehmanirrehîm, Mihemed Şefîq [Erwasî], r.27-29 (Pexşan, kurmancî)
- Ji Bo Hetawî Kurd, Hemze[yê Muksî], r.29-30 (Helbest, kurmancî)
- Bismillahirrehmanirrehîm, Mihemed Zekî bin Mela Celî, r.30-32 (Helbest-Pexşan, kurmancî)

Hejmar 4-5 (27 Cemaziyu'l-Axir 1332 / 10 Mayıs 1330 / 23 Gulan 1914)

Beşa Tirkî

- (Kürd Talebe Hêvî Cem'iyeti)nin Beyânnâmesidir., Kürd Talebe Hêvî Cem'iyeti, r.1-4
- Kürd Talebe Hêvî Cem'iyeti Lozan Şu'besi, Bênav, r.5-7
- Şerâit-i Sihhiye II, Harpûtlî H. B., r.7-9
- Kürdlük İçin, Slêman Asef, r.9-10

Beşa Kurdî

- Beyana "Civata Hêvî" Feqeê Kurdan, Civata Hêvî Feqeê Kurdan, r.11-14 (Pexşan, kurmancî)
- Beyanamey Cem'iyetî Talebey Hîwî Kurd, r.15-16 (Pexşan, soranî)

Hejmar 10 (9 Şe'ban 1332 / 20 Hezîran 1330 / 3 Temmûz 1914)

Beşa Tirkî

- Hêvî ve Gençlik, Hetawî Kurd, r.2-4
- Kürdistan Mektûbları -Sîwerek-, Cindo, r.4-7
- Hetawî Kurd Risâlesine, Manisada Kürd Kızı Kewser, r.7-9

Beşa Kurdî

- Nehcu'l-Enamu'l-Kurdî, r.10-12 (Pexşan, kurmancî)
- Mela Ehmedê Cizîrî bona Pêxemberê Axirzeman Gotiye, r.12-13 (Helbest, kurmancî)
- Mersiye, Şêx Hemze Himmetullah, r.13-14 (Helbest, kurmancî)
- Ey Şa'irê Şêrîn Ziman Rûmî Tahiru'l-Mewlewî, Babê Naco M. X., r.14-15 (Werger, Helbest, kurmancî)
- Diyarî Hetawî Kurd (Le Kerkûkewe), Tahir Fuad, r.16 (Helbest, soranî)
- Dilmayin, Fikrî Necdet, r.16 (Helbest, kurmancî)

Li gorî vê listeyê tabloyeke bi vî awayî derdikeve holê:

Ziman	Helbest	Pexşan	Giştî
Tirkiya Osmanî	1	42	43
Kurdî (Kurmancî)	8	9	17
Kurdî (Soranî)	12	11	23
Giştî	21	62	83

Li Gor Naverok û Statîstîkan Çend Têbînî

1. Nivîsên tirkî ji bilî yekê -ew jî mersiyyeyeke ku li ser mirina Babanzade Îsmail Heqqî hatiye gotin- tev pexşan in lê di nivîsên kurdî de helbest û pexşan bi sêra hev in. Ya rastî ev ji aliyê edebiyatê

ve dewlemendiyek e lê ji aliyekî din ve jî diyar dike ku di kurdî de serdestiya helbestê didome û kevneşopiya pexşana kurdî hê xurt nebûye.

2. Di *Hetawî Kurd* de, bandora malbata Babanzadeyan aşkere xuya dike: Mudîrê kovarê Baban ‘Ebdulezîz e. Di bergê hejmara yekem de wêneyê Baban ‘Ebdurrehman Paşa, di jimara seyem de yê Babanzade Îsmâil Heqqî Beg, di hejmara çarem de yê Babanzade Asim Beg heye. Nivîsên hejmara sêyem pîranî li ser wefata Babanzade Îsmâil Heqqî Beg in. Balkêşiyek din eve ku li gorî *Rojî Kurd*, di *Hetawî Kurd* de hejmara nivîsên soranî pir in û di *Hetawî Kurd* de tu nivîskarên ji malbata Bedirxaniyan tune ye. Wekî tê zanîn Bedirxaniyên kurmanç û Babaniyên soran du malmatên mezin ên Kurdistanê ne ku piştî tesfîyekirina mîrektiyên Kurdistanê sirgunî Stenbolê dibin û li vir pêşengtiya tevgera rewşenbîriya kurd dikin. Agahiyên li jor pirsekê tîne bîra însan ku “Gelo di navbera van her du malbatan de berberiyek hebû û betalbûna *Rojî Kurd* yan jî guherîna wê ya *Hetawî Kurd* bi vê berberiyê re têkildar e?” Ya rastî di destê me de hemû hejmarên *Hetawî Kurd* nîn in, ihtîmale ku ew hejmarên wînda van angaştên me pûç bikin lê li gorî daneyên mewcûd ev pîrs ne dûrî aqilan e.
3. Di hin nivîsên kovarê de nivîskaran navên mustear bi kar anîne. Bi taybetî du kes di vî warî de derdikevine pêş: Xelîl Xeyalî û Mihemed Mîhrî. Xelîl Xeyalî navên Babê Naco û M.X bi kar tîne. Wî di *Rojî Kurd* de (hejmar 2, rûpel 28) navê “Modanî X” jî bi kar anîye. Cutyar Toûfîk Hawramî neql dike ku Mihemed Mîhrî ji bilî navê xwe yê rastî îmzeyên wekî Zehawîzade E.M, Benî Erdelanî E.M bi kar anîne.^[15] Di *Hetawî Kurd* de bi van her du navan jî nivîs hene. Lê Malmîsanîj E.M wekî [E]hmed [M]uhsîn xwendiyê û der heqê têkiliya vê îmzeyê û Mihemed Mîhrî de tu agahî nedaye.^[16] Di *Hetawî Kurd* de derbas nabe lê nivîsên Mihemed Mîhrî yên bi mustearên Mîhrî, Kakaheme, Îrfan, Dawer Erdelanî jî hene.^[17] Her wiha wî di kitêba xwe ya *Muqeddîmetu’l-Îrfan* de (Stenbol, 1918) navê xwe wekî “M.M” nivîsiye.^[18]
4. Şexsiyetekî Kurd heye ku ew bi nivîsên xwe di *Hetawî Kurd* de cih nagire lê siya wî aşkere xuya dibe: Bedîuzzeman Seîdê Kurdî. M.X (Xelîl Xeyalî), Hemzeyê Muksî, Mihemed Şefîq Erwasî, Mihemed Mîhrî û ‘Ebdulmecîdê Nursî ku nivîs û helbestên wan di kovarê de hatine weşandin, her pênc jî şagirtên Bedîuzzeman in. Ji wana Hemzeyê Muksî, Mihemed Şefîq Erwasî û ‘Ebdulmecîdê Nûrsî, li Wanê di Medreseya Horhor de ji Bedîuzzeman ders standine.

‘Ebdulmecîdê Nûrsî jixwe birayê piçûk ê Bedîuzzeman e. Mihemed Mîhrî û Xelîl Xeyalî jî piştî ku Bedîuzzeman tê Stenbolê dibine şagirdê wî û Mihemed Mîhrî di heman demê de dibe parêzvanê Bedîuzzeman.[19] Balkêşe Hemzeyê Muksî, Mihemed Şefîq Erwasî, ‘Ebdulmecîdê Nûrsî û Îbrahîm Heralûş di kovarê de îmzeyê xwe wekî “Şagirtên Medreseya Reşadiya Zehra (Medrese-i Zehrâ-yî Reşâdiye)” diavêjin. Em dizanin ku Medreseya Zehra, projeyeke Bedîuzzeman e, ew dixwazê wê li Wanê ava bike û tê de hem ‘ilmên fenî hem jî yên dînî bi hev re û bi zimanên kurdî, tirkî û ‘erebî bêne xwendin. Di sala 1914’an de Waliyê Wanê Hesen Tehsîn, agahiyê dide ku bi alîkariya Wezîrê Ewqafê Xeyrî Beg li Wanê dest bi çêkirina Medrese-i Zehrâ-yî Reşâdiye hatiye kirin. Lê der barê encama wê de agahiyên me tune ne.[20]

Parçeyên Bijarte yên Xwendinê

Derdê Kurdan[21]

1. X. (Xelîl Xeyalî)

“Dinyayê da çîqa millet heye hemî pêş ve çûne û roj bi roj pêş ve diçin. Ji van kurdê reben, belengaz tenê ba-wûcûdê mêranî û ciwamêrî û xîret paşve mane û roj bi roj paş ve diçin.

Ji xala min we ye ku her millet di wextê xo da şiyar bûye, muhtaciya qewmê xo dîtiye, zû bi zû li çare wê geriyaye her çî ji destê wî hatiye çêkiriye û çêdike. Kurd, di xeweke wisan da maye ku tu car şiyarbûn û pêşçûn bîra xo neaniye.

Eger şiyarî û pêşçûnî bîra xo bianiya heya niha wekî milletê dî li zimanê xwe xweyî dibû, ewwel bi ewwel bi zimanê xo kitêban çêdikir û bi zimanê xo xwendin û nivîsandin dikir.

Temamê dinya dizanê ku qewmê bê ziman, wekî mirovê ker û lal tu tiştêk nikare bêje. Eger mela û feqê kurdan, ew xîret û xebata[22] ku li zimanê xerîban kirine û dikin ji sedan yekê wê der heqî zimanê kurdî da bikiran îro di nav xelqê da bê ziman û bê me’arîf nediman û herkes te’nan li me nedida.

Kurd ji bê ziman û xwendinê û nivîsandinê wisan nezan maye ku miletê xo, bav [û] kalê xo, cinsê xo, welatê xo nizanê. Melayê wan şîretan li wan nake. Daîma li xirabiya hev digerin, çavê wan dinya û halê dinyayê nabînê.

Nezan ji xo nezan e, zanayê wan jî ji zimanê xo bê xeber e. Ji xala wî we ye ku zimanê temamê miletê ‘alem ji ezmanan hatiye, ya me tenê ji ‘erdê derketiye.

Hal ew e ku zimanê me ji giştê zimanê ‘alem çêtir e û bi rehetî tê nivisandin û xwendin, edebiyata me heye, feqet ji nezaniya me bê rewac maye.”

Rave: Xelîl Xeyalî, di sala 1865’an de li navçeya Bedlîsê Modkan, li gundê bi navê Zender hatiye dinê. Navê bavê wî Yûsif Axa ye. Ew li mekteba meheli ya Bedlîsê û li medreseyan dixwîne û di şazdeh saliya xwe de dîsa li Bedlîsê dest bi memûriyetê dike. Di sala 1890’î de bo bidestxistina mufettiştîyê tê Stenbolê û li vir jî di gelek memûriyetan de dişuxile. Di dawiya sala 1911’an de tayînî Mekteba Zîraetê a Xelkelî (Halkalı) dibe.[23] Jixwe Civata Hêvî, li vê mektebê û bi teşwîqê Xelîl Xeyalî ava dibe.[24] Di *Rojî Kurd û Hetawî Kurd* de nivîsên wî pir in. Em bi rehetî dikarin bibêjin ku di nav nivîskarên *Rojî Kurd û Hetawî Kurd* de yê ku kurmançî herî baş bi kar tîne Xelîl Xeyalî ye. Ew di warê ziman de pir hesas e û girîngiyeke mezin dide xwendin û nivîsandina bi kurdî. Wî ev hesasiyeta xwe di pratîkê de jî nîşan daye û kitêbeke bi navê *Elifbayê Kurmançî* amade kiriye. Ev kitêb di sala 1325/1909’an de ji aliyê Kurdîzade Ehmed Ramiz ve li Stenbolê tê çapkirin. Ev yekemîn alfabeya Kurdî ya bi tîpên ‘erebî ye.[25]

Hetawî Kurd Risâlesine[26]

Manisada Kürd Kızı Kewser

“Âcizeleri Baban kabîlesinden bir Kürd kızım. Henüz mekteb-i i’dadîde tahsilde bulunuyorum. Pederim cerîde-i ferîdenize abonedir. Ayda bir kere gelen gazeteyi okuyoruz. Mündericâtı mensûb olduğumuz kavmin terakkîsine hıdmet itdiğinden seviniyoruz. Ba’z sûzişli makâlelerini, ‘ale’l-husûs dördüncü numrodaki âteşîn bir kalemlle yazılan makâleyi okudukca te’essürden ağladık. Ve

Sawucbulaglı Qadizade Mistefa Şewqî Efendi tarafından (Tereqqîî Dînman Diwê) makâlesini pederim tercüme iderek bize anladınca ne kadar doğru ve iyi yazıldığını anladım.”

Rave: Di *Hetawî Kurd* de tenê nivîskarek jin heye, ew jî Kewser e. Nivîsa Kewser, nameyek e ji kovarê re ku tê de wekî xwendevan fikrên xwe beyan dike.

Ji nivîsa wê xuya dike ku Tirkîya Kewserê pir baş e lê bi Kurdî nizane, lewra dibêje: “Nivîsa Qadîzade Mistefa Şewqî Efendi bavê min ji me re tercüme û rave kir û wê gavê me fehm kir ku ev nivîsek rast û baş e.” Qadizade Mistefa Şewqî Efendi ew nivîsa xwe bi kurdiya soranî yan jî bi gotina wê demê Babanî nivîsiye. Wekî keçeke Kurd ji êla Babanan hewce bû Kewserê ev nivîs bê tercüme fehm bikira. Diyar e ku ew pirsgirêka ku ciwanên kurd bi zimanê xwe nizanin wekî îro wê demê jî hebûye. Civata Hêvî ji bo ku vê pirsgirêkê çareser bike kitêbeke bi navê “Hînkerê Zimanê Kurdî” di sala 1921’ê de li Stenbolê çap dike.[27]

Ey Şa’îrê Şêrîn Ziman Rûmî Tahiru’l-Mewlewî[28]

Tahiru’l-Mewlewî, Wergêr: Babê Naco M. X (Xelîl Xeyalî)

Kulağında küpe olsun unutma

Rûmelinin dağı taşı ağlıyor

Kan içinde her su başı ağlıyor

Parçalanmış gövdelerin yanında

Tercüma wê

Bîr meke bila di goy te da guwar be

Dar û berê Rûmîlî digrî

Di nav xwîn da her çem û kanî digrî

Li bal cendek di parî bûyî

Rave: Tahiru'l-Mewlewî yan jî bi navê xwe yê fermî Tahir Olgun (1877-1951), yek ji helbestvan û rewşenbîrê tirk e[29]. Wî, ev helbesta xwe li ser goçberên Rûmelî ku piştî şerê Balkanan mecbûr mane warê xwe biterikînin û werin nav sînorên Osmanî gotiye. Ev helbest, ji aliyê Civata Goçberên Misilman ê Rumelî (Rumeli Muhacirîn-i İslâmiye Cemiyeti) ve wekî broşûreke mezin çap dibe û bo alîkariya wan goçberan tê firotin.[30] Xelîl Xeyalî jî ev helbesta Tahiru'l-Mewlewî 28'ê Sibata 1914'an wergerandiye Kurdî û ev, tevî orîjînalê wê di dehemîn hejmara *Hetawî Kurd* de tê weşandin. Helbest ji şeş çarînan pêk tê. Di kovarê de wekî du stûnan çap bûye. Li stûna rastê orîjînalê helbestê, li aliyê çepê wergera wê ya kurdî cih digre.

Xelîl Xeyalî di *Rojî Kurd* de jî helbesteke Mehmed Akîf wergerandibû.[31] Her çiqas îro ji ber ku Merşa Serxwebûnê ya Komara Tirkî (İstiklal Marşı) nivîsandiye wekî “Şairê Millî” bê binavkirin jî Mehmed Akîf wê demê yek ji parêzvanê fikra Îslamî bû û îttîfaqa misilmanan diparast. Wî rexne li nezani, kasûlî û xemsariya misilmanan dianî û ev yek di helbestê wî de ya ku Xelîl Xeyalî wergerandiye jî xuya dike:

*Li kû ye mislimanî! Ji me boriye heta merivayî
Ger xelq xapandine meqsed: kes nake bawerî
Çend misilmanî heqîqî min dî: hemû li qebrê da ye
Misilmanî, nizamî heye ema xala min di heşrê da ye[32]*

Ev werger ji du aliya ve girîng in: Yek, fikriyata Xelîl Xeyalî ya wê demê nîşanî me didin. Em dibînin ku ew nêzî fikra Osmanî û Îslamî ye. Ew dixwaze fikra Kurdayetiyê di nava van her duyan de bi cih bike. Nêrîna wî li bûyerên der barê qedera Osmanî de nêzî fikra rewşenbîrên tirk e. Ya duyemîn jî ev metn di dîroka wergera kurdî de ji mînakên ewilîn in. Diyar e ku Xelîl Xeyalî, rewşenbîrêkî piralî ye û aliyê wî yê wergêriyê li benda lêkolînê ye.

Encam

Yek ji çavkaniyên sereke yên kurdiya nivîskî kovar û rojname ne. *Hetawî Kurd* jî, di dîroka çapemeniya kurd de ji mînakên ewil e. Bi tîpguhêzî û weşana *Hetawî Kurd* û yê din wê hê gelek xezîneyên veşartî ji xwendevan û lêkolînerên Kurd ve aşkere bibin.

- [1] Zinnar Silopi, di kitêba bi navê *Doza Kürdüstan* de (Çapxana Stewr, Bêrût, 1969, r.35) dibêje ku berpirsiyarê *Hetawî Kurd* Hemzeyê Muksî bûye. Lê ev xelet e, Hemzeyê Muksî demekê berpirsiyariya kovara *Jîn* kiriye lê ya *Hetawî Kurd* nekiriye.
- [2] M. Emîn Bozarslan, *Jîn Cild I*, Weşanxaneya Deng, Stockholm, 1985, r.123
- [3] Civata Hêvî Feqeê Kurdan, *Beyana "Civata Hêvî" Feqeê Kurdan*, hejmar 4-5, r.13
- [4] M. Emîn Bozarslan, berhema navborî, r.123
- [5] Ji bilî hejmara çarem a serbixwe hejmara çar û pêncan bi hev re jî derketiye.
- [6] Zinnar Silopi, *Doza Kürdüstan*, Çapxana Stewr, Bêrût, 1969, r.36
- [7] Me dîroka jimarên kovarê bi teqwîma hicrî, rûmî û mîladî nîşandan. Ji bo ku teqwîmên hicrî û rûmî wergerînin mîladî me "Takvim Çevirme Kılavuzu" bi kar anî. Bnr. <http://193.255.138.2/takvim.asp?takvim>. Di vê wergerandinê de -bela ku nêzikî teqwîma Kurdî ye- me teqwîma rûmî esas girt.
- [8] Nivîsên ku dibin de nav ne hatibe nivîsin me wekî "Bênnav" nîşan dan.
- [9] Di vê nivîsê de M. X. ango Xelîl Xeyalî çar helbestê Hecî Qadirî Koyî dane hev, di bin de bi têtîniyekê nîşan daye ku hewceye şairên kurdan yek bi yek bîn lêkolînkirin, biyografiyê wan bête nivîsîn da ku winda nebin.
- [10] Malmîsanij&Mehmûd Lewendî (1992, r.62), dibêjin ku ev nivîs ji aliyê Hîzanîzade Kemal Fewzî ve hatiye nivîsin. Lê ya rastî dibin nivîsê de navê Hetawî Kurd heye.
- [11] Min ev nav tê dernexist.
- [12] Di kovarê de sernavê vê helbestê tune bû, min jî risteya awil wekî sernav bikaranî.
- [13] Di kovarê de tê gotin ku ev helbest perçeyek ji nivîsa "Ji Qesîdeyê Hecî Rehmetî Têne Zanîn Ku" ye lê bi xeletî jê cuda çap bûye.
- [14] Ev nivîs di kovarê de bê sernav e. Ev nameyê ku hikimdarê Sawucbulagê (îro Mehabad) Babamîrî Muhammed Huseyin Xal şandiye.
- [15] Cutyar Tofîk Hawramî, **Yadêk Le Mihemmed-î Mihri**, <http://www.saradistribution.com/mihri.htm>, 16.06.2012
- [16] Malmîsanij; Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2002, r.156
- [17] Veysel Aydeniz, *Bediüzzaman Said-i Nursî'nin Kürt Aydınlarıyla Olan İlişkileri*, Vefatının 50. Yılında Uluslararası Bediüzzaman Said Nursi Sempozyumu, Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol, 2011, r.352

- [18] Bo tîpguhêzî û agahiyên derbarê wê de binerin: *Mehmet Mihri Hilav (M. M)/ Mukaddimet-ûl Îrfan*, <http://www.kovarabir.com/mehmet-mihrim-m-mukaddimet-ul-irfan/>, 19.05.2012
- [19] Veysel Aydeniz, Heman Berhem, r.351-352
- [20] Mehmet Bayrak, *Said-i Kurdî Ve Kürt Sorunu – II*, <http://www.kurder.dk/nuce/2012/04/14/surgun-ve-hapisle-gecen-bir-omur/>, 19.04.2012
- [21] Hetawî Kurd, Hejmar 2, r.25-26. Tîpguhêziya vê metnê mamoste Tahir Baykuşak çêkir, jê re spasdar im. Di orîjînalê metnê de xalbend pir şaş hatine bikaranîn, me ew serast kirin.
- [22] Di orîjînalê metnê de wekî “xata” hatiye nivîsîn lê diyare ku ew xelet e.
- [23] BOA. DH.SAİDd, 84/409, bo tîpguhêziya sîcillî ehwala Xelîl Xeyalî binerin: **Malmîsanij, Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbakir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920), Weşanxaneyî Vateyî, Stenbol, 2010, r.126-129**
- [24] Zinnar Silopi, heman berhem, r.28
- [25] Mamoste Qedrî, *Xelîl Xeyalî*, <http://www.kovarabir.com/xelil-xeyali/>, 18.05.2012
- [26] Hetawî Kurd, Jimar 10, r.7
- [27] Hîinkerê Zimanê Kurdî -Rehberê Zimanê Her Du Kurdî: Kurmancî-Babanî, Çapxana Necm-î İstiqlal, Stenbol 1921, 64+1 r. Tîpguhêziya vê kitêbê ji hêla Koma Xebatên Kurdî di Çavkaniyên Osmanî (bi navê xwe yê nû Koma Xebatên Kurdolojîyê) ve hat amadekirin û ji aliyê Weşanxaneyê bgstê ve hat çapkirin. (Stenbol, 2008)
- [28] Hetawî Kurd, Jimar 10, r.14-15
- [29] Derheqê jiyana Tahir’ül-Mewlewî de bo agahiyên berfirehtir binerin: Tahir’ül-Mevlevî Hayatı ve Eserleri, Dr. Atilla Şentürk, Weşanên Nehir, Stenbol, 1991
- [30] Emin Akdağ-Haşim Söylemez, Sürgün yurdu Anadolu, kovara Aksiyon, jimar 494 <http://www.aksiyon.com.tr/aksiyon/haber-9495-34-surgun-yurdu-anadolu.html>. 16.04.2012
- [31] Malmîsanij, Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti, Weşanxaneyê Avesta, Stenbol, 2002, r.100
- [32] Rojî Kurd, jimar 2, r.32. Bo orîjînalê helbestê binerin: Safahat, Amadekar: M. Ertuğrul Düzdağ, Weşanên Çağrı, Stenbol, 2006, r.286

Pere yan dirav, meydan an qad, zengîn an dewlemend...?

Di kurdî de gelek peyv hene ku xelk ji mêj ve bi kar tîne û her kes jê fehm dike lê dîsa jî nivîskarên kurd û medyaya kurdî ji wan direvin û xwe dispêrin bikaranîna hin peyvên din ku ji piraniya kurdîaxivan an kurmancîaxivan re nenas û xerîb in.

Kerem bikin em bi hev re li çend nimûneyan binêrin:

- pere/pare, meydan, zengîn

Ev peyv li hemû deverên kurmancîaxiv hene û her kurmancîaxivekî sade jî wan fehm dike. Lê ji ber ku ew heman peyv bi şiklê "para, meydan, zengin" di tirkî de jî tên bikaranîn, gelek nivîskar û medyakarên me ji van peyvên direvin û van peyvên li cihê wan dinivîsin:

- dirav (pere/pare)
- qad (meydan)
- dewlemend (zengîn)

Sebebê meyla bikaranîna peyvên wek "pere/pare, meydan, zengin" ji aliyê nivîserên kurd ve ew e ku yan ew texmîn dikin ev peyv bi eslê xwe tirkî ne yan jî li eslê van peyvên nafikirin lê dixwazin kurdî bi her awayî ji tirkî cuda be. "Hema bila ne wek tirkî be, çi dibe bila bibe."

Lê di rastiyê de peyvên "pere/pare, meydan, zengin" hemû bi eslê xwe kurdî-îranî ne. "Pere/pare" û "zengîn" yekser ji zimanên îranî (ihtimalen ji farisî) wek "para" û "zengin" ketine tirkî. "Meydan" hê ji zû ve ji pehlewî (ku zimanekî îranî bû) ketiye erebî û ji erebî derbazî tirkî jî bûye. Heman peyv bi şiklê "miyan" (bi maneya "navber, navbeyn") niha jî di farisî û zazakî de maye.

Lê herçi peyvên "dirav, qad, dewlemend" in – ku gelek nivîserên me wek "peyvên kurdî yê resen" texmîn dikin û bi kar tînin – di rastiyê de her sê jî bi eslê xwe biyanî ne.

Peyva "dirav" ji mêj ve ji yûnanî "draxma" hatiye, bi demê re X jê ketiye û M jî di kurmancî de bûye V wek çawa ku M-ya paşvokalî di gelek peyvên din de jî di kurmancî de bûye V. Bo nimûne, kurmancî "nav, gav, dav" lê farisî û zazakî "nam-, gam, dam".

Peyva "qad" bi zelaî ji erebî hatiye. Peyva "dewlemend" jî vê dawiyê bi rêya soranî ketiye kurmancî. Lê soranî jî ne ji mêj ve ew ji farisî wergirtiye. Farisî jî ew ji peyva "dewle(t)" ya ji erebî û ji paşgira "mend" ya îranî çêkiriye.

Bi gotineke din, eger mirov li pey kurdiyeke "paqij" be, divê mirov peyvên wek "pere/pare, meydan, zengîn" bi kar bîne, ne peyvên wek "dirav, qad, dewlemend. Bi taybetî jî eger mirov bixwaze wî zimanî bi kar bîne xelk wek zimanê xwe dibîne û tê digihe.

ZIMANÊN KURDAN

Mem Wêrani

Akedemîsyenê Zanîngeha Harvardê û nivîskar Dr. Amr Taher Ahmed da zanîn ku kurmancî, soranî, goranî, lûrî û zazakî xwedî rêzimanên cuda ne û ew ne zarava ne.

Taher eşkere kir, “Ji têkstên me yên edebî jî wisa xuya dibe ku helbestvanên kurdan hay ji berhemên hevdu nedibûn. Di edebiyata klasîk a goranî û soranî de karî bandora helbestvanên fars mîna Hafiz, Sedî û Nizamî peyda bikî, lê qet ti peywendiyekê di navbera wan û mezinê helbestvanên kurmanc mîna Cizîrî û Xanî de nabî!”

Nivîskar, kevntirîn tekstên edebîya kurdî destnîşan kir û got, “A ku em heta niha ji belgeyên zanistî yên bawerpêkirî dizanin ew e ku kevntirîn tekstên edebiyata kurdî bi kurmancî ne.”

Kurdan yekemîn car bi kîjan zaravayê nivîsandine?

Mirov dikare bersiva vê pirsê bi du awayên cuda bide. Ew cudahî jî li gorî têgeha mirov û paşxana wî ya îdeolojî û zanistî tê; girêdayî wê çendê ye ka kîjan ji wan du cemseran di paşxana hizrî ya mirov de pirrengtir û bisengtir e.

Bi gotineka din, mirov dikare bi awayekî zanistî û akademîk li pey belgeyên berdest hewla bersivdana vê pirsê bide; dikare jî bi awayekî neteweperestane li vê pirsê binêre û li bersivê bigere, lê dibe ku bersivê wiha ji aliyê akadêmîk ve neyê pejirandin.

Di sedsaliya çûyî de, dîrok, kiltûr û çanda gelê me li hemû perçên Kurdistanê li ber gefên jinavçûn û nemanê bûn. Bi giştî, dema gelek dikeve rewşeka wiha, hemû hewla xwe dide xwe ji wê metirsiyê rizgar bike; dikeve meydana xebatê da ku dîrok û çanda xwe ji nemanê biparêze.

Kiryarên zordanan rengvedanên tund li pey xwe anî

Ev, diyardeka siruştî ye ku di nava hemû gelên bindest de heye. Di rewşeka wiha de dijwar e, kiryarên tundên zordanan rengvedanên tund jî li cem gelên bindest li pey xwe tînin. Her çend zulm û zorî zêdetir be, neteweperwerî jî li cem gelê bindest bêhtir dibe û gelek caran jî digihije tixûbê neteweperistî û zêdegaviya hizrî jî.

Mebesta min ji vê pêşgotinê ew e ku bibêjim, beşê herî sereke ji dîroka edebiyata me kurdan bi destê xebatkarên kurd û di qonaxên herî dijwar ji dîroka gelê me de bi îmkanatên gelek kêr û bi awayekê ne akadêmîk hatiye nivîsîn. Rast e, pêdivî ye ku em rêzê li xebat û mandîbûna wan bigirin.

Lê, em divê vê yekê jî bizanin ku ew xebat di rewşeka ne asayî de bêhtir ji bo selmandin û parastina hebûna gelê kurd wekî gelekî xwedî ziman û çand hatiye kirin. Lewma jî, gelek caran wekî karvedanek dijî zordariyê û siyasetên tunekirinê reng û rûyê neteweperistiyê bêhtir ji zanistî û akadêmîk bûnê û di wan berhemana de xuya dibe.

Neteweperwerî dibe sedema dûrketina rastiye

Ez nabêjim neteweperwerî tiştê xirab e. Lê dema di xebateka lêkolîna zanistî de hesta neteweyî cihê pîver û mîkyasên zanistî û akadêmîk digire, wê gavê tiştên jê berhem tînin hinek caran ji rastiye dûr dikevin. Mebesta min ji akadêmîk bûnê ew e ku di karê zanistî de hin rêbazên rast û durist ên lêkolînê hene ku em di akademyayê de fêr dibin.

Nivîsîna dîroka edebiyata gelan jî ji bizava lêgerîn, nivîsîna akadêmîk û zanistî cûrek e. Lewma eger di wê xebata lêgerîna rastiyan de ew rêkar bêne peyrewkirin, encam her çî bin, wê bibin cihê baweriyê û hemû kes wê qebûl bikin. Her karekî lêkolîna edebî ji wê rêkara rast jê bibe û der bixe, dê bibe cihê gumanê.

Li ser posta xezalê helbestên Belûlî

Bo mînak, lêkolerekî Rojhelatê Kurdistanê bi navê Sedîq Borekeyî (Sefîzade) di bergeya yekê ya pirtûka xwe Mêjûy wêjey kurdî de dibêje ku yekem helbestvanê kurd Balûlê Mahî ye ku, bi gotina wî, di sala 146ê koçî de (sedsaliya 8ê zayînî) ji dayik bûye û çawarîne bi kurdiya goranî nivîsiye.

Borekeyî di nivîsîna xwe de wisa nîşan dide ku piraniya gotinên xwe ji pirtûka olî ya Serencam a kurdên yarsan wergirtine. Her di wê pirtûka xwe de hinek helbestan ser zarê Balûlî belav dike. Lê di lîsta jêderên xwe de wisa dide xuyakirin ku parçeyeka postê xezalê li ber destê wî ye ku helbestên Balûlî li ser hatine nivîsîn.

Îcar kesê ku neteweperest be, dê wê axiftinê wekî rastiyeke vebir werbigire, bipejirîne û gelek pê dilxweş jî bibe ku edebiyata me kurdan ew qas kevnar e. Lê di nivîsîna Borekeyî de ji aliyê akademîk û zanistî ve gelek gotinên şaş û berguman hene ku ti bihayekî ji bo nivîsîna wî nahêlin. Bo mînak, hin pirsên zanistî ku ji xwendina wê nivîsê dikeve serê kesekê akademîk ev in:

Ew postê xezalê li kuderê ye? Li kîjan muzexane, akadêmiya, mizgeftê yan malê tê parastin? Çima heta niha wêneyekî wî neketiye ber destê me xwandevanan? Eger rast e ew parçe kevilê xezalê heye, kîjan lêkoler û pisporê akademîk li kîjan labaratûwarê lêkolîneka zanistî li ser kiriye da bizane ka ew kevl çend kevnar e û bo kîjan serdama dîrokî vedigere? Mirov dikare ji aliyê zimanê helbestê ve jî wî rexne bike: Eger Balûl lûr e, çima çarîneyên wî bi kurdiya goranî ne?

Di berdewamiya pirtûka xwe de, Borekeyî her bi wî awayî lîsteka dûr û dirêj ya helbestvanên Lûristanê dide nasîn ku helbestên wan tev bi kurdiya goranî hatine nivîsîn. Lê ew cûre nivîsîna berhemê îdeolojiya neteweyî û ne şarezayî ya wî di rêbazên lêkolîna zanistî de ne û ji aliyê akademîk ve cihê baweriyê nîn in.

Destnivîsên goranî ji sedsaliya 18an kevintir nîn in

Ji kurdî ya goranî gelek destnivîs heta niha hatine dîtin ku piraniya wan kilamên olî yên kurdên yarsan in. Mixabin, li dawiya gelek ji wan destnivîsan dîroka nivîsînê nehatiye tomar kirin û karê dîrokvanên

edebiyata kurdî bi vê çendê bi zehmet ketiye. Lê şarezayên akademîk yên ku karê zanistî li ser teknîk û kereste (kaxez, rênivîs...) yên wan destnivîsan kirine, di wê baweriyê de ne ku heta niha ti destnivîsên goranî ji sedsaliya 18an kevintir nîn in.

Marîf Xeznedar dîroknivîsekî din ê edebiyata kurdan e. Ji ber ku ew li akademiya Sovyetê perwerde bûbû, kêmasiyên pirtûka wî ji yên Borekeyî gelek kêmtir in. Xeznedar di pirtûka xwe de, Mêjûy edebî kurdî, behsa Mela Perîşanê Dînewerî dike ku, bi gotina wî, di sedsaliyên 14an û 15an ya zayînî de (1356-1421) jiyaye û dîwanek bi kurdî ya goranî nivîsiye.

Xeznedar dibêje ku destnivîseka Mela Perîşan li zanîngeha Nuremberg li Almaniya tê parastin. Lê di berdewamiya nivîsîna wî de diyar dibe ku wî bi xwe ew destnivîs nedîtiye û bi tenê çapeka dîwana Mela Perîşan li ber destê wî bûye ku, bi gotina wî bi xwe, li ber rûnivîseka sala 1915an a dîwana Mela Perîşan hatiye berhevkerin û çapkirin.

Heta ku ew destnivîs û naveroka wê bi duristî neyên piştraskirin û lêkolînên hûr li ser neyên kirin, mirov nikare bi piştrastî biryarê li ser duristiya zanyariyên jiyana Mela Perîşan û kevnariya dîwana wî bide.

Kevntirîn tekst ên bi Kurmancî ne

Bi dîtina min, a ku em heta niha ji belgeyên zanistî yên bawerpêkirî dizanin ew e ku kevntirîn tekstên edebiyata kurdî bi kurmancî ne. Berhemê ji hemûyan kevintir jî helbestên Elî Herîrî ne ku li sedsaliya 16an (1530-1600) li devera Şemzînan a Bakûrê Kurdistanê jiyaye. Piştî wî, berhemên Feqiyê Teyran, Mela Ehmedê Cizîrî û Ehmedê Xanî tînan ku kevnariya wan bi belge û bi awayekê zanistî hatiye piştrast kirin.

Tê gotin ku edebiya kurdî ji ya farsî kevntir e, gelo ev rast e?

Bersiva vê pirsê jî her dikeve ber ronahiya bersiva pirsê pêşiyê. Li gorî belgeyên berdest û bawerpêkirî, edebiyata farsî gelek ji edebiyata me kurdan kivntir e. Eger em bi tenê behsê çaxê piştî

hatina Îslamê bikin, yekem helbestên farsî di sedsaliyên 9 û 10ê zayînî de peyda bûne. Anku, edebiyata farsî ya piştî hatina îslamê ji edebiyata kurdî ya wî çaxî bêhtirî pêncsed salan kevintir e.

Çima edebiyata klasîk a farsî gelekî dewlemend tê zanîn?

Edebiyata klasîka farsî yek ji zengîntirîn edebiyata devera me ye. Lê ev çend, qet û qet ne ji ber ciwanî yan hêjayî ya ziman û edebiyata farsî ye. Zengîniya edebiyata farsî bi dîtina min bi tenê bo komeka faktorên dîrokî (siyasî, aborî, civakî û çandî) vedigere. Fars berî peydabûna îslamê xwedî împaratoriyan bûn ku yek ji wan Împaratoriya Sasanî bû.

Bi giştî eger gelek desthilata siyasî hebe, wê çaxî kiltur û çanda wî jî dê xurt bibe û bibe xwedî navûbang û bandoreka mezin. Ti kes di nava kurdan de beriya seydayê mezin Ehmedê Xanî negehiştîye vê rastiyê.

Hêza siyasî edebiyatê binavûdeng dike

Ew di pêşgotina Mem û zînê de dibêje: “Ger dê hebuwa me jî xudanek/Alî keremek letîfedanek/... Min dê elema kelamê mewzûn/Alî bikira li banê gerdûn”. Mebesta Xanî ji Xudanê alî kerem û letîfedan, kesê xwedî hêza siyasî ye ku di heman demê de qedr û qîmeta huner û edebiyatê bi başî bizane. Xanî dizane ku eger hêza siyasî ji hêza edebî re bibe piştevan, ew edebiyat wê zû werarê bike û li hemû deran bibe xwedî nav û deng.

Îcar ji ber ku fars berî îslamê xwedî desthilata siyasî bûn, edebiyata wan ya berî îslamê jî zengîn bû. Lewma pişkek ji edebiyata wan a piştî îslamê jî her li ser binyata şunwarên edebiyata wan a berî îslamê hatiye avakirin. Bo mînak, îro em bi piştrastî dizanin ku edebiyata Sasanî ya berî îslamê yek ji jêderên Şahnamê ya Fîrdewsî bû.

Piştî hatina îslamê zimanê erebî ku zimanê Quran û ola îslamê bû, wekî zimanêke pîroz di nav gelên ne ereb (mîna fars û kurdan) de cihê xwe girt û bo demekê dirêj bû zimanê nivîsîna olî, zanistî û edebî. Lê nêzîkî çarsed salan piştî hingê, farsan berî hemî milletên musulmanên ne ereb bi zimanê xwe dest avête nivîsîna helbest û pexşanê û êdî bi farsî nivîsîn hêdî hêdî berbelav bû.

Zimanê farsî bû zimanê koşk û xanan

Edebiyata farsî ya piştî îslamê jî hem li jêr bandora çanda farsî ya berî îslamê bû, hem jî bi awayekî berfirehtir li jêr bandora edebiyata erebî. Tiştê herî balkêş di dîroka edebiyata farsî ya piştî îslamê de ew e ku hindê ji xanedanên seltenetî yê di çaxê îslamî de hukim li Îranê kirin, mîna Xeznewî, Xarezmi, Selcûqî, Sefewî û Qacar, ji binyat ve tirk bûn û zimanê axaftin, dan û standina wan tirkî bû.

Lê bandora ziman û edebiyata farsî her zû wesa xurt bûbû ku ziman û edebiyatên fermî yê koşk û xanên wan bûbû farsî. Wê çaxê hemî siltan û hakimî helbestvanên fermî hebûn ku helbest û qesîde yê pesn û pêgotinê bi wan digotin. Ew helbest hemû bi farsî dihatine nivîsîn. Lewma jî digotîne wê farsî ya piştî îslamê peyda bûyî, farsiya derî. Peyva derî kurtkirî ya derbarî (koşkî) ye. Anku ew farsî ya di koşk û dîwanên xanedanên hakim de li Îrana piştî îslamê peyda bûye û vejîyaye.

Divê em ji bîr nekin ku her faktorê siyasî wekir ku edebiyata farsî li derveyî sinûrên Îranê jî berbelav bibe. Di qonaxên cuda cuda yê çaxê îslamî de, ji Çînê bigire heta Bosne û Hersek, xelkê helbest bi farsî nivîsîne.

Tesawif û zimanê farsî

Wekî min pêştir jî got, ji bilî faktorê siyasî, gelek faktorên civakî, aborî, olî û kilturî jî bo wê çendê hene ku ez naxwazim niha biçime nava kûratî ya vî babetî. Bi tenê dixazim mînakeke din li vê derê behs bikim, ku faktorê ayînî ye. Edebiyata farsî bi helbesta xwe ya tesewûfî û irfanî gelekî zengîn e. Kêm terîqetên tesewufê di nava musulmanan de hene ku mifa ji edebiyata farsî ya irfanî nebînin. Sofiyên me kurdan bi xwe jî heta niha di zikr û ibadetên xwe de helbestên irfanî yê Hafizê Şîrazî bi farsî distirên.

Vê, bandora berfireh vekir ku edebiyata farsî ji kevn ve bibe edebiyateka cîhanî. Bo mînak, helbestvanê Elmanî Goethe ku li sedsaliyên 18an û 19an jiyaye, gelek di bin bandora Hafizê Şîrazî bû. Şahnamê ya Ferdewsî di sedsaliya 19an bo zimanên îngîlîzî û fransî hatiye wergerandin û li

London û Parîsê hatiye çapkirin. Her li wê çaxê Edward FitzGerald ê îngîlîz çawarîneyên Xeyamî bo zimanê ingilîzî wergerand û çap kirin.

Eger edebiyata me jî derengtir ji ya farsî peyda bûye û direngtir jî bala xelkê biyanî kişandiye xwe, ti peywendiya wê bi siruştê zimanê kurdî, êstêtk û ciwaniya berhemên wê yê edebî nîn e. Me kurdan ji farsan derengtir dest bi nivîsîna bi zimanê xwe kir. Eger fars piştî hatina îslamê ketine bin bandora ziman û edebiyata erebî, em kurd ketine jêr bandora sê ziman û edebiyatên erebî, farsî û tirkî.

Kurd hay ji berhemên hevdu nedibûn

Piştî peydabûna edebiyata kurdî jî, me tu seltenet û desthelatdariyên bihêz û berfireh nebûn ku di nav kurdan û gelên biyanî yê jêr desthelata xwe de werarê û xwendina bi zimanê kurdî bidene nivêsin. Rast e, me di dîroka xwe de mîrnişîn hebûne, lê desthelata wan ji tixûbê devereke biçûk derbas nekiriye û piraniya deverên Kurdistanê jî li derveyê tixûbên wan bûn.

Ji têkstên me yê edebî jî wisa xuya dibe ku helbestvanên kurdan bi xwe jî ji deerekê bo devereke din agehdarî ji berhemên hevdu nebûn. Di edebiyata klasîk a goranî û soranî de karî bandora helbestvanên fars mîna Hafîz, Sedî û Nîzamî peyda bikî, lê qet ti peywendiyekê di navbera wan û mezinê helbestvanên kurmanc mîna Cîzîrî û Xanî de nabî.

Wekî din jî, hem fars, hem tirk û hem kurd di mekteban de fêrî zimanê farsî dibûn û karî bi farsî bixwînin û binivîsin. Lê ji bilî kêmeka kurdan ti kesî nikarî helbestên kurdî bixwîne.

Ehmedê Xanî kêmîrî Camî û Nîzamî nîn e

Eger di nav gelên devera me de, ev bi tenê halê me kurdan ba, wê çaxê heq bû me şerm ji xwe kiriba. Lê ev, halê gelek gelên din yê devere bû. Tirkên osmanî bêhtirî şeşsed salan xwedî împaratorî û hêza siyasî bûn. Lê edebiyata tirkî gelek piştî ya farsî peyda bû. Ligel vê hindê jî, hem ziman û hem edebiyata tirkî ya osmanî bi temamî ketin jêr bandora bihêza ziman û edebiyata farsî.

Eger em behsê hêjayî û balkêşiya berheman bikin, bi şehîdiya xelkê biyanî qesîde û xezelên Cizîrî û Nalî çî ji yên Hafiz û Rûmî kêmtir nîn in. Bihayê edebî yê Mem û zîn a Ehmedê Xanî çî ji Yûsif û Zileyxa ya Camî yan ji Xosrow û Şîrîn a Nizamî kêmtir nîn e. Eger Mem û zîn şakar nebûya, dê heta niha bo çend zimanên zindî yên cîhanê nedihat wergerandin.

Îdiayên li ser lûrî ku zaravayake kurdî ye rast in? Nêrîna te li ser vê yekê çî ye?

Ev pirs bêhtir pirseka zimanvanî ye. Karê min ê sereke edebiyat e. Lê ez dikarim nêrîna xwe ya taybet ji we re bibêjim.

Kêşeya me kurdan ya herî sereke ew e ku me ti zimanekî dayikê nîn e ku em bikarin bibêjin, filan zarava ji wî zimanî vepeşiye (cuda bûye) û dikeve jêr sîbera wî û divê bi kurdî bê hejmar kirin. Belkî me li çaxên naverast an jî li serdemên berî hatina Îslamê zimanekê wisa hebûye. Lê niha me çî belgeyên nivîskî yan devkî ji zimanekê wesa nîn in.

Ti mîraseke bertêr ji zimanê madî jî, ku kurd wê wekî bingehê zimanê kurdî dijmêrin, negehiştiye me da ku zimanvan bikarin wê berawirde pê re bikin û biryarê li ser bidin. Heta niha jî ji aliyê ziman ve ti peywendiyek di navbera zimanên em niha dibêjinê kurdî û zimanê kevnarê madî nehatiye selmandin.

Bo mînak zimanê kevnar ê latînî li Ewropayê wekî zimanê dayikê bo zimanên nû yên ewropayî yên navdar bi zimanên romanî tê naskirin. Li ser wê binyatê zimanên wekî frensî, îtalî, ispanî, portegîzî û romanî bi zimanên ji latînî vepeşî tene naskirin. Eger me jî zimanekî wisa hebûya, dê me karîba wî bikine pîver û miqyas, û me dê li ser binyatê wî biryar bida ku ka filan zarava jî kurdî ye yan na.

Kurdan bixwe biryara neteweya xwe dane

Li vê derê du rê li ber me dimînin ku biryarê bidin filan ziman (yan zarava bi gotina we) kurdî ye yan na. Rêya êkê ew e ku em binêrin ka xelkê ku bi wî zimanî diaxivin, di dîrok û çanda xwe ya nivîskî û devkî de zimanê xwe wekî zimanê kurdî dijmêrin û dane nasîn an na. Rêya duyê jî ew e ku bi awayekê akadêmîk ev çend bê selmandin.

Me kurdan ji mêj ve rêya yekê daye ber xwe. Bo mînak, di edebiyata kurmançî de bi awayekî rasterast yan ne rasterast ev çend hatiye kirin. Xanî rasterast dibêje ku bi zimanê kurdî Mem û zîn nivêsiye. Cizîrî dibêje: “Gulê baxê îremê Buhtan im/Şebçiraxê şebê Kurdistan im”. Ji wê xuya dibe ku Cizîrî jî zimanê xwe bi zamanê Kurdistanîyan anku bi kurdî hejmartiye.

Di edebiyata goranî de jî ev çend heye. Bo mînak Xanayê Qubadî Xosrow û Şîrîn a Nizamî ji farsî ji nû ve bi goranî nivêsiye û di pêşgotina wê de dibêje: “Rast en muwaçan farsî şeker en/Kurdî ce farsî bel şîrînter en”. Anku bo xwîneran diyar dike ka boçî Xosrow û Şîrîn kiriye goranî û dibêje: “rast e dibêjin farsî zimanekê mîna şekirê şîrîn e, lê kurdî ji farsiyê gelek şîrîntir e”.

Di edebiyata soranî jî de ku ji sedsaliya 19an ve peyda bûye, ev çend heye. Li ser vê binyatê divê em bibînin xelkê lûr di dîroka xwe de xwe bi kurd dijmêrin yan na; yan jî îro di edebiyata xwe ya devkî û nivîskî de xwe bi kurd dadinin, yan na.

Dibe kesek bibêje: “kurbûn beriya her tiştî ziman e. Yê ku zimanê wî kurdî be, bixwaze nexwaze kurd e”. Lê dîsan pirs ev e: Zimanê kurdî kîjan e? Anku kî biryarê dide kîjan ziman kurdî be, kîjan ziman ne kurdî be? Û li ser çî binyatê wê biryarê dide?

Ev plana neyarên gelê kurd e

Rêya duyê jî rêya zimanvanan e ku bi awayekê zanistî û ji demargirî û neteweperistiyê dûr li zimanan dikolin. Ev kar jî ji mêj ve hatiye kirin. Ji encamê lêkolînên zanistî wisa derdikeve ku, ewên kurd niha jê re tê dibêjin zaravayên kurmançî, soranî, goranî, û zazakî, bi tenê li Kurdistanê anku li cem kurdan wekî zaravayê tîn naskirin. Lê li derveyê Kurdistanê li ser binyatekê zanistî wekî ziman serederî ligel wan tê kirin. Ji ber ku me bivê nevê rêzimanên wan ne wekî hev in.

Îcar belkî kurdekî neteweperest bibêje ku ev plana neyarên gelê kurd e da ku kurdan perçe perçe bikin. Kurd heta niha jî wisa hizir dikin ku eger ji kurmançî, soranî, goranî û zazakî re bibêjin ziman, wê çaxê ew ziman dê ji bin sîbera kurbûnê derkevin û ew jî dê bibe destpêka perçebûna kurdan.

Lê kesên ku kurmancî, soranî, goranî, û zazakî wekî ziman dijmêrin, xelkekî akademîk û ewropî ne ku tu neyartiya wan bi kurdan re tune ye û gelek jiwan tam berovajî ji hez û viyana kurdan hatine kar û xebat liser zimanên wan kirine.

Kurmancî, soranî, goranî... ziman in

Ez jî di wê baweriyê de me ku kurmancî, soranî, goranî, lûrî û zazakî ziman in û zarava nîn in. Lê ez ji wan re dibêjim zimanên kurdî. Ev bawerî hinek ji serbora min ya kesî jî peyda bûye. Ez ji dayka xwe fêrî kurdiya kurmancî bûm. Her wisa ji zaroktiya xwe li dibistanê fêrî farsî bûm û ji cîran û hevalan jî fêrî tirkîya azerî bûm.

Lê tê bîra min wê çaxê her car ku rastî kurdên soranîaxiv dihatim, qet li zimanê wan nedigehîştim. Tê bîra min hêdî hêdî piştî ez ji dinyayê û ji kurdbûna xwe haydar bûm û hesta kurdbûnê li cem min xurt bû, min biryar da bi rêya xwendina pirtûkan xwe fêrî soranî bikim. Her çend berî zanîngehê min dest bi fêrbûna soranî kir, lêbelê di sala yekê ya zanîngehê de jî hêj negehiştibûm wî astî ku bi başî bi soranî biaxivim.

Bi gotineka din, ez neçar bûm wekî zimanekê cuda serederiyê ligel soranî bikim û rêzimana wê bixwînim û xwe hêdî hêdî fêrî wî zimanî bikim. Heman tişt bo goranî û zazakiyê jî her wisa ye. Eger kesek xwe hînî rêziman û peyvên zazakî neke, tu carî nikare bi duristî ji kesekî zazakîaxiv têbigê. Her çend, di van salên dawiyê de, di hevdu gihîştina kurdan ji ber medyayên cûr bi cûr (TV û radiyo) ku dengûbasan bi wan zimanan bi hev re belav dikin, pîçekî baştir bûye.

Heta di navendên akademîkên cîhanî de jî wekî zimanên cuda serederî ligel wan tê kirin. Ji ber ku rêzimanên wan û werara wan ya dîrokî ne wekî hev in. Li Zanîngeha Parîsê du pişkên zimanê kurdî hene: kurdî ya kurmancî û kurdî ya soranî. Li Zanîngeha Harvardê ku ez niha lê waneyên edebiyatê dibêjim, mamosteyekî amerîkî hebû bi navê Wheeler Thackston, ku mamaosteyê zimanê farsî bû, lê ji ber ku kurdî jî dizanî, car caran wanên zimanê kurdî jî didan. Ji bo wê jî wî dû rêzimanên cuda, yek ji bo soranî ye û yek jî ji bo kurmancî yê, berhev û çap kiribûn.

Kurdî bi tenê Kurmancî û Soranî ye

Eger kurmancî û soranî yek ziman in, çima du rêzimanên cuda li hemû deran jê re pêwîst in? Ji bilî wê jî, pisporên bernas yên ku di navendên akademîk ên ewropî de di vî biyavî de kar kirine, goraniyê, zazakiyê, yan lûriyê qet bi kurdî binav nakin. Anku jê re nabêjin kurdî ya goranî, kurdî ya zazakî, an kurdî ya lûrî.

Li cem wan kurdî bi tenê ji zimanên soranî û kurmancî pêk tê. Çimkî di wê bawerê de ne ku werara dîrokiya wan zimanan ji zimanên kurdî (kurmancî û soranî yê) gelek cuda ye. Eger wisa be, pirseka dîrokî ya giring dikeve ber me kurdan: Erê Xanayê Qubadî û hemû helbestvanên mîna wî bi goranî nivîsîne şaş bûn dema digotine em bi kurdî dinivîsin?

Ez dibêjim, ne Xanayê Qubadî û yên wekî wî şaş bûn, ne zimanvan û pisporên li ser wan zimanan kar kirine şaş in. Bi dîtina min eger kesên ku bi kurmancî, soranî, goranî û zazakî diaxivin ji xwe re dibêjin kurd, ne ji ber ku zimanê wan yek e, yan di zimanê hevdu digihin. Belkî ji ber ku li tenîştê hev jiyane û dîroka wan, dab û nerîtên wan, û qedera wan yek bûne û yek e.

Mumkîn e ev çend ji ber wê yekê jî be ku wextekî koka zimanên wan jî yek bû. Lê wekî min pêştir jî got, rastiya vê çendê niha ji me re ne zelal e û eger zimanekî wisa pêştir hebûbe jî, niha nemaye û yên niha ji aliyê kurdan ve bi zaravayên kurdî tî naskirin bi dirêjîya dîrokê wisa werar kiriye ku niha weke ziman derdikevin.

Nakokiya zimannasan li ser Kurdî

Her li ser wê binyatê, em dikarin bersiva wan kesên akadêmîk û zimannas yên ku dibêjin zazakî û goranî ne kurdî ne bi vî awayî bidin: Eger cudabûna rêzimanên van zimanan bibe sebeb ku ew goranî û zazakiyê bi kurdî nejmêrin, wê çaxê çawa dibe ku kurmancî û soranî her du wekî kurdî tî hijmartin?

Ma ne her ew zimannas rêzimanên kurmancî û soranî jî ji hev cuda dikin? Anku eger cudahiya rêzimanî bibe pîver û miqyas ku em goranî û zazakiyê bi kurdî hesab nekin, wê çaxê pêwîst e ji soranî û kurmanciyê jî bi tenê yek kurdî be, ne her du. Bi dîtina min eger em bikarin kurmancî û soraniyê,

di ser cudahiya di navbera rêzimanên wan de, di ser zimanbûna wan re dîsan, bi kurdiya soranî û bi kurdiya kurmancî binav bikin, heman tişt ji bo goranî û zazakiyê jî mumkîn e, eger xelkên bi van du zimanan diaxivin xwe di binyatda bi kurd hesab bikin.

Kurdbûn bi tenê ne ziman e

Bi baweriya min, kurdbûn nabe bi tenê bi zimanî ve bê girêdan. Kurdbûn berî her tişteki atîfe û hest û soz e; kurdbûn dîroka hevbeş, dab û nerîtên hevbeş, qedera hevbeş û pêşeroja hevbeş e. Pênaseya kurdîbûnê ji bo van zimanan jî her di vî çarçoveyê de ye.

Bo mînak, ji ber wê qedexeya ku bi salan li ser axiftina bi kurdî li Bakûrê Kurdistanê hatibû danan, gelek kurdên Bakûr nizanin bi kurdî biaxivin, lê xwe bi kurd didin nasîn û wan pê xweştir e bîst kuştin, li cihê ku kesek ji wan re bibêje hûn ne kurd in. Gelek kes jî hene zimanê wan ên dayikê kurdî ye û bi kurdî diaxivin, lê tu hest û sozê le cem wan li hember gelê wan tune ye.

Yekgirtineke di çarçoveya gelê Kurd de

Bi dîtina min, a rast û durist ev e ku, soranî, kurmancî, zazakî, û goranî tev bi rêzimanên cuda wekî endamên xêzana zimanên kurdî bîst pênase kirin. Bi vî awayî xelkê bi wan zimanan diaxivin, dikarin hem resentiya zimanên xwe biparêzin, hem jî bi navê kurdbûnê yekgirtina xwe di çarçoveya gelê kurd de pêkbînin û biparêzin. Bi vî awayî, eger xelkê lûr jî bixwazin, dikarin xwe weke kurd pênase bikin, heta eger rêzimana wan ji ya zimanên din yê kurdî hindêk dûr be jî. Çunkî zimanê lûrî jî her çawa be ji aliyê zimannasî ve, mîna zimanên kurdî, bi zimanekê îranî yê rojavayî yê nû tê hejmarkirin.

Ji bo ku em xwe ji vî pirsgirêka zimanî rizgar bikin, pêwîst e em kurdbûnê ji qalibê bertengê zimanî derbixin û pênaseka berfirehtir a nîştimanî jêre çêkin da ku hem van zimanan tev bi xwe bigire û hem jî rastiyên zanistî û akadêmîk nehên haşa û mandele kirin.

Bi zimanê çarîneyên Baba Tahirê Ûryan dikare bê fahmkirin ew kurd e?

Eger lûr xwe bi kurd bizanin, edebiyata wan jî dê bibe beşek ji edebiyata zimanên kurdî. Anku carê pirsê sereke ev e: Erê lûr xwe bi kurd dijmîrên? Her gaveka em karibin bersiva vê pirsê bi duristî bidin, wê gavê bersiva pirsê helbest û edebiyata lûrî jî gelek hêsantir dibe.

Lê di derbarê helbesta Baba Tahirê Uryan de girifteka din jî heye. Eger em helbestên Baba Tahirî yên ku îro çap û belav dibin bikin pîver û miqyas em dikarin bi hêsanî bibêjin ku zimanê wan bêhtir ser bi farsiyê ve ye. Lê pirs ev e: Erê ew ziman, zimanê resenê çarîneyên Baba Tahir e? Erê çarîneyên Baba Tahirî ji destpêkê her bi wî zimanî bûn?

Şaşiya li ser Baba Tahîrê Uryan

Beriya çend salan min li zanîngeha Paris kesek nas dikir ku digot di karê xwe yê lêkolînan li ser edebiyata kurdên yarsan de rastî destnivîseka goranî ya çarîneyên Baba Tahirê Uryan hatiye û fotokopiyek ji xwe re jê girtiye. Edebiyata kurdên yarsan bi kurdî ya goranî ye û bêhtir jî ji kilamên wan yên pîroz pêk tê.

Baba Tahir jî di bawerên yarsanan de kesatiyeke olî û pîroz e. Min jê xwest wê fotokopiyê bibînim da ku eger bi rastî resentiya wê destnivîsê cihê baweriyê be em hemû hewlên xwe bidin li Başûrê Kurdistana çap bikin. Lê piştî min destnivîsê dîtî, bo min diyar bû ku qet ne destnivîseka kevnar e û zimanê wê jî ti cudahî ligel zimanê dîwanên çapbûyî yên Baba Tahirî nîn e. Lewma min qet nezanî çima wî kesî bi şaşî bizav dikir zimanê wê bi goranî binav dikir.

Çarîneyên resen ên Baba Tahîrî mane?

Hinek dibêjin zimanê çarîneyên resen ên Baba Tahirê Uryan ji eva em îro di dîwanên wî yên çapbûyî de dibînin, cuda bû û paşî hêdî hêdî hatiye farsî kirin. Bo mînak, nivîser û lêkolerê îranî, Zebîhullah Sefa, pirtûkek di çend bergan de li ser dîroka edebiyata farsî nivîsiye. Ew dema behsa Baba Tahirî dike, dibêje ku wî bi xwe destnivîseka çîwarînen Baba Tahirî bi zimanê wan yê resen li muzexaneyeka Stenbolê dîtiye.

Her li wê derê hinek ji wan çarîneyên bi dest li ser perekê kaxezê kopî dike û di pirtûka xwe de çap dike û dibêje ku ew bixwe qet di wan çarîneyan nagihê, çunkî zimanê wan ne farsî ye. Min ew çîwarînen di pirtûka wî de ne dîtine û ez jî qet tê nagehim.

Lê bi baweriya min rastî û duristiya hebûna wê destnivîsê ne geleka ron û zelal e. Ya dirist ew e ku kesekê şarezayê zimanê lûrê li pey wê destnivîsê bigere, ligel kesên şarezayî destnivîsan resenatiya wê piştrast bike û eger weke destnivîseka resen a çarîneyên Baba Tahirê Uryan hate selmandin, berhev û çap bike.



Portre/Dr. Amr Taher Ahmed

Xelkê gundê Zêwa Şêx Pîramîs e ku ser bi devera Amêdiyê, bi girêdayî Duhokê ve ye. Di sala 1978an de li Îranê li bajarê Tebrîz ji dayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî, navîn û amadeyî her li Tebrîz bi dawî aniye. Di sala 1995an de, ligel malbata xwe vegeyriyaye Başûrê Kurdistanê û li bajarê Duhokê bicih bûye.

Di sala 2000an de, bawernameya lîsansê ji pişka ziman û edebiyata kurdî ya Zanîngeha Duhok wergirtiye. Di sala 2004an de, bawername ya master ji pişka Îrannasî ya zanîngeha Sorbonne

Nouvelle-Paris 3 wergirtiye. Bawername ya doktorayê jî di sala 2009an ji pişka edebê berawirdkarî ya wê zanîngehê wergirtiye.

Di sala 2010an de, wekî endamê bingehê lêkolînên îrannasî (Institute of Iranian Studies) li akademiya zanistên Austira (Austrian Academy of Sciences) li Vienna karê lêkolînên edebî dike. Niha jî bi awayekê berwext li zanîngeha Harvard li Amerîka wanên edebiyatê vedibêje.

Dr. Ahmed bi giştî xebat û lêkolînan di her du biyavên edebiyatên kurdî û farsî de dike. Yekem pirtûka wî li ser helbesta nû ya kurdî û farsî bû ku di sala 2006an de bi navê Nima Yushij û Ebdulla Goran, nwêkirdinewe û dabiran ji aliyê dezgehê Spirêz ve hatiye çapkirin.

Teza wî ya doktorayê ku li ser bandora helbesta fransî li ser helbesta nû ya farsî ye, bi frensî bi navê «La Révolution littéraire» (Şoreşa Edebî) ji aliyê akademiya Zanistên Nemsayî ve hatiye çapkirin. Wî bo wê pirtûkê ta niha dû xelatên navdewletî, yek ji Ewropa û yek jî ji Îranê, wergirtine. Ji bilî van du pirtûkan, wî komeka gotarên zanistî bi fransî, farsî û kurdî di kovarên Fransa, Îran, û Kurdistanê de çap kirine.

Paşgirên kesî yên lêkeran û dîroka wan

Husein Muhammed

Paşgirên kesî yên lêkeran ew paşgir in ku dikevin dawiya lêkeran û pê diyar dibe ka kirdeyê/bikerê (subject) wê lêkerê kî ye:

- dibêj-im ("im" a dawiya lêkerê diyar dike ku biker "ez" im: "ez dibêjim", ne "*tu dibêjim" yan "*ew dibêjim" ...)
- dibêj-î ("î" diyar dike ku biker "tu" yî: "tu dibêjî", ne "*ez dibêjî", "*em dibêjî" ...)

Di kurmanciya nivîskî de du desteyên paşgirên kesî yên lêkeran hene. Yek ji wan hingê li kar e gava ku rehê lêkerê bi konsonantekê bi dawî bê. Desteya din ya paşgiran wê tê xebitandin dema ku li dawiya rehê lêkerê vokalek (a, e, ê, i, î, o, u, û) hebe. Di zimannasiyê de rehên ku bi vokalekê bi dawî tên bi navê "tematîk" tên nasîn û rehên bi konsonantan jî bi dawî tên wek "atematîk" tên binavkirin.

Paşgirên atematîk (gava ku li dawiya rehê peyvê yek yan çend konsonant hebin)

Kes	Paşgir	Nimûne
ez	-im	dibêjim, hatim
tu	-î	dibêjî, hatî
ew	-e ³² , - ³³	dibêje, hat_
em	-in	dibêjin, hatin
hûn	-in	dibêjin, hatin
ew	-in	dibêjin, hatin

Paşgirên tematîk (gava ku li dawiya rehê peyvê vokalek hebe)

³² Demên neborî anku demên niha û bîn

³³ Di demên borî de li gel kesê sêyem yê yekhejmar ("ew"ê yekhejmar) paşgir sifir e anku nîne.

Kes	Paşgir	Nimûne
ez	-m	dicûm, çûm
tu	-yî ³⁴	dicû(yî), çûyî
ew	-	dicû_, çû_
em	-n	dicûn, çûn
hûn	-n	dicûn, çûn
ew	-n	dicûn, çûn

Anku di zimanê nivîskî de paşgira kesî ya her yekê ji "ez, tu, ew (yehjimar)" cuda ne lê paşgira "em, hûn, ew" anku cînavên pirhejmar eynî ne: atematîk "-in" û tematîk "-n".

Di hemû devokên kurmançî de paşgirên kesî ne wiha ne. Di hemûyan de paşgira cînavên "ez", "hûn" û "ew" yê pirhejmar wek di zimanê nivîskî de ye:

ez	-im	dibêjim
ez	-im	dibêjim
hûn	-in	dibêjin
ew	-in	dibêjin
ez	-m	dicûm
hûn	-n	dicûn
ew	-n	dicûn

³⁴ Di demên niha û bîna de ne zerûrî ye, di demên borî de zerûrî ye.

Di kurmanciya rojhilatî de cînavê "em" paşgireke ji ya cînavên "hûn, ew (pirhejmar)" cuda heye.

kurmanciya rojhilatî		kurmanciya navendî (forma standard)	
paşgir	nimûne	paşgir	nimûne
-în (atematîk)	dibêjîn	-in (atematîk)	dibêjin
-yn (tematîk)	çûyn	-n (tematîk)	çûn

Paşgirên cînavê "tu"

Piraniya herdu komdevokên rojhilatî û navendî bo cînavê "tu" li gel rehên atematîk (konsonant li dawiyê) paşgira "-î" bi kar tînin. Lê hin devokên kêmine jî paşgirên wek "-e, -ê, i" dixebitînin.

Bikaranîn	Paşgir	Nimûne
piranî, standard	-î	tu dibêjî, tu hatî
hin devok	-e, (demên borî) -	tu dibêje, tu hat_
hin devok	-ê	tu dibêjê, tu hatê
hin devok	-i	tu dibêji, tu hati

Paşgirên cînavê "ew" yê yekhejmar

Paşgira cînavê "ew" yê yekhejmar di demên borî de di hemû devokên kurmancî de sifir e anku ew cînav bê paşgir e:

- ew hat_ (bide ber "ez hat-im", "tu-hat-î", "em/hûn/ew hat-in")
- ew çû (bide ber "ez çû-m", "tu çû-yî", "em/hûn/ew çû-n")

Di kurmanciya nivîskî de di demên niha û bên de jî li gel lêkerên tematîk ev cînav bê paşgir e:

- ew diçû_ / didirû_ / digurû_ / dişê_ (bide ber “ez diçû-m / didirû- / digurû-m / dişê-m”)

Di demên niha û bên de vî cînavî jî li gel lêkerên atematîk (konsonant li dawiyê) paşgir heye. Di zimanê nivîskî de ev paşgir “-e” ye:

- “ew dibêj-e, ew diken-e, ew dixw-e” (bide ber “ez dibêj-im / diken-im / dixw-im” û “tu dibêj-î / diken-î / dixw-î”)

Ev paşgira zimanê nivîskî di heman demê de wek paşgira kopulayê (lêkera “bûn”ê ya statîv di dema niha de). Herwiha ew wek paşgira fermanî ya yekhejmar e:

Paşgir	nimûne
paşgira cînavê “ew”: -e	ew dikene
kopulaya cînavê “ew”: e	ew kurd e
paşgira fermanî ya yekhejmar: -e	biken-e

Wek din jî paşgirên kesî yên atematîk yên cînavên din jî li gel kopulayê eynî ne:

paşgira kesî	kopula
ez dikenim	ez kurd im
tu dikenî	tu kurd î
ew dikene	ew kurd e
em dikenin	em kurd in
hûn dikenin	hûn kurd in
ew dikenin	ew kurd in

Di kurmanciya rojhilatî de hem paşgira cînavê “em” û hem jî kopulaya wî “în” e:

em dibêjîn

em kurd î

Wek ku me got, cînavê "ew" yê yekhejmar li gor devokan çendîn paşgirên cuda hene.

ATEMATÎK		TEMATÎK	
paşgira kesî	nimûne	paşgira kesî	nimûne
-e	ew dibêje	-	ew dicû
-ê	ew dibêjê	-	ew dicû
-i	ew dibêji	-	ew dicû
-it	ew dibêjit	-t	ew dicût
-itin	ew dibêjitin	-tin	ew dibêjitin
-î	ew dibêjî	-	ew dicû
-ît	ew dibêjît	-t	ew dicût
-îtin	ew dibêjîtin	-tin	ew dicûtin

Ji van paşgira "-e" forma standard ya nivîskî ye û ew di gelek devokên kurmancî yên navendî û rojavayî de peyda dibe. Paşgirên "ê" û "-i" jî dîsa di hin devokên rojavayî û navendî de hene.

Paşgira "-it" ya atematîk û hevbera wê "-t" ya tematîk herî zêde li Botan û li deverên rojava yên Behdînan (bo nimûne Zaxo) li kar in. Heman devok yan bi kêmî hin ji wan paşgirên "-itin, -tin" wek alternatîva sekunder bi kar tînin: mirov dikare her peyva bi paşgira "-it, -t" di van devokan de herwiha bi paşgira "-itin, -tin" bibêje.

Ev paşgirên "-it, -t" di klasîkên kurmancî de baş tînin: Xanî û Cizîrî bi piranî di berhemên xwe de ev paşgir li gel cînavê sêyem bi kar anîne. Herwiha ew di hin berhemên li devera Behdînan çapkirî (bi taybetî bi alfabeya kurdî-erebî lê carinan jî bi kurdî-latînî) ev paşgir tînin xebitandin.

Paşgira "-ît" ya atematîk û hevbera wê ya tematîk "-t" li Dihokê û derdorên wê serdest in. Medyaya kurmanciya bi alfabeya kurdî-erebî bi piranî vê paşgirê li gel cînavê "ew" yê yekhejmar bi kar tîne. Ev paşgir herwiha wek "-ît, -t" yan jî bi forma sivikkirî "-î" li Hekariyan û deverên din yên bakur yên devokên kurmanciya rojhilatî peyda dibin. Şairê kurd Cegerxwîn di helbestên xwe de bi piranî ev paşgirê bi cînavê "ew" yê yekhejmar re xebitandiyê.

Heman devok yan bi kêmî hin ji wan paşgirên "-(i)tin, -(î)tin" wek alternatîva sekunder bi kar tînin: mirov dikare her peyva bi paşgira "-ît, -t" di van devokan de herwiha bi paşgira "-îtin, -tin" bibêje:

- ew dibêjit, ew dibêjitin
- ew dibêjît, ew dibêjîtin

Dîsa klasîkan de ev forma "-(i)tin" jî tê dîtin. Bi taybetî Xanî wê bi kar tîne lê bi marjinalî ew li di berhemên Melayê Cizîrî û heta di klasîkên vê dawiyê de anku jî bo nimûne li ba Cigerxwîn û Seydayê Tîrêj.

Melayê Cizîrî di helbesteke xwe de wiha dibêje:

Saqî ku dêm mehweş **bitin**
 Kagul ji şêva reş **bitin**
 Qerqef bila ateş **bitin**
 Em dê bi wê dil kîn 'ilac

Ehmedê Xanî jî di çend şî'rên xwe de wiha dinivîse:

Saqî, tu ji bo Xudê kerem ke
 yek cur'eê mey di cam-i Cem ke

 da cam bi mey cihannuma bit
 herçî me irade ye xuya bit

 da keşf bibit li ber me ehwal
 kanî **dibitîn** muyesser iqbal

 idbara me wê giha kemalê
 aya bûye qabilê zewalê

 ya her wehe dê li 'stiwa bit

hetta weku dewr munteha bit

qet mumkin e ev ji çerxê lewleb
tali' **bibitin** ji bo me kewkeb

bextê me ji bo me ra bibit yar
carek **bibitin** ji xwabê hişyar

rabit ji me jî cihanpenahek
peyda **bibitin** me padişahêk

şîrê hinera me bête danîn
qedrê qelesa me bête zanîn

derdê me **bibînitin** 'ilacê
'ilmê me **bibînitin** rewacê

...

da xelq nebêj**itin** ku ekrad
bême'rîfet in, bê'esl û bunyad

Cigerxwîn jî di helbesteke xwe de wiha dirêse:

Ger ne bilbil dilbijokê sorgula rûgeş **bitin**
Rûmeta wî bilbilê bê sorgula rûgeş çi ye

Seydayê Tîrêj jî di helbesta xwe ya navdar "Bilbilê Dilşadî" de wiha kerem dîke:

Ey bilbilê dilşadî hela, wer bike fîxan
Derdê me giran e ey bira, birîna me kûr e
Gorî te **bitin** cerg û dil û mêlak û hem can
Dengê te ye xweştir, ji ney û nay û bilûr e

Paşgirên kesî yê soranî

Di soraniya nivîskî de bi piranî ev paşgir li kar in. Li vir em nimûneyên atematîk (rehê dema niha "xwên-" ji "xwêndin = xwandin, xwendin" û rehê demên borî "hat" ji "hatin = hatin") û nimûneyên tematîk (rehê dema niha "-lê-" ji "wutin = gotin" û rehê dema niha "çû" ji "çûn = çûn") wek mînak bidin.

KES	ATEMATÎK		TEMATÎK	
	pirtik	nimûne	pirtik	nimûne
min (ez)	-im	dexwên-im, hat-im	-m	delê-m
to (tu)	-î	dexwên-î, hat-î	-y	delê-y
ew (ew)	-ê, (demên borî) -	dexwên-ê, hat-__	-	delê-
ême (em)	-în	dexwên-în, hat-în	-yn	delê-yn
êwe (hûn)	-in	dexwên-in, hat-in	-n	delê-n
ewan (ew)	-in	dexwên-in, hat-in	-n	delê-n

Cînavê "ew" yê yekhejmar dikare wek hin devokên kurmancî "-t" û di hin devokan de "-tin" jî bigire:

- dexwên-êt, dexwên-êtin

Cînavê "to" (tu) dikare herwiha "-t" jî bigire:

- dexwên-ît, delê-yt

Eger rehê lêkerê bi "e" bi dawî bibe, cînavê "ew" yê yekjimar wê diavêje û paşgira "-a" (bi hin devokan "-at, -atin") lê zêde dike:

- “min deke-m”³⁵ (ez dikim) lê “ew dek-a / dek-at / dek-atin” (ew dike)
- “min dede-m” (ez didim) lê “ew de-da / ded-at / ded-atin” (ew dide)

Berevajî kurmanciya navendî û nivîskî lê wek kurmanciya rojhilatî, di soranî de jî paşgira kesî ya cînavê “ême” (em) ji ya cînavên “êwe” (hûn) û “ewan” (ew – pirhejmar) cuda ye.

Paşgirên kesî bi hin zimanên din

Paşgirên kesî yên atematîk di farisî de wiha ne³⁶:

Kes (kurmancî di kevanan de)	Pirtik (kurmancî di kevanan de)
men (ez)	-em (-im)
to (tu)	-î (-î)
o (ew – yekhejmar)	-ed (-e), - (di demên borî de)
ma (em)	-îm (-in)
şoma (hûn)	-îd (-in)
anha (ew – pirhejmar)	-end (-in)

Di kurmanciya navendî de paşgira her sê cînavên pirhejmar wek hev e (-in), di kurmanciya rojhilatî û di soranî de tenê paşgira cînavên “hûn” û “ew” ya pirhejmar wek hev e anku “-in” e lê paşgira cînavê “em” wek “-în” e. Di farisî de paşgira ti ji van her sê cînavan ne eynî ye.

³⁵ Rehên lêkerên “birin, dan, kirin” di kurmanciya navendî û kurmanciya nivîskî de atematîk in (-b-, -d-, -k-) lê di soranî û kurmanciya rojhilatî de ew tematîk in (-be-, -de-, -ke-).

³⁶ Tabloyeke paşgirên kesî di farisî de (latînîzekirin li gor rastnivîsîna inglîzî, li vir me ew li gor nivîsîna kurdî-latînî adapte kirine.): <http://theocraticpersian.blogspot.fi/2012/11/ch-3-l3-personal-pronouns-their-related.html>

Bi heman awayî pehlewî jî paşgirên ji hev cuda didan gel her sê cînavên pirhejmar. Lê li aliyekî din paşgirên cînavê "ez" û "em" wek hev bûn û yê cînavê "ew" yê yekhejmar û cînavê "hûn" gelek caran eynî bûn:³⁷

Paşgirên kesî di pehlewî de	Kurmancî
-êm, -em, -om	(ez) -im
-ê, -êh	(tu) -î
-êd, -ed, -	(ew) -e,- (demên borî de)
-em, -êm, -om	(em) -in
-êd	(hûn) -in
-ênd, -end	(ew) -in

Avestayî bo her cînavêkî paşgireke serekî ya ji yê din cuda hebû:³⁸

Paşgirên kesî di avestayî de	Kurmancî
-mi	(ez) -im
-hi	(tu) -î
-ti	(ew) -e,- (demên borî de)
-mehi	(em) -in
-the	(hûn) -in
-nti, -eti	(ew) -in

³⁷ Tabloyeke paşgirên kesî di pehlewî de (latînîzekirin li gor rastnivîsîna inglîzî, li vir me ew li jor nivîsîna kurdî-latînî adapte kirine.): http://www.iranicaonline.org/uploads/files/Persian_Language/persian-language-01-enp-tab5.jpg

³⁸ Tabloyeke paşgirên kesî di avestayî de (latînîzekirin li gor rastnivîsîna inglîzî, li vir me ew li jor nivîsîna kurdî-latînî adapte kirine.): <http://www.languagesgulper.com/eng/Avestan.html>

Wek ku tê dîtin, di avestayî jî li gel cînavê "ew" yê yekhejmar "-ti" heye ku pir dişibe "-it, -t" ya hin devokên kurmancî û soranî. Ew heman pirtik di farisî û pehlewî de wek "-ed, -êd" tê dîtin. Ew di zimanên din jî yê kevn yê hindûewropî de diyar e. Bo nimûne, di sanskrîtî de jî "-ti" bû:³⁹

Paşgirên kesî di sanskrîtî de	Kurmancî
-mi	(ez) -im
-si	(tu) -î
-ti	(ew) -e,- (demên borî de)
-ma	(em) -in
-tha	(hûn) -in
-nti	(ew) -in

Eger em paşgirên kesî yê avestayî û sanskrîtî bidin ber hev, em ê bibînin ku cudahiyên wan pir biçûk û kêm in:

Paşgirên kesî di sanskrîtî de	Paşgirên kesî di avestayî de
-mi	-mi
-si	-hi
-ti	-ti
-ma	-mehi
-tha	-the
-nti	-nti, -eti

³⁹ Tabloyeke paşgirên kesî di sanskrîtî de (latînzekirin li gor rastnivîsîna inglîzî, li vir me ew li jor nivîsîna kurdî-latînî adapte kirine.): <http://www.languagesgulper.com/eng/Pali.html>

Sebebê ku paşgira cînavê duyem (tu) di hîtîti de "-si" û di avestayî de "-hi" ye, ew e ku S-ya proto-hindûewropî di zimanên îranî de bûye H. Loma *"septm" ya hindûewropî di sanskrîti de "septan", di latîni de "septem", di frensî de "sept", di almanî de "sieben", di inglîzî de "seven" e, lê di avestayî de "hepte-" ye û di kurmancî de "heft" e. Heman guherîna S bi H di yûnanî de jî peyda bûye loma eynî hejmar bi wî zimanî "hêpta" ye.

Bi hîtîti paşgira cînavê "ew" yê yekhejmar "-zi" bû wek ku ji tabloya jêr tê dîtin:

Paşgirên kesî di hîtîti de	Kurmancî
-mi	(ez) -im
-si	(tu) -î
-zi	(ew) -e,- (demên borî de)
-weni	(em) -in
-teni	(hûn) -in
-ezni	(ew) -in

Ji camêriya xwe careke din jî paşgirên hîtîti bidin ber yên avestayî daku hûn nêzîkiya gelean ji wan bibînin:

Paşgirên kesî di hîtîti de	Paşgirên kesî di avestayî de
-mi	-mi
-si	-hi
-zi	-ti
-weni	-mehi
-teni	-the

-ezni	-nti, -eti
-------	------------

Sebebê ku paşgira cînavê duyem (tu) di hîtî de "-si" û di avestayî de "-hi" ye, ew e ku S-ya proto-hindûewropî di zimanên îranî de bûye H. Loma *"septm" ya hindûewropî di avestayî de "hepte-" ye û di kurmancî de "heft" e.

Di latînî de M-ya paşgira cînavê "ez" ketiye lê S-ya paşgira cînavê "tu" û T-ya paşgira cînavê "ew" yê yekhejmar hatine parastin. Herwiha M-ya paşgira cînavê "em", T-ya paşgira cînavê "hûn" û NT-yên paşgira cînavê "ew" yê pirhejmar mane:⁴⁰

cînav bi kurdî	paşgirên latînî	nimûne bi latînî "st-" (rawestîn)	paşgir bi avestayî	paşgir bi kurmanciya nivîskî
ez	-o	st-o	-mi	-mi
tu	-as	st-as	-hi	-î
ew (yekhejmar)	-at	st-at	-ti	-e, (devokî: -it, -ît)
em	-amus	s-tamus	-mehi	-in
hûn	-tatis	st-atis	-the	-in
ew (pirhejmar)	-ant	s-tant	-nti, -eti	-in

Tevî ku M di dema niha de ji paşgira cînavê "ez" di latînî de ketiye jî lê dîsa jî di demên borî de M maye.⁴¹

Spanî, ku yek ji zimanên ji latînî çêbûyî ye, piraniya paşgirên kesî mîna latînî yan nêzîkî diparêze:⁴²

⁴⁰ <http://www.netplaces.com/learning-latin/time-and-tense/forming-the-future-indicative.htm>

⁴¹ <http://www.slu.edu/colleges/AS/languages/classical/latin/tchmat/grammar/whprax/w1v-end.html>

⁴² <http://www.outerspanish.com/learn-spanish-how-to-conjugate-verbs-present-tense.htm>

cînav (bi kurdî)	paşgirên latînî	paşgirên spanî	paşgirên kurmancî
ez	-o	-o	-im
tu	-as	-as	-î
ew (yekhejmar)	-at	-a	-e (devokî: -it, -î, -ît)
em	-amus	-amos	-in
hûn	-atis	-áis	-in
ew (pirhejmar)	-ant	-an	-in

Wek ku tê dîtîn, T ji paşgira cînavê "ew" yê yekhejmar dike: latînî "-at" → spanî "-a" tam wek ku ew ji kurmancî jî ketiye: kurmanciya devokî "-it, -ît" → kurmanciya nivîskî "-e", bi hin devokan "-î, -ê, -î". Di spanî de herwiha T ji paşgira cînavên "hûn" û "ew" (pirhejmar) jî ketiye:

- latînî "-atis" (hûn ... -in) → spanî "-áis"
- latînî "-ant" (ew ... -in) → spanî "-an"

Heman guherîn di kurdî de jî li gel cînavê "ew" yê pirhejmar peyda bûye

- "-in", bide ber avestayî "-nti"

Di nav zimanên germe de, bi taybetî almanî ji paşgirên kesî yê hindûewropî S-ya paşgira cînavê "tu" û T-ya paşgira cînavê "ew" yê yekhejmar diparêze. Almanî herwiha "-en" ya hindûewropî ya bi eslê xwe paşgira cînavê "ew" (sie) yê yekhejmar bi li gel wî cînavî lê herwiha li gel cînavê "em" (wir) û cînavê "hûn" (Sie) yê ihtiramê dixebitîne:

cînav (bi kurdî)	paşgir bi almanî	nimûne	paşgir bi kurmancî
ez	-e	sage (dibêjim)	-im
tu	-st	sagst (dibêjî)	-î

ew	-t	sagt (dibêje)	-e (devokî: -it, -ît, -t)
em	-en	sagen (dibêjin)	-in
hûn	-t	sagt (dibêjin)	-in
Hûn (ihtiramî)	-en	sagen (dibêjin)	-in
ew	-en	sagen (dibêjin)	-in

Yekbûn yan ketina paşgirên kesî

Berevajî gelek zimanên nêzîk û yê hinekî dûrtir, di kurdî de (bi taybetî di kurmanciya navendî de) hevgyrtinek di navbera paşgirên kesî de çêbûye. Di zimanê nivîskî de, li gel şeş cînavên cuda tenê sê paşgirên cuda tên bikaranîn:

- ez ... -im (tematîk: -m)
- tu ... -î (temamîk: -)
- ew ... e (tematîk: -)
- em / hûn / ew ... -in (tematîk: -n)

Wek ku diyar e, hemû cînavên pirhejmar (em, hûn, ew) eynî paşgirê bi kar tînin. Di zimanên kevn yê hindûewropî de (avestayî, sanskrîtî, latînî...) de rewş ne wisa bû: her cînavê pirhejmar, wek yê yekhejmar jî, paşgirên xwe yê cuda hebûn. Heta di gelek zimanên niha (bo nimûne di farisî de) jî rewş wisa ye. Lê di kurmancî de paşgira cînavê “ew” yê pirhejmar bergeha bikarhatina xwe berfireh kiriye û wî cih jî paşgira cînavên “em” û “hûn” jî standiye. Em heman guherînê di tabloya paşgirên almanî de jî dibînin.

Mirov bi tabloya li jêr dibîne ku ev paşgira kurdî “-in” yan almanî “-en” bi eslê xwe tenê li gel cînavê “ew” yê pirhejmar li kar bû:

ziman	paşgir	li gel cînavê(n)...
kurmanciya navendî	-in	em, hûn, ew (pirhejmar)
kurmanciya rojhilatî	-in	ew, hûn (bo cînavê "em": -în)
soranî	-in, -n	hûn, ew (bo cînavê em: -în)
farisî	-end	ew yê pirhj. (bo cînavê "em": "-îm" û bo cînavê "hûn" jî "-îd")
avestayî	-nti	ew yê pirhj. (bo cînavê "em": "-mehi" û bo cînavê "hûn" jî "-the")
sanskritî	-nti	ew yê pirhj. (bo cînavê "em": "-ma" û bo cînavê "hûn" jî "-tha")
latînî	-ant	ew yê pirhj. (bo cînavê "em": "-mus" û bo cînavê "hûn" jî "-tatis")

Ji bilî yekbûna paşgirên cînavên pirhejmar, di hin devokan de herwiha paşgira cînavên "tu" û cînavê "ew" yê yekhejmar bûne yek. Di hin devokan de bergeha paşgira cînavê "ew" yê yekhejmar berfireh bûye û bûye paşgira cînavê "tu" jî:

cînav	standard	hin devok
ew	-e (tu dibêje), -	-e (ew dibêje, ew hat_)
tu	-î (tu dibêjî, tu hatî)	-e (tu dibêje, tu hat_)

Di hin devokan de jî ji ber ketina T-ya paşgira cînavê ew yê yekhejmar (-ît → -î), ew paşgir jî di demên neborî de (lê ne di demên borî de) bûye wek paşgira cînavê "tu"

cînav	standard	hin devok
tu	-î (tu dibêjî), -î	-e (dibêjî, ew hatî)
ew	-e (ew dibêje), - (ew hat_)	-î (ew dibêjî ← ew dibêjît)

Di hin devokan de heta nêzîkbûnek di navbera paşgirên cînavên yekhejmar û pirhejmar de jî peyda bûye. Hin devok "-in" ya cînavên pirhejmar herwiha li paşgirên devokî "-it, -ît-, -t" yên cînavê "ew" yê yekhejmar jî zêde dikin anku wan dikin "-itin, -îtin, -tin":

cînav	nivîskî	hin devok	hin devok	hin devok	hin devok
ew	-e (dibêje)	-it (dibêjit)	-itin (dibêjitin)	-ît (dibêjît)	-îtin (dibêjîtin)

Li gor van devokên ku "-itin, -îtin, -tin" bi kar tînin, tenê li dawiya paşgirên cînavên "ez" û "tu" paşgira "-in" nine:

cînav	nivîskî	hin devok	hin devok
ez	-im (dibêjim)	-im (dibêjim)	-im (dibêjim)
tu	-î (dibêjî)	-î (dibêjî)	-î (dibêjî)
ew	-e (dibêje)	-itin (dibêjitin)	-îtin (dibêjîtin)
em	-in (dibêjin)	-in (dibêjin)	-în (dibêjîn)
hûn	-in (dibêjin)	-in (dibêjin)	-in (dibêjin)
ew	-in (dibêjin)	-in (dibêjin)	-in (dibêjin)

Di rastiyê de ev ne guherîneke xerîb e. Di inglîzî de ji paşgirên kesî yên hindûewropî tenê şopek di paşgira cînavê "ew" yê yekhejmar de maye: "-s" yan "-es" ji forma inglîziya navîn û kevn "-th, -eth"

(wek kurmanciya devokî “-t, -it, -ît”). Wek din paşgirên kesî yên hemû cînavên din ketine. Di zimanên skandinavî danmarkî, norwecî û swêdî de ew tek pirtik jî nemaye. Bo nimûne inglîzî “do” (kirin) û swêdî “göra” (kirin):

inglîzî	swêdî	kurdî
I do	jag gör	ez dikim
you do	du gör	tu dikî
he/she does	han/hon gör	ew (jin) / ew (mêr) dike
we do	vi gör	em dikin
you do	ni gör	hûn dikin
they do	de gör	ew dikin

Gava ku mirov vê vê çemîna sade ya inglîzî û swêdî bide ber ya kurdî, mirov dê bibêje ku çemîna kurdî pir diguhere û formên cuda hene. Lê di rastiyê de çemîna lêkerên gerguhêz (transîtîv) yên kurdî di demên borî de hê jî hêsantir e:

inglîzî	swêdî	kurdî
I did	jag gjorde	min kir
you did	du gjorde	te kir
he/she did	han/hon gjorde	wî /wê kir
we did	vi gjorde	me kir
you did	ni gjorde	we kir
they did	de gjorde	wan kir

Helbet di demên borî de lêkerên gerguhêz yên kurmancî li gor berkarê / bireserê (object) diçemin:


- min sê**vek xwar**
- min **du** sêv **xwarin**

Lê bi kirdarî û di pratîkê de berkara hevokê yekhejmar e û di demên borî de paşgira kesî ya cînavê “ew” yê yekhejmar sifir anku ew bi temamî bê paşgir e.

www.arxivakurdî.org

تەواکەری بەیاریدە یاخود بەرکاری ناراستەوخۆ؟


عەدنان ئەحمەد



تەواکەری بەیاریدە یاخود بەرکاری ناراستەوخۆ؟

یەكێك له ئەو بابەتەنەمی که له لایەن فێرکاران و فێرخوازانێ زمانی کوردی موناقدەشەمی له سەرە و نەیان توانیویە بە روونی له یەکتەریان جیا بکەنەوه و هینکی دیاری جیاکاری له نێوانیاندا دابننن هەردوو دەستەواژەمی بەرکاری (راستەوخۆ و ناراستەوخۆ) و تەواکەری (راستەوخۆ و ناراستەوخۆ یاخود تەواکەری بەیاریدە) یە. هەندیک له زمانەوانان و فێرکاران پێیان وایە هیچ جیاوازییەك له نێوان بەرکاری ناراستەوخۆ و تەواکەری بەیاریدە یاخود فراوانتر بڵنن بەرکار و تەواکەردا نییە، وه پێیان وایە دوو ناوی جیاوازی یۆ یەك مەبەست بەکار دەبرنن هەروەها هەنگری هەمان تاییەتمەندین یۆیە ناکریت بە دوو بابەتی جیا باس بکرین. هەروەها هەندیک تر له ئەوان بەگومانەوه لەم بابەتە دەروانن وه بە دوو ناو و یەك ناوەرۆکی نازانن یۆ وه لایمی ئەمەش واتای وشەکان (بەرکار، تەواکار) دەکەن بە بنمای وه لایمەکانیان، وه پێیان وایە یەك بابەت نییە و جیاوازی. بەلام نمونەمی شیکار کراوم لەم بار مەوه دەست نەکەوت. نامەوێت بابەتەکه بە باسکردن لەم جیاوازییانەمی که دەبارەمی ئەم بابەتە هەیه درێژ بکەمەوه، لێرەوه هەول دەدم بابەتیانە ئەم پرسە بخرە ژێر تیشکی لیکۆلینەوهوه هەروەها نمونەمی پێویست دەبارەمی بابەتەکه بخرەوه بەرچاوی خوێنەر و هۆگرانی زمان، تاکو هەموومان پێکەوه بتوانن له ئەم گۆشەیهمی ریزماندا خزمەتیک بگەیهنن ئەگەر چی کەمیش بێت.

1- بەرکار: - بە ئەو بەشە ناخاوتنانه دەوتریت که بەشیک له ئەرکی کردار مکانیان دەچیتە سەر، جا ئەو گواستەوهمی ئەرکه له کار موه یۆ سەر بەرکار بەشێوهیهکی راستەوخۆ یاخود ناراستەوخۆ بێت.



أ- بەرکاری راستەوخۆ: - ئەو بەشە ناخاوتنانه کەوا بەشیک له ئەرکی کردار مکانیان دەچیتە سەر، وه بەلابردنیا له ناو رستەدا بۆشایی واتا و یاسای ریزمانی دروست دەبیت.

بهرکاری راسته‌خۆ کۆمه‌لێک تاییه‌تمه‌ندی ئاشکرای هه‌یه، که وا له فێرخواز ده‌کەت به‌سه‌رنجێکی که‌می وردبێناوه‌ له پێکهاته‌کانی تری رسته وه‌ک بکه‌ر و کردار و ته‌واوکه‌ر...جیا بکاته‌وه. به‌رکاری راسته‌خۆ ده‌که‌وته‌ نیوان بکه‌ر و کردار به‌م شێوه‌یه‌ یاساکه‌ی (بکه‌ر + به‌رکار + کردار) هه‌روه‌ها ته‌نها به‌شه ئا‌خاوتنه‌کانی (ناو، جێناو) له ناو رسته‌دا ده‌توانن بێن به‌ به‌رکاری راسته‌خۆ. هه‌روه‌ها به‌کێکی تر له‌و تاییه‌تمه‌ندیانه‌ی که‌وا به‌رکاری راسته‌ خۆی پێی جیا ده‌کرێته‌وه ئه‌وه‌یه که‌وا نامزای په‌یوه‌ندی له‌ پێش به‌رکاری راسته‌خۆوه‌ نایه‌ت چونکه‌ ئه‌م که‌سه‌ته‌یه‌ پێوه‌ستی به‌ یاری ده‌ده‌ر نیه‌ و خۆی به‌ ته‌نها ده‌توانێت ئه‌رکه‌که‌ی بێ یاری ده‌ی نامزای په‌یوه‌ندی ئه‌نجام بدات. به‌رکاری راسته‌خۆ ته‌واوکه‌ری واتای کاری رسته‌که‌یه‌ و اتا کار له‌سه‌ر کراوه، وه‌ لابرده‌ی به‌رکاری راسته‌خۆ له‌ ناو رسته‌دا ده‌بێته‌ هۆی تێکه‌چوونی رسته‌که‌ له‌ رووی واتا و یاسای ریزبوونی که‌سه‌سته‌ پێکه‌ینه‌ر مه‌کانی رسته. بۆیه‌ ئاماده‌بوونی به‌رکاری راسته‌خۆ له‌ جۆری رسته‌ی تێپه‌ردا پێوه‌ستیه‌ و نا‌کریت نا دیده‌ بگێریت. نمونه‌:-

ب	ا
- هاو‌زار ک‌ری. (هه‌له‌یه)	- هاو‌زار خانووی ک‌ری. (راسته)
- نازه‌نین بانگ کرد ئیوه. (هه‌له‌یه)	- نازه‌نین ئیوه‌ی بانگ کرد. (راسته)

وه‌ک له‌م خسته‌یه‌دا دیاره، له‌ رسته‌کانی خانه‌ی (أ)دا، وشه‌کانی (خانوو، ئیوه) که‌ پێک هاتوون له‌ به‌شه ئا‌خاوتنی (ناو، جێناو) رۆلی به‌رکاری راسته‌خۆ ده‌بینن له‌ رسته‌که‌دا، وه‌ راسته‌خۆ کردار مه‌کانیان له‌سه‌ر ئه‌نجام دراوه‌ بۆیه‌ نا‌کریت ئه‌و به‌شه‌ی که‌وا کردار مه‌که‌ی له‌سه‌ر ئه‌نجام دراوه‌ له‌ نیو رسته‌که‌دا لابریت. ئه‌گه‌ر لادرا ئه‌وا بۆشایی واتا و ده‌ستووری دروست ده‌بێت، ئه‌مه‌ش ده‌بێته‌ هۆی ئه‌وه‌ی گوێگر نه‌توانێت نیو مه‌رۆکی رسته‌که‌ به‌ ته‌واوی تێبگات. له‌م رسته‌دا ئه‌گه‌ر هاتوو به‌رکار مه‌کانما لابرده‌ وه‌ک له‌ خانه (ب)دا له‌ نیو خسته‌که‌دا دیاره ده‌بینن واتای رسته‌کان تێک چوو، ئه‌مه‌ش به‌ هۆی ئه‌و گۆرانکاریه‌ی به‌ سه‌ر بوون و شوینی به‌رکار مه‌کاندا هێناو مانه.

ب - به‌رکاری نا راسته‌خۆ (به‌یاریده):- به‌و به‌شه ئا‌خاوتنه‌ ده‌وتریت که‌ به‌ یارمه‌تی نامزای په‌یوه‌ندی (به، بۆ، له...) ده‌درینه‌ پآل کردار مه‌که، هه‌روه‌ها کردار مه‌کش به‌شیک له‌ ئه‌رکه‌کانی تی ده‌په‌رینه‌یه‌ سه‌ر به‌رکاری نا راسته‌خۆکه‌. ته‌نها به‌شه ئا‌خاوتنه‌کانی (ناو، جێناو) به‌ یارمه‌تی نامزاه په‌یوه‌ندییه‌کان ده‌توانن بێن به‌ به‌رکاری نا راسته‌خۆ له‌ ناو رسته‌دا. ئه‌گه‌ر هاتوو نامزاه په‌یوه‌ندییه‌کان (به، بۆ، له...) له‌ پێش ناو یاخود جێناو به‌کار هات ئه‌وا ناوه‌که‌ یاخود جێناوه‌که‌ رۆلی به‌رکاری نا راسته‌خۆ ده‌بێت له‌ ناو رسته‌دا. هه‌روه‌ها به‌رکاری نا راسته‌خۆ بۆ زیاتر روونکردنه‌وه‌ له‌ ناو رسته‌دا به‌کار دێت.

نموونه:-

1- هێما دیاریی بۆ هه‌لتۆ ک‌ری.
2- راقین پینووسی له‌ ئیوه‌ ک‌ری.

لهم رستانهدا وشهكاني (ههلو، ئيوه) كه بهشهئاخاوتني (ناو، جيناو)ن وه بههوى ئامرازي پهيوهندي (بو، له) وه بوون به بهركاري ناراستهوخو.

ليرهدا به پيوستى دهرانم ئامازه بهوه بكم كهوا ئهوى زياتر سمرنجى منى بهلاى ئهم بابتهدا راکيشا، ئهويه كهوا من پيم وايه هس بهشه ئاخاوتنيك لهپال ئهوى كهههنگري ناوى بهشهئاخاوتنيهكهيتهى بو دانه زمانيهكاني بونموونه وشهكاني (نازاد، سلیمان، بازار...) لهژير ناوى بهشهئاخاوتني ناو دان، هسروهها ئهم ناوانه دهتوانن ئهركى ريزمانيش بيين لهناو رستهدا وهك ئهركهكاني(بكر، جيگري بكر، بهركار...). لهههمان كاتدا وشهكاني (من، تو، ئه...) له ژير ناوى بهشه ئاخاوتني جيناودا كو كراونهتهوه، وه لهپال ئهمهدا دهتوانن ئهركى ريزمانى له ناو رستهدا بيين وهك ئهركهكاني (بكر، جيگري بكر، بهركار...). باشه ئهوى ئهوه بهشه ئاخاوتنه كامانه كهوا تواناي بوون به بهركاريان ههيه؟ لهو بارميهوه تهنها ناو و جيناو ئهتوانن بين به بهركار، وهك پيشتريش ئامازهم بو كردوه. باشه با ئيمه بپرسين ئهوى بهشه ئاخاوتنهكاني (هاوهلناو، هاوهلكار) له ناو رستهدا ئهركيان چيه؟ ئايا هس بهوه رازى بين كه ئهمانه وهسفى ناو ياخود كار دهكمن و بهس؟ياخوود ئهمانيش بهشى ئهوه چالاكن تاكو بتوانن رولى ديكه له ناو رستهدا بگيرن؟

ليرهدا پرساييريك سمر ههلههدات باشه ئهوى ئهگهر هاتوو لهبرى ئهوه ناوانهوى كه بو بهركار(راستهوخو، ناراستهوخو) ناوى شوينيك وهك (كورستان...) ياخود كههستهيهك وهك (سهياره) له جيگهوى ناوى ئينسان بهكار هات چون بزاتين بهركاره ياخود تهواوكهس؟ بو نمونه:-

- نازميين نامهكهى له ناو سهيارهكهدا ههنگرتوه.

بو وهلامى ئهم پرسياره سمرنجتان بو ئهم بابته رادهكيشم و پاشان وهلامهكه دهنوسم.

له زمانى كورديدا كومهلتيك وشههمن ههيه وهك وشهكاني (سهر، خوار، نيوان، تهنيشت، ژير، دوا...) هسچهنده ئهم وشانه له چوار چيهوى پرى پوزشندانوسراون، بهلام ئهمه ههلهيه چونكه پرى پوزشنهكان دانهى بي واتان وه بو دروست كردنى وشهى نوئ و واتاي نوئ و وشهى ناساده بهكاردين ياخود كههسته پنيك هينهركهكاني رسته بهيهكتريهوه دههستن. بهلام ئهم وشانه خاوهنى واتاي خويانن له نيورستهدا و دهست نيشانى شوينيك ياخو كاتيك دهكمن كاتيك له پيش ناويكهوه بهكاردين. زوربهى كات ئهم وشانه ئامرازي پهيوهندييان له پيشهوه ديت. واتا بهگشتى ئهم وشانه بو ديارى كردنى شوين و كات بهكار دين بههاوكارى ئامرازي پهيوهندي و ناو بو نمونه:-

له تهنيشت نازاد	(سارا له تهنيشت نازاد دانيشتوه.)
له سهر شاخ	(راوچيهكه كهوله سهر شاخ دهگرئيت.)
له ناو رهشمالي خيالن	(مندالهكه له ناو رهشمالهكهدا نووستوه.)
له پيش نوستن	(نازاد له پيش نوستن كتيب دهخوينيتهوه.)

هسروهها ئهم وشانه لهههله ئهوى ئهم دهورهيان ههيه له ههمن كاتدا دهتوانن ئهركى پريپوزشنيش بيين وه بهشدارى دهكمن له روئانى وشهى نوئ و واتاي نوئ بو نمونه (پيشگر، پاشگر...) وهك لهم نموناهدا دياره دهبيين ئهم وشانه بهشدارى دهكمن لهروئانى وشهى ديكهدا.

بۆ ئەوەی بتوانین ئەم وشانە لە چوار چۆنەکاندا ناویکدا کۆ بکەینەوە و ئەرکەکانیان دەست نیشان بکەین وە بتوانین گەشەیی زیاتر بە لایەنی ریزمانیمان بدەین، بەم کارەشمان لە هەندێک کەمووکۆری ریزمانی رزگارمان دەبیت کە بە درێژای بابەتەکان دەرخەمەر و. هەر وەها وای بەباش دەزانم ئەم وشانە لە پری پۆزەشەکان جیا بکەینەوە و بکەین بە بابەتێکی سەر بەخۆ لە ژێر ناویکی نوێدا، کە لەگەڵ خەسڵەتی ئەم دانە زمانیاندا بگونجیت. بۆیە من (ئامرازی دەمچێ) بە گونجاو دەزانم چونکە ئەم وشانە دەتوانن کات و شوێن دیاری بکەن کاتێک لەپێش ناویکەوه بین. لە هەمان کاتدا دەتوانن بەشداری لەروانی وشەشدا بکەن. تائەو کاتەمی کەسانێکی تر لەوبارەییەوه شارەزای خۆیان بەکار دەهێنن و بە بابەتی تازەترمان دەگەینن.

ئامرازی دەمچێ :- بەو یەکە زمانیانە دەوتریت کە وا خاوەنی واتان و بەشداری دەکەن لە روونی وشەدا، وە بۆ دیاری کردنی شوێن و کات بەکار دەهێنن.

ئامرازی دەمچێش بریتین لە :- سەر، خوار، ژێر، ناو، دەر، تەنیش، بەرامبەر، پشت، نیوان، دوور، نزیک...
تایبەتمەندیەکانی ئامرازی دەمچێ :-

1- خاوەنی واتان.

2- بەشداری دەکەن لە روونی وشەدا بۆ نمونە (سەرخان، ژێرخان، سەرچل، ناولەپ، پێشگر...)

3- ئامرازی دەمچێ کاتێک لە پێش ناویک یاخود جیناویکی سەر بەخۆوە بەکار بێت ئەوا گریهکی شوینی (هاوئەلکاری شوین) دروست دەکات بەم شێوەیە (ئامرازی دەمچێ + ناو، جیناوی سەر بەخۆ = گریی هاوئەلکاری شوینی) (هاوئەلکاری شوین) بۆ نمونە (تەنیش تازاد، پێش ئێوه... وە کاتێک ئەم هاوئەلکارانە لە رستەدا بەکار دێن ئەوا دەبن بە تەواوکەری کار لە ناو رستەدا.
بۆ نمونە :-

تازاد خانوو لە تەنیش ئێمه دەکریت.
هاوناز لە ناو رەشمالەکاندا خەوتوو.

4- ئامرازی دەمچێ دەتوانیت گریی هاوئەلکاری کاتی دروست بکات کاتێک لە پێش ناویکەوه بەکار بێت بەم شێوەیە (ئامرازی دەمچێ + ناو، جیناوی سەر بەخۆ = گریی هاوئەلکاری کاتی) بۆ نمونە (پێش نوستن، پێش خواردن، دواي نان، پێش ئێوه... وە گریی هاوئەلکارە کاتیەکان دەبن بە تەواوکەری کار لە رستەدا.

هيوأ پێش نوستن کتیب دەخویننێهوه.
هاوزار لە پاش نان دەرمانەکانی دەخوات.
ئەوان پێش ئێوه هاتن.

5- هەر کاتێک ئامرازی دەمچێ لە ناو رستەدا بکەوێتە پێش ناویکەوه ئەوا گریهکی هاوئەلکاری دروست دەکات وە دەبیت بە تەواوکەری راستەوخۆی کردار لە ناو رستەدا وەک لە شیکاری ئەم رستەیدا دیاره.
بۆ نمونە :-

1- هیوا پیش نازاد هات

شیکار

هیوا : ناوه، بکهره...

پیش : نامرازی دهمجییه

نازاد : ناوه، تاکه، ناسراوه

پیش نازاد : هاو لکاری کاتییه، تهواو کهری راستهوخوی کرداره

هات : کاری رابردووه، تینهپهیره

به لام نهگهر هاتوو له پیش نامرازی دهمجیکهوه نامرازی پهپوهندی ههپوو ئهوا له ئهوا کاتهدا ههپووین واته نامرازه پهپوهندییه که و نامرازی دهمجی و ناوهکه پیکهوه گرییهکی هاو لکاری (شوین، کات) دروست دهکهن وه ئهراکهکشیان دهپیت به تهواو کهری بهپاریده. وهک لهم نموونهپهیدا دیاره.

2- هیمن له ناو سهیاره کهدا دهخهویت.

شیکار

هیمن : ناوه، بکهره...

له...دا : نامرازی پهپوهندییه

ناو : نامرازی دهمجییه

سهیاره : ناوه، ناسراوه...

مکه : نامرازی ناساندنه

له ناو سهیاره مکه : گرییهکی هاو لکاری شوینییه، تهواو کهری بهپاریدهی کرداره

دهخهویت : کرداری رانهبردووه...

نهگهر هاتوو نامرازان مکانی دهمجی له پیش ناوهوه نههاتیوون له ناو رستهدا، ئهوا ناوهکه دهپیت به بهرکار (راستهوخو، ناراستهوخو) وهک لهم خستهپهیدا دیاره.

خستهی (أ)

تهواو کهر	بهرکار
هه لگورد نامهکهی له نزیک نازاد دانا.	هه لگورد نامهکهی له نازاد وهرگرت.
تابلو له ناو سهیاره کهدا دابهزی.	تابلو له سهیاره که دابهزی.
هیوا له سهرا نامهکه ناوی نوی.	هیوا نامیهکی نوی.
ههژموون له ناو قوتابخانهکه وانه دهخوینییت.	ههژموون له قوتابخانهکه وانه دهخوینییت.

6- ئامرازی دهمجی به شیوهیهکی گشتی ئامرازی پهیومندی له پیشیهوه دیت ئهگهر به تنها بهکار هات له ناو رستهدا بۆ نمونه (ئازاد له پیشهوه رادهکات).

لهم رستهیدا ئامرازی دهمجی (پیش) به هاوکاری ئامرازی پهیومندی بووه به تهواوکهری بهیاریده له نێو رستهکهدا. بۆ نمونه:-

ئازاد له پیشهوه رادهکات.

شیکار:

ئازاد : ناوه، بکهره...

له : ئامرازی پهیومندییه

پیش : ئامرازی دهمجیه، تهواوکهری بهیاریدهی کرداره


هوه : پاشگره

رادهکات : کرداری رانهبردووه...

لێرهدا دهگهڕێینهوه سهڕ وهلامی ئهوا پرسیارهی ئایا ئهگهر له بری ناوی ئینسان ناوی شوینیک یان شتیک بهکار هات چون بزاین ئهوه بهرکاری ناراستهوخویه یاخود تهواوکهری بهیاریده؟ وهک لهم نمونهیدا دیاره (نازمین نامهکی له ناو سهیارهکهدا ههنگرتووه) له وهلامدا دهلیم ئهگهر هاتوو ناویک راستهوخۆ له پاش ئامرازی پهیومندی هاتبوو له ناو رستهدا ئهوا ئهوا ناوه بهرکاری ناراستهوخویه. بهلام ئهگهر ئامرازی دهمجی له پیش ناوهوه بهکار هاتبوو ئهوا تهواوکهری بهیاریدهیه. وهک له خشتهی(أ)یشدا خستومهته روو. ههروهها لهم رستهیدا گریی (له ناو سهیارهکهدا) گرییهکی هاوهلکاری شوینییه و دهوری تهواوکهری بهیاریده دهبینیت له ناو رستهکهدا.

لهکوتای ئهم بهشهدا دهکریت ئاماژه بهوه بکهینهوه کهوا تنها بهشه ئاخاوتنی ناو و جیناو دهتوانن رۆلی بهرکاری ناراستهوخۆ ببینن له رستهدا وه بههۆی ئامرازی پهیومندییهوه ئهوا ئهکره ئههجام دههه، ههروهها بهرکاره ناراستهوخۆکان بهگشتی دهتوانریت له ناو رستهدا لابدرین ئهگهر کردارهکه کرداریکی تهواو بوو.

2- تهواوکهر:- ئهوا بهشه ئاخاوتانهیه کهوا پهسنی ناو یاخود کردار دهکهن له ناو رستهدا له روی کات وچۆنیهتی و چهندیی...



ئهوهی بابتهی ئهم لیکۆلینهویه تنها تهواوکهری کرداره بۆیه لێرهدا تنها باسی تهواوکهری کردار دهکهم.

أ- تهواوکهری راستهوخوی کردار :- به ئهو بهشه ئاخاوتنه دهوترتیت که دهبیت به تهواوکهری کردار، وه پهسنی کردارکه دهکات. ههموو جۆرهکانی هاوئلکار دهبن به تهواوکهری راستهوخوی کردار و هیچ ئامرازیکی پهپوهندی له پیش هاوئلکارهکانهوه نایهت، وه ئهگهر ههجوو ئهوا هاوئلکارهکان دهبن به تهواوکهری بهیاریده له ناو رستهدا.
نمونه:-

هاوناز خیرا نامه دهنوسیت.

لهم رستهیدا هاوئلکرداری چۆنیتهی (خیرا) تهواوکهری راستهوخوی کرداره.

2-تهواوکهری بهیاریدهی کردار :- به ئهو هاوئلکاره دهوترتیت که به یارمهتی ئامرازی پهپوهندی دهبن به تهواوکهری به یاریدهی کردار.
نمونه:-

کهویار به شهو کتیب دهخوینیهوه.

لهم رستهیدا هاوئلکاری کاتی (شهو) تهواوکهری بهیاریدهی کرداری رستهکویه.

هاوئلکاره شوینیهکان که بهیارمهتی ئامرازهکانی دهمجی دروست دهبن، دهبن به تهواوکهری به یاریده له رستهدا.
بۆ نمونه:-

کهویار له ناو ژورمهکیدا نووستوه.

تیبینی.

من پیم وایه کهوا هاوئلکرداری شوینی له بنهرتدا بوونی نیه واتا کهرستهیهکی بنجی نین و دروست دهکرین ئهویش له بهر ئهم هۆکارانهی خواروه.

1- هاوئلکرداری شوینی به شیوهی سهربهخۆ له ناو رستهدا نیه. ئهمه لهکاتیگدا سهر جهم هاوئلکارهکانی تری وهک هاوئلکرداری کاتی و چۆنیتهی... به شیوازی سهربهخۆ له ناو رستهدا ههن بۆ نمونه (أ- ئازاد خیرا دهروا. ب- ئازاد بهیانی دهروات) .

2- ئهو کهرستهی که هاوئلکاری شوینی لئ دروست دهکریت ناوه، وهک (سلیمانی، شاخ، مأل،...) وه له کاتی بهکار هینانی ئهم ناوانه له ناو رستهدا به هاوئلکاری شوینی ناو دهبرین. باشه ئهی ئهگهر وایه بۆ پیش ئهوهی له رستهدا بینوسن له خانهی بهشه ئاخاوتتی ناو دان؟ یاخود ئهی ئهگهر هاتو له بری ئهم جۆره ناوانه ناوی مرۆف بهکارهات ئهی ئهو کاته ناوی دهئین چی؟

3- ناکریت جیاکاری بکهین له نیوان جۆرهکانی ناو بۆ ئهوهی بتوانین هاوئلکاری شوینی ساز بکهین. چونکه ئهمه گرفت بۆ ریزمان دروست دهکات و شیواندن له نیوان بهرکار و تهواوکهر و هاوئلکارهکان دروست دهکات. بۆ نمونه ههر ئهوهی که تاکو نیسته ههندیک له زمان ناسان و فیرکاران تیروانینی جیاوازیان دهبارهی تهواوکهر و بهرکار ههیه.

4-ههموو جۆرهکانی ناو به یارمهتی ئامرازی دهمجی دهبن به هاوئلکاری شوینی وکاتی وه ئهرکی تهواوکهری بهیاریده دهبینن له ناو رستهدا.
ئهنجام:-

1- ئامرازی دهمجی ناویکی نوئی و چالاک و سهر بهخویه وه بابتهیکی نوییه بۆ ئهم رۆی زمانهکهمان. بۆیه ناکریت وهک پری پۆزشن حیسابی بۆ بکریت.

2- بهرکار پیکدیت له بهشه ئاخاوتتی (ناو، جیناو).

3- بهرکاری راستهوخۆ ناکریت له ناو رستهدا لابدریت.

4- تهواوکهری کردار پیکدیت له بهشه ئاخواتنی (هاوهلکار).

5- هاوهلکاری شوینی له بنهرمتدا بوونی نیه بهلام به یارمهتی نامرازی دهمجی دروست دهکریت.

6- تهواوکهرهکان دهکریت له ناو رستهدا لابدرین. چونکه ئەمانه بۆ روون کردنهوه و پهسن کردنی کردار بهکار دین، ئەگەر تهواوکهری کرداری تهواو بوون.

7- ئەگەر هاتوو کردار ناتهواو بوو وه بههەر کهرستهیهکی تر تهواو کرابوو ئەوا ناتوانریت ئەو بهشه‌ی که راستهوخۆ په‌یوهسته بهکرداره ناتهواوهکهوه لای به‌رین.

بۆ نمونه:-

- ئاههنگهکه به شهو بوو.

- نامهکه به نازاد بوو.

له پاش سوپاس و ستایش بۆ خودای گه‌وره، که ئەو به ویستی خۆی زانسته‌کانمان فێردهکات، وه ئەوه‌ی له سهر ئیمیه هه‌ولدانه بۆ به‌رجهسته‌کردنی ئەو زانیارییه‌. هه‌وادارم ئەم بۆچونانه که خستوومه‌ته روو سوود به زمانه‌که‌مان بگه‌یه‌نیت، رینگه له به‌رده‌م فێرخوازان‌ی زمانی کوردی روون بکاته‌وه تا‌کو هه‌موومان پیکه‌وه کار بۆ به‌رمو پێشچوونی زمانه‌که‌مان بکه‌ین. وه داواکارم له زمانه‌وانان که له هه‌له و که‌موو کورپه‌کانم ببورن وه به زانسته‌کانیان زیاترمان فێربکه‌ن.

Noun-Verb Complex Predicates In Kurmanji Kurdish

Songül Gündoğdu

This paper analyzes the argument structure of N(oun)-V(erb) complex predicates in the Muş dialect of Kurmanji and makes three claims: (i) N-V complex predicates (CPrs) are like unergative verbs in the sense of Hale & Keyser (2002); they are underlyingly transitive structures in which an agentive light verb selects for (or incorporates into) its nominal object, (ii) the noun element in these CPrs is not a true direct object although it seems to saturate the argument requirements of the CPr, and (iii) the existence of unergative CPrs and the behaviors of their noun element point to a different objecthood status in Kurmanji syntax.

1. Introduction

The term complex predicate (CPr) is used for diverse phenomena including more than one predicate, such as morphologically simplex unergative verbs in English (e.g. 'dance'), particle plus a verb lexeme (e.g. *reki rohan* 'toward rush' in Hungarian), predicates with a single morphologically complex word (e.g. causatives in Chichewa), serial verb constructions (e.g. V+V constructions in Urdu), auxiliary plus main verb constructions of some languages of Europe, noun/nonverbal element plus verb combinations (e.g. N+V in Hindi, Persian and Kurmanji Kurdish) (Haig 2002) and inherent complement verbs (ICV) found in West African languages (Korsah 2014). Considering these different types, Butt (1997) asserts that the argument structure of CPrs is complex but their grammatical function is like a simple predicate and their phrase structure may be simplex or complex. Similarly, Alsina et al. (1997) propose that CPrs are multi-headed constructions composing of more than one grammatical event and each of them contributes to the information associated with a head. In a very recent study, Karimi (2013) defines CPrs as structures with more than one element in which each component contributes to the predicate information that is generally encoded in a single verb in a language. Kurmanji Kurdish, a Northwestern Iranian language, employs a large number of complex predicates that consist of a nonverbal element and a light verb to form a single predicate. CPrs are very common in Kurmanji; they outnumber the simplex predicates. Despite constituting the majority of verbs, CPrs in this language does not get much attention in the literature. This paper aims to fill this gap in the literature investigating Kurmanji CPrs based on the vast literature on complex predicate formation in various languages (Mithun 1984; Baker

1988; Mohanan 1997; Massam 2001; Hale & Keyser 2002; Haig 2002; But 2003; Öztürk 2009; Folli et al. 2005; Megerdooian 2002, 2012 among many others).⁴³

This paper is organized as follows: Section 2 presents general information about complex predicates in the Muş dialect of Kurmanji, while Section 3 specifically deals with N-V CPrs, their structural properties, classification and the status of their noun element. Section 4 introduces our analysis and discusses its implications for Kurmanji syntax. Why other incorporation approaches fall short of explaining the structure of Kurmanji CPrs is argued in Section 5. Lastly, concluding remarks and issues for further studies are presented in Section 6.

2. Complex predicates in Kurmanji Kurdish: an overview

The non-verbal element of Kurmanji CPrs ranges over a number of categories such as nouns, adjectives, particles and PPs (1). This study focuses on Noun+Verb sub-group, which constitutes the largest group of CPrs

⁴³ CPr formation is highly productive in Iranian languages (e.g. Persian, Kurdish, Zazaki). Since noun-to-verb derivation is weak or lacking in these languages, new verbal expressions are created through CPr formation (Haig 2002). For instance, loan words productively enter into nominal complex predicate formation: e.g.

telefon kirin (telephone do, French 'telephone') 'to telephone'

zilm kirin (cruelty do, Arabic 'zlm' ضلم) (to persecute)

sağ bûn (alive become, Turkish 'sağ') 'to heal'

Even in contact situations, an element is copied from the dominant language and used as the non-verbal element of the CPr; for instance, as an output of language contact with Turkish, I observe new verbs composed of a Turkish participle and a light verb in Kurmanji: e.g.

anlamîş kirin (understand do - Turkish 'anlamîş-') 'to understand'

dinlemîş kirin (listen do - Turkish 'dinlemîş-') 'to listen to'

evlenmîş bûn (marrying become - Turkish 'evlenmîş-') 'to get married'

Bulut (2006) presents similar examples from Kurmanji spoken in Adana, and she calls them as compound verbs made of a Turkish verb stem + mîş and Kurdish auxiliary kirin/bûn 'do/be'. She argues that copies of Turkic verbs + mîş in Iranian languages are common, especially in Persian, Northern Tajik, Kurmanji, Zazaki, Talish, and Tati.

in this language, as exemplified in (1a), investigating the argument structure of the N-V Kurmanji CPRs as well as the status of the noun element in these constructions.⁴⁴

(1) a. Noun + V

bal dan (attention give) ‘to pay attention’

sond xwarin (oath eat) ‘to swear’

şîn girtin (mourn hold) ‘to mourn’

b. Adjective + V

acis bûn (bored become) ‘to get bored’

acis kirin (bored do) ‘to bore’

nexweş ketin (ill fall) ‘to get sick’

c. Particle (adposition) + V⁴⁵

⁴⁴ The data for this paper was taken from Zeynep Argün’s seminar project which she submitted to the Kurdish Language and Culture Master Program at Muş Alparslan University. She collected the verbs in Muş province from daily conversations and local Kurdish songs (mostly performed by a dengbej – a traditional Kurdish singer). The data includes 692 complex predicates; about 600 of them are nominal (noun/adjective) CPRs while the rest are CPRs with a particle or a prepositional phrase. Pointing out the imbalanced distribution among the types of CPRs, Haig (2002) argues that although in Indo-European languages particle CPRs are widespread, in Iranian and Indo-Aryan languages N+V CPRs have developed due to some structural properties such as OV-word order, lack of morphological means for verb-noun derivation, differential object marking and lack of articles in these languages. Similarly, Butt (2003) mentions that Old Indo-Aryan employed a set of preverbs which combined with the main verb and gave rise to a complex range of meanings, e.g.: *ati* ‘across beyond past, and *nis* ‘out forth’. However, the modern Indo-Aryan languages such as Urdu/Hindi and Bengali have lost these preverbs completely.

⁴⁵ A set of preverbal particles in Kurmanji such as the adpositions *da* and *ra* or absolute prepositions like *jê* and *lê* (which are the contracted forms of the prepositions *li/ji* plus third person singular pronoun in the oblique case *wî/wê*; *lê* = *li* + *wî/wê* and *jê* = *ji* + *wî/wê*) or adverbs such as *der* ‘out’ combines with light verbs to form new verbs (Bedirxan & Lescot 1997; Haig 2002; Thackston 2006). They are usually written together with the stem as a single item in the infinitival form as provided in (1c); however, when they are inflected with negation *na/ne-* or imperfective aspect *di-*, inflectional

daçûn (particle go) 'to sink'

derketin (particle fall) 'to go out'

jêkirin (particle do) 'to cut'

d. Prepositional Phrase (PP) + V

bi rê ketin (with road fall) 'to set off (on a journey)'

ji bîr kirin (from mind do) 'to forget'

li xwe kirin (to self do) 'to dress'

The verbal element in CPRs also ranges over a number of typical simplex verbs:⁴⁶

(2) bûn 'become'

avêtin 'throw'

kirin 'do'

xwarin 'eat'

dan 'give'

ketin 'fall'

girtin 'hold'

hatin 'come'

xistin 'put'

berdan 'release'

prefixes are inserted between the preverb and the light verb, as in *der-na-kev-e* 'he is not going out' or *der-di-kev-e* 'he is going out'. Thus they are not incorporated forms.

⁴⁶ The Kurmanji data used in this study adheres to the conventions of the Latin alphabet following the Modern Kurmanji orthography developed by Celadet Bedirxan. In this orthography, /i/ stands for the back high unrounded vowel [ɨ] while /î/ stands for the front high unrounded vowel [i]. Similarly, /û/ is the back high rounded vowel [u] whereas /u/ corresponds to two different sounds; namely [ʊ] as in English put, and [ə] as in English bird. Lastly, /ê/ is the mid front unrounded vowel [e] and /e/ corresponds to three different vowels: [ɛ], [æ] and the Arabic 'ayn' (ع).

The verbal element of the complex predicates in various languages are usually referred to as light verbs (LV) since their semantic content is partially or completely bleached (Grimshaw & Mester 1988 for Japanese; Haig 2002 for Kurdish; Karimi-Doostan 2005; Folli et al. 2005 and Megerdooian 2012 for Persian). In fact, the contrasts in (3) imply that the verbal element of the Kurmanji CPRs is semantically bleached and it is mostly the nonverbal element which determines the semantic content of the CPR.

(3) a.

av dan (water give) 'to water'

bal dan (attention give) 'to pay attention'

girê dan (knot give) 'to tie'

xeber dan (info/swear give) 'to speak'

b.

acis kirin (bored do) 'to bore'

maçî kirin (kiss do) 'to kiss'

ji bîr kirin (from mind do) 'to forget'

jê kirin (particle do) 'to cut'

c.

acis bûn (bored become) 'to get bored'

hêrs bûn (angry become) 'to get angry'

bi cîh bûn (with place become) 'to settle down'

vebûn (particle become) 'to become open'

Butt (2003) argues that LVs are not entirely devoid of semantic predicative power because there is a clear difference between take a bath and give a bath. She says that LVs do not have full semantic power but they

are not completely depleted, either. Moreover, Mohanan (1997) states that LVs in Hindi contribute to valency and argument meanings of CPrs so they are not totally light as argued for Japanese *suru* 'do'. Considering the following pairs of Kurmanji CPrs, one can argue that LVs are not semantically empty because the choice of LV lends a slightly different sense to the construction (4).

(4) a.

eşkere bûn (obvious become) 'to become obvious'

eşkere kirin (obvious do) 'to make obvious/clear'

b.

vebûn (particle become) 'to get opened'

vekirin (particle do) 'to open'

c.

bi rê ketin (with road fall) 'to set off (on a journey)'

bi rê kirin (with road do) 'to see off'

These pairs show that although LVs do not predicate fully as main verbs do they still contribute to the agentivity as well as valency of the predicate in Kurmanji. This is because the first member of these pairs is non-agentive and intransitive whereas the second member is agentive and transitive. Each of the light verbs corresponds to a heavy (thematic) verb and they are form-identical to these verbs carrying aspect and negation morphology (5).

(5) a. xwarin 'eat' dixwim 'I'm eating'

naxwim 'I'm not eating'

b. sond xwarin 'to swear' sond dixwim 'I'm swearing'

sond naxwim 'I'm not swearing'

However, LVs do not have the same thematic content and argument structure as thematic verbs. For instance, the verb *xwarin* 'to eat' has semantically and syntactically a fully inflected direct object and expresses the meaning of eating action in (6a). However, the verb in (6b) has neither an object nor does it

define the act of eating in a real sense but has a bare noun with which it expresses the meaning of the whole predicate, namely ‘to swear’.

(6) a.

Ez sêv-an di-xw-im

I.NOM apple-ACC.PL PROG-eat.PRS-1SG

‘I am eating apples.’

b.

Ez sond di-xw-im

I.NOM oath PROG-eat.PRS-1SG

‘I swear.’

To sum up, I propose that LVs in Kurmanji CPRs do not have the same semantics and argument structure of their thematic counterparts, but they determine the agentivity and valency of the CPRs. In the next section, I will discuss the properties of the nonverbal elements of CPRs.

3. N(oun)-V(erb) complex predicates in Kurmanji Kurdish

In this section, I will discuss the properties of N-V CPRs with respect to transitivity and case alignment, which are closely related to Kurmanji verb system. First, I will present how transitivity and case alignment works in Kurmanji syntax and then I will show how N-V CPRs behave with respect to transitivity and case alignment. I will discuss its implications for complex predicate formation as well as the status of the noun within N-V CPRs in this language.

3.1. Transitivity and ergative alignment in Kurmanji Kurdish

Kurmanji is one of the Iranian languages that has preserved its ergative pattern (e.g. Zazakî, Balochî, Taleshi, etc.) and indeed possesses two alignment types: the nominative accusative pattern in the present tense and the ergative pattern in past tense transitive constructions (Dorleijn 1996; Haig 1998, 2004; Thackston 2006;

Gündoğdu 2011, 2013; Karimi 2012). Therefore, transitivity and intransitivity of the verb in Kurmanji are assessed with respect to ergative alignment in the past tense constructions. The subject of an intransitive verb is always marked with the nominative (NOM) case (7). As for transitive constructions, their subject has NOM case and the object gets the accusative (ACC) case in present tenses (8a), whereas in past tenses their subject bears ergative (ERG) case marking and the object has NOM (8b) marking.⁴⁷ The verb always agrees with the NOM case-marked argument.

(7)

a.

Ez di-kev-im

I.NOM PROG-fall.PRS-1SG

'I am falling down.'

b.

Ez ket-im

I.NOM fall.PST-1SG

'I fell down.'

(8) a.

Ez te di-bîn-im

I.NOM you(S).ACC PROG-see.PRS-1SG

'I see you.'

b.

Min tu dît-î

I.ERG you(SG).NOM see.PST-2SG

'I saw you.'

⁴⁷ Note that in Kurmanji there are two case markers, one is the direct case with zero marking and the other one is oblique with –ê (feminine) and –î (masculine) marking. The traditional Iranian name for what I am calling the nominative case is direct case, for ergative and accusative it is oblique case. However, following Gündoğdu (2011), I continue to call them nominative, ergative and accusative cases because they have the same syntax with respect to case checking properties. Instead, I will use oblique case for the case realized on arguments except for the subject and the object (e.g. the case on the complement noun in the possessive-genitive constructions).

However, in the Muş dialect of Kurmanji, I observe another ergative pattern where the subject gets ERG case while the object has ACC case, and neither of the arguments agrees with the verb but rather the verb is in the third person default form as given in (9) (Gündoğdu 2011, 2013).

- (9) Min te dît- Ø
 I.ERG you(SG).ACC see.PST-3SG
 ‘I saw you.’

Ergative alignment enables us to discuss the properties of CPRs more clearly with respect to syntactic transitivity as well as intransitivity and to understand the status of the non-verbal element within the CPRs, which I will cover in the following sub-section. Note that all sentences given in the past transitive constructions will reflect the ergative pattern in the Muş dialect of Kurmanji.

3.2. Syntax of N-V CPRs in Kurmanji

Almost all the N-V CPRs behave like a transitive predicate as they trigger the ergative alignment in the past tense. However, a more thorough analysis of their argument structure indicates that all transitive-like CPRs are not true transitive verbs because they do not govern a typical direct object just like a transitive verb does (10). Note that complex predicates are indicated in boldface.

- (10)
 a.
 Min dar-an av da- Ø
 I.ERG tree-PL.ACC water give.PST.-3SG
 ‘I watered the trees’

b.

Min sond xwar- Ø
 I.ERG oath eat.PST-3SG
 ‘I swore’

Haig (2002:20) argues that in Kurmanji ‘a clause is transitive if it permits the expression of a direct object NP...’. The question at this point is; what are the properties of a proto-typical direct object in this language? He proposes five properties that a direct object has in Kurmanji: (i) direct objects are non-adpositional, (ii) in pragmatically neutral clauses, they are immediately pre-predicate, (iii) with accusative alignment they get the oblique case (ACC in our sense), (iv) with ergative alignment, they determine person and number agreement on the predicate, and (v) only direct objects achieve subjecthood under passivization. It should be noted that (iv) is not valid for the Muş dialect as the object takes ACC case and cannot influence person-number agreement. Considering the examples in (10), one can state that the predicate *avdan* ‘to water’ in (10a) seems to be syntactically transitive as it governs a direct object *daran* ‘trees’, which I will discuss in Section 3.3.1. However *sond xwarin* ‘to swear’ in (10b) patterns with a transitive predicate in triggering ergative case but, like an intransitive predicate, it does not govern a direct object. Observing the existence of such complex predicates, Haig (2002) concludes that there are lexically transitive verbs in Kurmanji which semantically express intransitive propositions but trigger ergative alignment in the past tense even though they do not govern a direct object. Therefore, his analysis implies that the absence of an overt direct object does not guarantee that the verb will be intransitive even if its presence overtly indicates that the verb is transitive. In the following section, I will classify the Noun-Verb CPRs in this language according to the type of transitivity and discuss the status of their noun element.

3.3. Classification of N-V CPRs in Kurmanji Kurdish

Considering the behavior of Noun-Verb CPRs with respect to ergativity-transitivity and Haig’s generalization, I will classify Noun-Verb CPRs in this language into two groups; transitive and unergative CPRs.

3.3.1. Transitive CPRs

There is a small group of N-V CPRs in Kurmanji which takes overt direct objects and trigger ergative alignment in the past tenses (11). Just like a typical direct object in this language, the object *daran* ‘trees’ gets ACC case

in the accusative alignment, has NOM case and determines person agreement on the verb in the ergative alignment. However, as mentioned before in Muş Kurmanji the direct object always gets ACC case (see 11c).

(11)

a. Ez dar-an av di-d-im
 I.NOM tree-PL.ACC water PROG-give.PRS-1SG
 'I am watering the trees.'

b.
 Min dar av da-n
 I.ERG tree.PL.NOM water give.PST-3PL
 'I watered the trees.'

c.
 Min dar-an av da-∅ (Muş dialect)
 I.ERG tree-PL.ACC water give.PST-3SG
 'I watered the trees.'

Also, direct objects in this language function as the subject of the sentence under passivization and daran 'trees' conforms to this pattern (12).

(12) Dar hat-in avdan (passive form of 11b/c)
 tree.PL.NOM come.PST-3PL water.give
 'The trees were watered.'

Moreover, the direct object can scramble in its immediate clause (13a). Note that the noun element within the transitive CPRs is not free to scramble yet only the whole CPR can scramble as given in (13b).

(13)

a. Dar-an av di-d-im ez
 tree-PL.ACC water PROG-give.PRS-1SG I.NOM
 'I am watering the trees.'

b.

* Ez	av	dar-an	di-d-im
I.NOM	water	tree-PL.ACC	PROG-give.PRS-1SG

The examples provided in (11-13) indicate that these CPRs govern a direct object, and the noun element in these CPRs is like an incorporated part of the CPR (Baker (1988)). For instance, the noun of the transitive CPRs is always bare; it does not bear case (14a) nor is it modified (14b).

(14)

a.

*Ez	dar-an	av-ê	di-d-im
I.NOM	tree-PL.ACC	water-ACC	PROG-give.PRS-1SG

b.

*Ez	dar-an	av-a	cemidî	di-d-im
I.NOM	tree-PL.ACC	water-EZF.F.	cold	PROG-give.PRS-1SG

The transitive N-V CPRs are smaller in number; some examples are provided in (15).

(15)

- av dan (water give) 'to water'
- bar kirin (load do) 'to take on load'
- girê dan (tie give) 'to tie'
- xwê kirin (salt do) 'to salt'

3.3.2. Unergative CPRs

